Dewleta Sûriyê Herîriyê Kurdan Şêx Mihemed Maşûq Xiznewî kuştî

Rûpel 4



peyama Kurd

Rojnameya Giştî ya Hefteyî Hejmar 39 / Sal 1 03.06.2005

Kurdish weekly newspaper Kurdische Wochenzeitung

Li Kurdistanê terora "namûs"ê Rûpel 7

Wê Frensa enstîtuyekê li Hewlêrê veke Rûpel 7

Hilbijartina Lubnanê û bandora wê Rûpel 8

„Min xwe li derve bêhtir nas kir" Rûpel 14

Îstanbul û Meletî de sewî paştgirotisî Çewlîg viraziyay Rûpel 16

Vegera xweristê Rûpel 12



Tirk-Îslam carek din Konstantinopolî dagir kir

Rûpel 3

D 1.50 EUR, A 1.70 EUR, B 1.70 EUR, NL 1.70 EUR, CH 2.60 SFR
LUX 1.70 EUR, I 1.70 EUR, S 19.00 SKR, DK 14.00 DKR,
N 16.00 NOK, GB 1.10 £, GR 1,70 EUR

4 196577 401503 39

www.arsiv.com

Ji Edîtor

Xwendevanên Rêzdar,

Heya niha min carna wek nivîskarek dinav xebatkarên Peyama Kurd de cîh digirt. Vaye ev meheke ez dinav xebatkarên wê de dixebitim û çar hejmarin ku ez û hevalên redaksiyonê liser jinuhvetanzîmkirina rojnamê dixebitin. Ez hêvî dikim ku xebata me digel vê hejmarê, wê piştî du hejmaran diqede û ez wekî edîtor dinav xebatkarên Peyama Kurd de ciyê xwe digirim.

Rojameyek Kurdî xiyala min a panzdeh salan bû. Min dixwest rojnameyek Kurdî, modern ava bikim û jiyana xwe ya rewşenbîrî bi vê xebatê bidomînim.

Em çend heval di 1991ê de hatin cem hev û me bi navê "Rojname", hejmarek taybetî derxist. Û li pey vê hejmarê me dixwest projeya rojnamê pêk bînin. Lê Apociyan û Dewleta Tirk rê nedan ku em karê xwe bidomînin. Di sala 2000an de min carek din dest bi vê projê kir. Jibo pêkanîna vê projê ez hatim Almanyê. Bajar bi bajar geriyam. Dûvre me civînek li Bochumê çêkir.

Lê pêkanîna projeyek weha mezin bi beşdarîyên piçûk ne mimkûn bû. Xwediyê Peyama Kurd Rojhat Amedî jî dinav vê projê de bû. Jibo vê, serî li hinek cihan hat xistin. Piştî çend salan ev proje wek hevkariya Rojhat Amedî û Bayram Ayaz pêk hat û min jî piştî salekê wek xebatkarekî dinav vî karî de cîh girt.

Bi çi awayî dibe bila bibe, jibo min di rojnameyek Kurdi de xebitîn, karekî pir pîroz e. Lê bi tenê derxistina rajname ne bes e; divê rojnameyek nûjen be û organa weşanê ya tu rêxistinê nebe. Peyama Kurd di serî de liser van herdu prênsîban weşana xwe dimeşîne; iro û şûnde wê ev xurttir be.

Rojname ji nûçeyan û şiroveyên wan pêk tê. Lê rûpelên Peyama Kurd ji nûçeyan bêtir ji nivîsaran pêk dihat. Û bi vî halê xwe jî Peyama Kurd bêtir dişibiya Kovarekê. Ev dîmen ne yê rojnameyekê bû. Em dixwazin vî dîmenî biguhêrin. Ev ne ew e ku em rê şanî nivîskarên xwe didin. Tucar! Ev ne hedê meye jî. Jiber ku ev rojname ya Kurdan e. Em dixwazin bi hemû nivîskarên xwe re di Peyama Kurd de rojnamegeriyê bikin.

Di rojnameyên wekî rojnaman de, nivîskarên rojnamê bi têkiliya edîtoriya rojnamê re kar dikin. Ji duayenên rojnamegeriyê pê ve hemû nivîskar nivîsên xwe ligor mijara rojnamê ku ji aliyê redaksiyonê ve hatiye diyarkirin, dinivîsînin. Mixabin ev sîstem di serî de, di Peyama Kurd de nehatiye ava kirin. Lê em dixwazin vê sistemê biguhêrin û vek her rojnameyê, wek redaksiyona Peyama Kurd bi nivîskarên xwe re kar bikin.

Peyama Kurd seranser ji nivîsên siyasî pêk dihat û mijarên van nivîsan seranser li ser Kurdan û Kurdistanê bû. Lê mirovahî û dinya ne bitenê ji Kurdan û Kurdistanê pêk tê. Wek redaksiyona Peyama Kurd em dixwazin divan mijaran de jî guhertinan çêbikin û dinav rûpelên rojnamê de cîh bidin mijarên derveyî siyasetê û jiyana civakiya gel û welatên din jî.

Jiyan hemû guhertinan re jî dem divê. Emê heya ku jime tê, di demek kin de asteng û kêşeyên liber xwe çareser bikin bi hevre bibin xwediyê rojnameyek rojavayî.

Jibo ku em biserkevin em hewcedarên alîkariya we ne. Alîkariya we ya herî mezin eve ku hûn kemasiyên me jimere bêjin. Jibo vê jî me jibo nameyên xwendevanan di rûpela didoyan de cîh diyar kir. Em li benda nameyên we ne.

Serketina rojnameyekê bi dewlemendiya nûçeyan pêk tê. Jibo dewlemendiya nûçeyan jî peyamnêr divê. Lê derfetên Peyama Kurd destnade ku liherderê bi pera peyamnêran bibîne. Jibo vê em ji xwendevanên xwe peyamnêriya jidil dixwazin. Kesên ku bixwazin peyamnêriya rojnamê jidil bikin bila ji kerema xwe telefonî me bikin.

Bi hêviya ku em du hefte şûnde bi form û logoyek nuh bihevre bin, bimînin di xêr û xweşiyê de.

Ahmet Zeki Okçuoglu

Ji xwendevanan

Selîm Çurukkaya (nivîskar)

Gelekî balkêş e ku Peyama Kurd bi zaravayên Kurmancî, Zazakî û Soranî û bi tîpên latînî û erebî derdikeve. Ez nizanim gelo nimûneyeke din bi vî awahî heye an na?.

Min herdû hejmarên dawî yên rojnamê nedîtine, ji ber vê yekê ez nikarim di derbarê guhertinan de tiştekî bibêjim. Li gora dîtina min, Peyama Kurd heta niha nebûye çavkaniya nûçe û agahdariyeke taybetî. Ew ji bo tu dezgeha çapemeniyê jî nebûye çavkanî

Pêwîste her hefte hevpeyvîneke bi wêneyên mezin li gel mirovekî girîng di derbarê mijarên girîng de were kirin. Divê mirov gotarên kurt, bi entellektuelên Kurd yên naskirî bide nivîsandin. Her wiha girîng e ku piştperdeya pêşveçûnên li Başûrê Kurdistanê bibe nûçe.

Dîsa ez girîng dibînim ku bi kêmanî ji 15 rojan carekê pêvekeke siyasî bi zimanê Tirkî were amadekirin.

Mahmûd Lewendî (nivîskar)

Gava ku Peyama Kurd nuh dest bi weşanê kir ji ber ku xwerû bi kurdî bû gelek kêfa min hat. Ji bo min xwerû bi kurdî derketina her weşaneke kurdî ku Peyama Kurd jî yek ji wan e, pîroz e û di heman demê de bi serê xwe sîleheke li dij dijminên me. Wekî her weşaneke kurdî Peyama Kurd jî bi wê kurdîya xwe ya şîrîn xwe digihîne hawar û gazîya milletê me, bi taybetî jî milletê me yê ku nuha li Kurdistana Tirkîyê di nav diranên çerxa asîmîlasyonê de li ber sekratê ye. Lewra ez we pîroz dikim ku hûn bi karekî weha re radibin.

Bêguman her weşanek miheqeq xwedîyê siyasetekê ye, xwedîyë bîr û bawerîyekê ye. Û ev yek jî gelek normal e. Lê ji bo min ya herî giring kurdîbûn û Kurdistanîbûna wê weşanê ye ku di Peyama Kurd de ev yek bi eşkereyî tê dîtin.

Di warê ziman û teknîk û naverok û babetên wê de gava ku mirov lê dinêre, ji hejmara 1ê heta ya 35an bi giştî mirov her pêşveçûnekê tê de dibîne.

Ez hêvîdar im Peyama Kurd her bi pêşkeve, geştir û xweştir bibe û tesîrekê li kurdên ku ketine ber çerxa asîmîlasyonê bike da ku bi saya Peyama Kurd û weşanên dinên kurdî dîsa li zimanê xwe yê şîrîn vegerin.

Ger zimanê me hebûna me be, wê demê weşanên me yên bi kurdî jî hebûna me ye, zimanê me ye.

Huseyîn Kartal (zimanzan)

Heger Peyama Kurd weke ku dihat gotin, bixwaze bibe "Hurriyet" an jî "Milliyet"a Kurdan, dive ew hertiştê ku ji bo Kurdan tê kirin biparêze û xwedî lê derkeve. Di destpêkê de ew bûbû cihek ji bo hinek kes çend gotinên xwe tê de bibêjin û xwe rehet bikin. Ne karê rojnameyekê ye ku serê xwe bi rêxistin û kesan re biêşîne. Hîna jî ev kêmanî di rojnamê de tê dîtin. Ew ji rojnameyekê bêhtir, bi naveroka kovarekê derdikeve. Rojnameyeke hefteyî nikare têkiliyeke baş li gel xwendevanan deyne. Nûçeyên ku di Peyama Kurd de derdikevin, berê hatine xwendin û kevin bûne. Her wiha divê nûçe bêşîrove werin belav kirin. Şîrove, çarçoveya rojnamê teng dikin. Di aliyê ziman de jî ez dikarim bibêjim ku zimanê rojnamê zimanekî asan e û herkes dikare jê fêm bike, lê pêwîste her tiştê ku di rojnamê de belav dibe, ji aliyê rastnivîsê ve were serrastkirin. Kurdbûna rojnamê bi sere xwe tiştekî pir pozîtîf e û kêfa mirov tine. Di van herdû hejmarên dawî de, mirov pê dihese ku ew bi rastî jî di aliyê teknîkî de dixwaze bibe rojname.

Dilbixwîn Dara (rojnamevan)

Ez ji mêj ve li benda derketina rojnameyeke kurdî bûn ku bêhna demokrasî û nêrînên cuda jê were, di vî warî de medyaya kurdî zeîf e, hîna xwe ji çembera mêjiyê rêxistinî û îdeolojîk rizgar nekiriye. Di nêrîna min de wezîfeya partî û rêxistinên me yên siyasî li hember medyaŷê ewe ku piştgiriya wê bikin û alîkariyên ku jêre têne xwestin pêkêş bikin.

Derketina Peyama Kurd ez gelekî kêfxweş kirim. Her çiqas ew zeîf derketibe jî, lê bêguman gaveke pir bi cesaret bû, ku heftane derkeve û heya niha bi awayekî peryodîk xwe bigihîne xwendevanan. Ji hejmara yekê de, belkî ez yê yekemîn bûm ku min diçû ew ji stasyonê dikirî.

Di nêrîna min de ew destpêkê ji aliyê naverok, manşêt, mijar û rastnivîs û rêziman ve qels bû, her wiha ew rûpelsaziya wê jî ne ewqas profesyonel bû. Lê ev her 2-3 hejmarên dawiyê gelekî cuda derketin. Weke ku guhertin û pêşketineke berbiçav hebe, tê xwestin jî.

Li gora ku ez dibînim, li hinek cihan valahiyên wiha hene ku werin dagirtin baştir dibe:

- Çêkirina Peyamnêran, li Ewropa û Kurdistanê.
- Hîna jî gelek caran mirov şaşiyan di redektekirina nivîsan de dibîne, çi ji aliyê rêziman ve, çi jî ji aliyê rastnivîsê ve.
- Rûpelên kurdî (kurmancî) zêde bibin baş dibe.
- Pêwendiya li gel nivîskar û rojnamevanan hîn xurttir bibe.
- Baştire di her hejmarekê de hevpeyvînek hebe, bawer dikim hevpeyvîn gelekî têne xwendin.
- Di her hejmarekê de, ji xeynî hevpeyvînan, her car dikare li ser jiyana nivîskar, siyasetvan, rewşenbîr yan jî hunermendekî were nivîsandin (kurtejiyan), ne tenê yên mirî her wiha yên zindî jî.


Impressum

Xwediyê Rojnameyê
Peyama Kurd Verlag
Peyama Kurd
Thomas-Mann-Str. 22, 53111 Bonn / Germany
Fon: +49 (0228) 18 00 654
+49 (0228) 18 00 655
Faks: +49 (0228) 18 00 658
www.peyama-kurd.com
info@peyama-kurd.com

Redaksiyon

Kurmancîya jorîn
Fajr Oyqun (Editor in Chief),
Personal (Abhiyedan-mecaîh)
Kurdî (Zazakî):
Seydxan Kurd (Editor)
Kurmancîya jorîn:
Ebdila Alî, Venus Faiq, Serkan Aziz, Nizar Car, Coşkar Darîyos,
Mansur Sidq, Mustafa Chalabay

Peyama Kurd ji xwe re mafê dibîne, ku nivîsên ji rê, tûre bandin, kurt bike. Ew ji adete redeman û nasnivîsê ve di serastkirina berhemên de azad e. Peyama Kurd nerîna xo jî tê yê bandin û berê li cîyekî din hatine belavkirin, nayêşîne.

Tirk-Îslam carek din Konstantinopolî dagîr kir

Bajarê Konstantinpoli piştî 552 salan carek din ji aliyê Tirk/Îslaman ve hat dagîr kirin!

Wek herdem û liherderê Tirk/Îslam îsal jî bi "êrîşên temsîlî" dagîrkirin û qirkirina gelê Bîzans pîroz kirin.

Li camî û merasîman de dagîrker û mêrkuj şehîd hatin îlankirin û ji bo ku jiber van kirinên xwe li cinnetê bin dua kirin.



Dewleta Tirk di 29 û 30ê mehê de li bajarê Konstantînopolê li gelek cîh û mizgeftan dagirkirina bajêr û qirkirina gelê Bîzansê bi beşdariya rêvebirên leşkerî, siyasî û olî pîroz kirin. Bi muzîka tîpa mehterê yeniçeriyan bi şûrên di destê xwe de bi hêrişên temsîlî carek din Bîzansî li erdê xistin û Konstantînopolî bi "qehremanî" feth kirin.

Di çalakiyên du rojan de konserên pîrozbahiya fetihkirina bajêr hat lidarxistin, xwendevan, hunermend û karmendan bi serfirazî meşên serkeftinê kirin. Bi pêşengehên bi navên "Bi tabloyan fetihkirina Konstantînopolî" bêtirs rûyê xwe radixin ber çavên raya gîştî ya cîhanî. Di merasîma li camiya Fatîhê de paradoks û nakokiyek ku ancax karibe li Tirkiyê û ji aliyê Tirkan ve pêk bê, dubare kir. Miftiyê camiyê kesên ku beşdarî dagîrkirina Istanbûlê bûne şehîd îlan kir û jiber qetlîamên ku kirine, jibo biçin bihuştê dua kir.

Du rojan bajarê Konstantînopolî bi roniya elektrîkan hat xemilandin. 73 lodkeyên li Xaliçê mîna bûkan xemilandin. Li hin salonan ji aliyên hin profesorên gire-gir ve sempozyûm hatin lidarxistin, li hin salonan helbestên qehremaniya dagirkirina welatekî din û qirkirina gelekî din hatin xwendin.

Belê, welatên Yekîtiya Ewrûpa ku Tirkiye jî xwedêgiravî haziriya endametiya wê dike, lêborîna xwe jiber neheqiya ku kirine dikin û berdêla kiryarên xwe didin. Heta li gelek welatan êdî îptalkirin û jibîrkirina serketinên 60-70 sal berê li hember dagirkirina welatê xwe û bi berdêlên giran hatine bidestxistin dikeve rojevê û minaqeşe liser tê kirin. Lê Tirk her dagirkirina welatan û qirkirina gelan pîroz dikin.

Tirkan her xêr ji nakokiyan dîtine

Osmanî di dagirkirina Kostantinopoliyê de di nakokiyê navbera xiristiyanan istifade kiribû. Berî hêrişên Osmaniyan, Împaratorê Bizansê ji Xiristiyanên Romê alîkarî xwest. Papayê wê demê li himber alîkariya ku bide ji Împarator Konstantîn daxwaza yekkirina dêrên Katolîk û Ortodoks kir. Lê Ortodoks ji Katolîkan nefretê dikirin û nedixwastin bi Dêra Romê ve bên girêdan. Osmaniyan di 19ê Nîsanê de hêrişî Bizansê kir. Piştî 53 rojan û bi 4 hêrişên dijwar Konstantînopola ku ji 1125 salan virde paytextê Imparatoriya Roma rojhilat bû hat dagirkirin û ket destê Osmaniyan.

Encamên dagirkirina Konstantînopoliyê

Dagirkirina Konstantînapoliyê di dîroka dinyê de bû encama gelek mijarên girîng. Piştî bidestxistina Konstantînopoliyê Osmaniyan bi awayekî bêtir jixwebawer berê xwe dan rojava. Jibo ku li rojhilat jî serweriya xwe îlan bike û sînorên Islamê fireh bike Imparatorê Osmanî Fatih Sultan Mehmed cesaretek mezin di xwe de dît. Jibo ku Îslamê heta diyarên dûr bibe û serweriya Xiristiyaniyê bi dawî bîne, li himber Xiristiyanan bê ku wext winda neke dest bi seferan kir.

Sultan Mehmed 2 Împaratorî, 4 Qraliyet, 6 Prenstî û 5 Duk ango 17 Dewlet an dagirkir an ji rûyê erdê rakir û serweriya Osmanî û Îslamê bisedsalan li Ewrûpa rojhilat bicîh kir. Di şerê bi Roma rojava re bajarê Otranto ku jibo gihandina Romê gelek girîng bû, dagirt lê temenê wî têrê nekir ku navenda Xiristiyanên Katolîk jî bidest bixe.

Du navendên Xiristiyanan

Belê, di salên dagirkirina Konstantînopoliyê de Xiristiyan dinav xwe de du beş û xwediyê du paytextan bûn: Roma û Konstantinopolis (bi navê îroyîn Îstanbûl). Îslama ku liser bingeha fikra cîhadê ango serweriya cîhanê derket holê, jibo bidestxistina van herdu navendên Xiristiyanan hewl da. Bi taybetî jî jibo bidestxistina Konstantînopoliyê ku li gora Romayê nêzîktir bû, ket nav hewldanek mezin. Pêxemberê Misilmanan Mihemmed jibo ku kûmandarên Îslamî yên piştî xwe bi hewes bike, kûmandarê ku wê Konstantînopoliyê bistîne muqeddes kiriye.

Bidestxistina Konstantînopoliyê li himber Xiristiyaniyê serkeftinek mezin ya Îslamê ye. Di dema îroyîn de balkêş e, welatekî ku dixwaze bibe endamê Yekîtiya Ewrûpa, liber çavên hemû dinyê bi cilên Îslamê sembol dike û bi şûrên ku bi xwîna xiristiyanan hatiye sorkirin, yeniçeriyan derdixe sûk û kolanan û hersal dagirkirina Konstantînopoliyê pîrozdike û dagirkirên ku li wir mirine, şehîd îlan dike.

Belkî helwesta Ewrûpa ji ya Tirkiyê jî balkêştir e. Tirkiye bêtirs û bêşerm îro jî liser jenosîda Ermeniyan; kuştin û dagirkirina welatê Kurdan bêdeng dimîne, heta hewl dide ku xwe wek terefê mexdûr nîşan bide, lê ji welatên Ewrûpa dengekî ciddî dernakeve..

www.sirnet.org

Dewleta Sûriyê Herîriyê Kurdan Şêx Mihemed Maşûq Xiznewî kuşt!





Dewleta Sûriyê wek hemi dagîrkerên Kurdistanê bi awayekî dostanî dijminatiya Kurdan didomîne. Ji aliyekî dixwaze hejmara Kurdên ku ji sala 1962an de bê nasnamene destnîşan bike û xwedênegiravî nasnama wan liwan vegerîne, ji aliyekî Kurdan wek parçeyek ji dewleta Sûriyê qebûl dike û di binre jî welatparêz, rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd direvîne, êşkence dike û dikuje.

Sûriya ku bi salane rê liber demokrasiya hindurîn girtiye û destdirêjiya dewletên cîran dike, bi qetlîama Qamişloyê di derbarê pirsa Kurdên rojava de rûyê xwe yê şoven eşkere kir. Di vê qatlîama Qamislo de bi dehan Kurdên welathez bi destên Erebên nîjadperest hatin şehîdkirin û di dîroka Sûriyê de rûpelek reş vebû. Sûriyê ne tenê destdirêjîya Kurdên Rojava dike, lê herweha destdirêjiya başûrê Kurdistanê jî dike û bi riya destekkirin û piştgiriya terorîstên Ereb, Kurdan qetil dike, serê wan jêdike. Gellek kesan bawer dikir ku wê rayedarên dewleta Sûriyê dev ji astengkirinên liber demokrasiyê û pirsa gelê Kurd berde û rêzgirtina mafê mirovan bigre. Lê bi helwestên xweyên hovane carek din raxist ber cavan ku siyaseta kevneperestiya şovenîstiya Ereban di serê wan de meyaye û zû bi zû nikarin devjê berdin. Nîşanek jivê barbarî û hovîtiya dewletê kuştina Şêxê Kurd, Şêx Mihemed Maşûq Xiznewî ye.

Şêx Maşûq, Şêxekî Kurd û oldarekî welathez bû. Jiber helwesta xwe ya welatperwerî, di çavên rayedarên dewleta Sûriyê de bûbû kelem û sûjin. Pirbûna mirîdan, Kurdbûn û welatperweriya wî rayedarên dewletê xistibû nava qelakê û ew ditirsandin.

Şêx Maşûq di 10 ê meha Gulanê de ji aliyê hêzên ewlekariya dewletê ve hatibû revandin û ji wê demê de winda bû. Biser ku gellek serlêdan li hikûmetê bûn û daxwaza Şêx Maşûq hat kirin jî, lê rayedarên dewletê girtina Şêx înkar kir û xwedî li gunehê xwe derneket. Şêx Maşûq di 27 ê Gulanê de ji aliyê hêzên dewletê ve li beramberî êşkenceyên giran mabû û li nexweşxana Şamê 15 seetan tedawî dîtibû. Piştî nexweşxanê hêzên ewlekariyê dîsa ew biribûn û di 01.06.2005an de cendekê wî li Dêra Zorê, bêkes û bêxudan hat dîtin



Bi kuştina Şêx Maşûq, kîn û nefreta Kurdên Rojava li dijî rejîma Sûriyê zêdetir bû û cendekê Şêx, Kurd bi ruhek netewî cardin anîn cem hev. Kurdên li seranserê Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê di yekê Hezîranê de li Qamişloka rengîn kombûn û bi 500 hezar kesî meşek li dij kiryarên dewletê lidarxistin. Ligor agahiyên ku ji Qamislo gihan me, Kurdan nalet li dewletê anîne û bi dirûşmeyên wek „Şêxek çû 50 milyon Şêx dijîn, bijî Kurd û Kurdistan, Kurd namirin“ û bi dehan wek wan.

Şêx Mihemed Maşûq Xiznewî kiye?

Mihemed Maşûq kurê Izzeddîn Xiznewî, di 25.01.1957an de li gundê Tilmarûf (herêma Qamislo) hatiye dinyê. Ew ji malbatek Kurdên welatparêz tê ku di riya Îslamiyetê de temsîliya riya Xiznewî dike. Riya Xiznewî di Îslamê de, di nav gelê Kurd de temsîla Neqşîbendiyê dike. Bavê wî yê kal, Ehmedê Xiznewî ji gundê xwe (gundê Xizna-Kurdistana Sûrî) destbi propaganda Neqsîbendiyê kir. Di civaka Îslamên Kurd de du riyên Îslamiyetê yê sunî hene. Yek ji wan Gêlanî û ya didiwan jî Neqşîbendî ye. Mihemed Maşûq Xiznewî kursên liser fiqih û şerîeta Îslamî, ligel wê di sala 1974an de sefa nehan stend. Piştî wê di sala 1977an de gymnasîum (lîse) xilas kir. Piştî wê di maheda (Institut) a şerîetê li Şamê berdewam kir û bi dereceyek bilind di 1978an de xilas kir. Jiber ku di xwendina xwe de gellek jêhatî bû, mahedê jêre rê da ku li Medîne el Munewwera, li Suudiya Erebî, li daniştgeha Îslamî xwendina xwe berdewam bike. Di sala 1984an de lîsansa xwe ji wir stend. Di sala 2001an de mastera xwe liser „di Îslamê de Parastina Bingeha Jînê“girt. Bi dû wê re, di ilmê Îslamiyetê de dereca Doktora liser „Di nelihevkirina mezhebên Îslamî de Rola Kevneperestiyê“wergirt.

Mirîdên Şêxên Xiznewiyan nebes dinav civaka Kurd de, lê dinav milletên din, heta bi Misirê jî hene. Lê, liba Kurdên welatparêz ew wek Îslamên welatparêz tên binavkirin. Jiber ku bav û kalên Mihemed Masûqê Xiznewi herdemê piştgiriya şoreşên Kurdî kirine. Wek şoreşa M.Mustefa Barzanî, Şêx Saîd û wekî din. Di dema dawiyê de di xutbên roja Înê de li dijî terorê û terora dewletê axaftin dikir. Şêx Masûq di axavtinên xwe de liser terorê digot „Terorîzm ew tişte ku kesên bêguneh jibo armancên siyasî bên kuştin.

*Doktor Maşûq Xiznewî li Qamislo Serokatiya Navenda Jîngeha behsa Îslamî ava kir.

*Ewî di înternetê de malpera xwe birêve dibir.

*Her roja Înê li mizgefta El Bur el Îslamî ya li Qamislo xutbe dikir.

*Endamê Komîta Berpirsiyarên Navendên Behsa Îslamî li Şamê bû.

* Endamê Komîta Sûriyê ya hevkariya Mesîhî û Îslamî bû.

*Endamê Rêxistina Nivîskarên Nûjeniyê bû.

Mihemed Masûq Xiznewî li gellek welatên Ewrûpa geriya û bi gellek rayedar û berpirsên van dewletan re hevdîtin lidarxist û di van civîn û hevdîtinan de pirsa Kurd, bi taybet pirsa Kurdistana Sûrî anî zimên û gellek caran dewletên ku piştgiriya terorîstên li Iraqa nû dikirin, sermezar kir. Herweha piştgiriya prosesa pêkanîna demokrasiya di Rojhilata navîn de dikir.

Dijminên gelê Kurd bawer dikin ku wê bi kuştina Kesayet, Rewşenbîr, Sêx, Gundî û Gavanên Kurd, dawiyê li netewexwaziya wan bînin û Kurdan ji dozê vegerînin. Lê herku diçe bîr û rayên neteweperweriyê di dil û mejiyê Kurdan de xurttir dibe, kok û şax berdide. Em bawerin, wê helwest û dijminatiya dagîrkerên Kurdistanê beyhûde biçin û bivan kuştinan wê Kurd bêhtir bên sûtin û nêzîkî hev bibin.

Em wek Peyama Kurd sersaxiyê ji malbata wî, mirîdên wî û ji temamê gelê Kurd re dixwazin.

www.alikurdi.org

Rewsenbîr û Eniya Kurdistanî

Ji Rojhilata Kurdistanê *

Li cîhanê kêm netewe hene ku jiyan û xebata wan weke ya netewa Kurd be. Berî ku em di aliyê ferhengî û çandî de wateya xebatê nas bikin, bilindbûn û daketina wê bizanibin, me çek hilgirtin û me doza otonomiyê kir. Di wê pêvajoyê de me cîlekî pir pak kir qurban ku tu xezîne nikarin şûna wê bigrin. Me tu encam jî ji wê xebatê wernegirtin. Bêyî ku em ji rewşa welat û herêmê agahdar bin me pîştevaniya artêşa sosyalîst dikir. Me nirx û qîmeta çepgiriyê bilind dikir jiber ku ew jibo me ji rewşa dinyayê girîngtir bû. Li aliyekî din jî me ji xelkê re digot ku em birîna wan û pirsgirêka wan ya azadîxwaziyê derman dikin. Lê mixabin me dîrokek mezin bi destê xwe şewitand. Birastî kesek weke me nikare dîrokê û derfetan bişewitîne. Em bi navê netewexwaziyê tevlî xebatê bûn, lê me şîroveya rewşa siyaseta Kurdî nekiribû. Me ew xebata têrqurbanî bi koranî dikir. Jiber vê yekê em bi hêsanî li pey pîlanên terorîstan çûn, me gelek navdarên xwe bi hêsanî li xurbetê binax kirin. Me neyarên xwe bi hêsanî di hembêza xwe de dane razandin. De were jixwe re li vê karesata dîrokî binere ku karwanekî mezin dest ji çeperan berdaye û berê xwe dane Ewrûpa û Amerîka! Di dema destpêka xebatê de, hîna metroyek ax dibin destê me de tune bû, me birakujî kir. Hîna me nizanibû ragihandin çiye, me bi riya radyoyên xwe yên riziyayî hevdû tawanbar dikir. Li beramberî van şaşiyan jî dîsa baweriya xelkê her bi xebata me hebû. Me di encam de ew jî jixwe bidûr xistin. Demekê di zindanên rejîmê de sedî 80ê ji girtiyan siyasî bûn. Bi xêra me ew jî hat guhertin û niha ji sedî 90ê wan diz, tiryakî û çete ne. Eger berê ji sedî 1ê ciwanan karê tiryakîtî û gemar dikirin, niha ew rêje bi carekê de bilind bûye. Em heta niha di guhê ga de raketîbûn. Serê me niha ji berê tevlihevtire. Ramana ku em bi riya dîalogê pirsgirêkan çareser bikin, gelekî dûrî me ye. Tiştê herî ecêb ew e ku em tev behsa yekîtiyê dikin, lê kesek gavekê ji aliyê xwe ve navêje. Eger ne ji xebata 14 salî ya Başûrê Kurdistanê û bûyera girtina Abdullah Ocalan bûya niha Kurdistan dibû Ecemistan. Li cîhanê îro çend projeyên siyasî hene:

Projeya Rojhilata Navîn ya mezin di rojevê de ye.

Kesek êdî hesabê Îslama siyasî nake.

Dema dîktatoriyê derbas bûye.

Doza Kurdan li Başûr ber bi encama dawî ve diçe

Globalîzm bipêş dikeve û wisa diyare ku cî digre.

Her tişt îşareta derketina şerekî di navbera Amerîka-Brîtanya û Îranê de didin.

Nasionalîzm êdî di nava hemû civakan de desthilat e.

Mafê mirovan li herderê cîhanê bû mijara axaftina rojane.

Erka rewşenbîrên rasteqîn ewe ku biher awahî liser ramana Eniya Kurdistanî raweste. Ev platform di vê demê de karekî hestyarane û berpirsyariyek dîrokî dide ser milê rewşenbîran. Gelek qezencên mezin têde hene. Divê rewşenbîr jibo vê projeyê, ligel hemû aliyên siyasî (Partiya Demokrata Kurdistan/ Îran, Yekîtî Şoreşgerên Kurdistan, Komeleya Zehmetkêşanê Kurdistan/ Îran û PJAK) danûstendinê bikin. Armanca sereke ya van herçar partiyan jî sosyalîzme û ew hilgirên rihê netewî ne. Divê ew bi hevre gotûbêjê bikin û bingeha damezirandina partiyeke nû bi navê "Partiya Sosyal-Demokratên Kurdistana Rojhilat" deynin. Agahdariyên vê dawiyê mizgîniyên baş didin mirov. Herçar rêxistinan jî biryar liser çêkirina Eniya Kurdistanî dane. Eger ev herçar partî lihev bikin, îslamî jî neçar dibin ku beşdarî vê eniya nû bibin. Bêguman eger rewşenbîr di vê projeyê de biserkevin, serbilindî û şanazîyeke mezin e û ew ê heta heta di dilê gel de zindî bimînin.

Qezencên pêkhatina Eniya Kurdistanî :

Wê hêza siyasî, leşlerî û ragihandinî dibin yek sêwanê de û li yek navendê kom bibe.

Wê aştiya netewî pêk bê.

Wê pêla siyasî û dîplomasî li derveyî welat bilind bibe.



Wê dilê gelê me li hundir û derveyî welat geş bibe.

Çi şermek mezine ku hîna satelîteke Eniya Netewa Kurd li Rojhilatê Kurdistanê tuneye. Hêvîdarim helwesta rewşenbîran bibe bingeh jibo kombûna herçar aliyan û gel bi mizgîniya çêbûna Eniya Kurdistanî dilxweş bikin. Bi yekgirtina çek û pênûsê em dikarin Kurdistan dibin lingên dijmin de bikin Agiristan. Em dikarin vê yekê berî herkesî bi hêza xwe bikin. Eger ev proje bisernekeve, divê rewşenbîr rastiyê ji gel re bibêjin ka kî li pêşiya biserketina vê projeyê bûye kelem.

** Diyarî jibo Sehîd Seîd Yezdan Pena ku pêkhatina Eniya Kurdistanî yek ji mezintirîn xewnên wî bû.*

** Ji ber tirsa ji rejîma Îranê, nivîskar navê xwe nenivîsandi ye. Nivîs ji "Ateka-Kurd" hatiye wergirtin.*





www.ekurd.net

Kurtenûçe

Êşkencecî ji êşkencê gazindan dikin



PK/Ankara - Wezîrê berê yê Avadanî û îskanê û endamê Partiya MHPê (Partiya Tevgera Neteweperest) Koray Aydin û hevalên xwe di dîwana bilind de gazind ji hebûna êşkencê kirin. Koray Aydin û hevalên xwe jiber bertîlxwarin û sextekariya di Wezareta Avadanî û Îskanê de tên darizandin.

Ci ecêbe ku rayedarekî Partiya faşîst a MHP, ku dijminên Kurd in û piraniya endamên wan xwe dinav hêza Polîs û eskerên Tirkiyê de hûnandine, îro gazindan dike û dibêje „êşkence ji aliyê hinek ciyan ve tê paraztin". Koray Aydinê ku di êşkencekirin û kustina bi hezaran Kurdan de qet dengê xwe nedikir, îro jibo ku xwe jibin tohmeta bertîlxwarin û sextekariyê derêxe, gazindan ji hebûna êşkencê dike. Mustesarê Koray Aydin Saadettîn Dînçer dibêje „jibo ku ez ji Emniyetê sax derketime ez dua dikim". Alîkarên wan Mehmet Ince, Fethî Soydan û Sedat Aban jî gilî û gazindên xwe dikin û dibêjin „em heft rojan raserî êşkenca bedenî û manewî hatin". Êêê, ji berê de gotine „dinya bi dorê ye, ne bi zorê ye!"

Siyaseta Iraqparêzî û Tirkiyeparêzî ji Şovenîzma Ereb û Tirkan xetertir e



Bayram Ayaz

Ji dema neliheviya navbeyna Partîyê û Yekîtiyê aşkere bûye û vir de destên welatperwerên Kurd li ser dilê wan e.

Xemgînîyek giran bi ser me de girtiye. Gelo dê çawa be ?

Digel ku em baş dizanin, di jiyana civakî û polîtîk de pirsgirêkên wisa dikarin hertim derkevin, lê cardin jî rewşa dawî nayê pejirandin û mixabin moralê Kurdan pê gelek şikest.

Di hemû tevgerên civakî û polîtîk de, dem dem hin bizav û rêxistin bala gel dikşîne, hêviya gel bi wan ve tê girêdan. Tevgera başûrê Kurdistanê, bi taybetî prosesa dewletbûnê di vê qonaxê de jibo Kurdistaniyan roleke wisa dilîze, cihê hêviyê û baweriyê ye. Vêca dema ku li vê navendê astengî peyda bibe, bivê nevê xewnên şîrîn li mirov diherime.

Ev nelihevî, pirseke wisa ne hêsa ye ! Tenê rekabetek siyasî-rêxistinî di navbeyna du partiyan de jî nîne. Ev minaqeşe dê bandorê liser çarenusiya miletê Kurd bike. Damezirandina dewletekê li seranserê coxrafiya başurê Kurdistanê û çareserkirina pirsa Kerkûkê, hingî bi lihevkirina van herdu partiyan ve girêdayî ye.

Eger herdu îdare nebin yek, Parlamena Netewî ya Kurdistanê erkên xwe bicîh neyîne, Serokherêmek neyê hilbijartin, yanî bi kurtî eger li Kurdistanê yekîtîya navxweyî berdewam neke û temsîlîyek yekgirtî û xurt dernekeve, metirsiyek mezin heye ku bizava Kurd bi sernekeve û destkevtiyên me jî jidest here. Dewletên cîran û statukoparêzên Rojhilata navîn jibo vê yekê bi her awayî çalak in. Jibo ku Kurdan berdin hev hemî tiştî dikin. Em hemî van xeteran dibînin, lê cardin jî dikevin dafika dijminên xwe. Carna, ne ku rêxistinek dixwaze, lê ji ber raman û xebatên xwe dikare çewt bikeve dafikê.

Li vêderê pêwist e em behsa du hizran bikin. Yek jê bîr û hizrên olî ye, yê dî jî çepîtiya „internasyonalîst" e.

Tevgera îslamî, di bin nav û piştperdeya „ummetî îslam" de, dijayetiya daxwazên netewî dike. Ev îslama ummetçî ji Filîstînê re dewletê dixwaze, lê ji Kurdan re damezirandina dewletê heram dike. Pir balkêş e! Lê mijara nivîsara me ne ev e, emê lê derbas bibin.

Ya duyem. Bîr û hizrên çepîtîya înternasyonal, mejiyê kadirên Kurdan tevlihev kiriye. Gelek çepên Kurd di warê netewî de bûne nihîlîst. Nihîlîzm ketiye ruhê wan. Qedrê daxwazên miletê xwe nagirin, welat jibo wan „hîç" e! Kadroyên wisa zû dikarin berê xwe ji doza milet û welatê xwe bidin alî. Bi gelek hêsayî dikarin dest ji sembûl, ziman, çand û dîroka xwe berdin. Doza xwe qurbana „demokrasiyê" û an îdeolojiyekê bikin. Li bakurê Kurdistanê, mixabin em her roj şahidê bûyereke wisa dibin.

Li başurê welatê me jî, eger em pirsên heyî baş binirxînin, dibînin ku di esasê meselê de du bîr û hizrên cuda rola xwe dilîzin. Yek jê bîr û hizra Îraqparêzî ye, ya dî jî xeta Kurdistanî ye.

Armanca Konsepta Kurdistanî, dewlet û desthilatdarî ye. Dewlet liser axa Kurdistanê, li seranserê coxrafiya başurê Kurdistanê. Ev hêz dixwaze bi rîyên demokratîk temsîlîya gelê Kurdistanê bidestbixe û liser navê gel desthilatê bikar bîne. Jibo vê xetê armanca sereke ew e ku Kurdistan di qada navnetewî de bibe xwedî statûyek yasayî û nasnameyek siyasî-netewî. Ev xet helbet dixwaze ku Iraq bibe welatekî demokrat û federal. Hebûna sîstemek demokrat jibo Dewleta Kurdistanê piştrastîye.

Lê, esil, dilê vê xetê jibo Kerkûkê lêdide. Her wisa ev xet xemgîrê Qamîşloyê, Amedê û Mahabadê ye.

Lê hin hêz hene dema diçin Bexdayê, dibin milyaket û çêkerê demokrasiya Bexdayê. Ji Kurdistanê zêdetir bi Bexdayê mijûl in. Ew dikarin bi hêsayî konseptên ku pêşî li prosesa dewletbûna Kurdistanê bigrin, îmza bikin. Ev êşa tevgera Kurdistanê ye.

Fikirê mirov çibe, zikirê mirov jî ew e.

Eger hertim Kurdistan di bîra yekî de be, mirov bi Kurdistanê razê û xewnên Dewleta Kurdistanê bibîne, eger îro xwezî be jî lê di xewnên xwe de sînorê Kurdistanê her biçe fireh bike, û ku mirov ji xew şiyar be, yekser li ser xem û xeyalên xwe kar bike, dê wê demê Kurdistan û Dewleta Kurdistanê ne xeyal be, wê bibe rastî.

Eger mirov nekeve ser xeta Îraqparêziyê, Tirkiyeparêziyê, lê jibo Kurdistanê amadeyê her bedêlekê be, dê ala me jî linav alên cîhanê pêl bide. Ax û zarîna Kurdan, tunebûna wan e.

Partî û Yekîtî, lihevkirin, ev cîhê keyfxweşiyê ye. Lê divê Kurdên dilsoz û rêxistinên Kurdistanî livan bîr û hizrên çewt û çepel şiyar bin. Ev hertim dikarin liber rêçûna Dewleta Kurdistanê bibin çolpe.

Di mesela Ermeniyan de Tirk carna li nêl dixin, carna li bizmêr!..



Hedîye Dag

Heçê dewleta Tirke ne heq heye ne jî edalet. Jixwe derew, fen, dek û dolab parçeyek ji dîroka dewleta Tirk û rayedarên wê ne. Bi eşkere liser û çavê awira gelemperiya cîhanê dinerin û bêyî ku fedî bikin, derew liser derewan dikin. Hetanî berî çend rojan Serokwezîrê Tirkan Erdogan di mesela Ermeniyan de digot " ev ne karê me siyasetmedara ye, ev kar karê dîrokzana ye, bila dîrokzan liser vê pirsê raberizin û çareser bikin". Liser vê gotina Erdogan,gellek ji rewşenbîr, nivîskar û dîrokzanên Tirkiyê dên û bala xwe dan pirsgirêka qirkirina Ermeniyan a 1915an û xwestin liser wê di 25/05/2005an de konferansekê bi navê: Ermeniyên Osmanî yên dema hilweşandina Împaratorîyê: Pirsên berpirsiyariya zanistî û demokrasiyê" lidarxin. Lê wek hercarê, çep û rastên Tirkan bûn yek û êrîşî amadekarên vê konferansê kirin. Bi taybet Wezîrê Edaletê Cemîl Çiçek û Serokê Partiya Atatirk Denîz Baykal bi tundî êrîş birin ser amadekarên vê konferansê û ew wek xayînên hindurîn binavkirin.

Wezîrê Edaletê Cemîl Çiçek xwe di vê derbarê de kir şûna polîsê xirab (jixwe polîs e) û rola xweya tehdîdkirinê bicîh anî. Wek tê zanîn, di girtin an jî êşkencê de hinek polîs rola baş dilîzin û hinek jî ya xirab da ku kesê girtî xwe nêzîkî polîsê baş bike û lê mikur bê.

Serokwezîr bi rola xweya polîsê baş ve rê ji rewşenbîr, nivîskar û dîrokzanên demokratên Tirkan re vekir û kir ku ew xwe di mesela qirkirina Ermeniyan de eşkere bikin. Piştî eşkerekirina wan, êdî dor hat ser polîsê xirab Cemîl Çiçek û Denîz Baykal û wan jî ew dan ber şeg û pegan. Jiber van tehdîd û çavtirsandinên dewletê, amadekarên konferansê konferans dan paş. Herçiqasî ew dibêjin emê di demên pêş de konferansê lidarxin jî lê halîhazir ew li bendî sînyalên dewletê mane. Em meraq dikin gelo niha wê Serokwezîr Erdogan di vê mesela Ermeniyan de çî din bide ber ruyê xwe! Heger vêcarê Erdogan bêje "mesela qirkirina Ermeniyan ne karê me siyasetmedara ye, ev karê eskera ye, bila esker çareser bikin" qet şaş nemînin!

www.arsiv.com

Li Kurdistanê terora "namûs"ê



Hêvîdar Zana

Terora ku di bin navê pakkirina "namûs"ê de li Kurdistanê ji aliyê mêran ve tê kirin, ji terora El Zerqawî jî xerabtir e.

Li bajarê Silopî Bêrîvana 18 salî, bi sedema ku hatibû tecawizkirin, ji aliyê birayê xwe yê 16 salî ve hat kuştin.

Bêrîvan ducan bû û zaroka di zikê wê de 8 mehî bû. Heta niha ji xeynî serokê Şaredariya Silopî û çend rêxistinên parastina mafên jinan, kesekî bûyer şermezar nekiriye û deng ji rêxistinên Kurdan derneketiye.

Dema ku mirov berê xwe dide têgihiştina namûsê ya mêrên Kurd mirov rastî paradokseke mezin tê. Mêraniya ku ew nikarin nîşanî rejîmê û leşkerên wê bidin, dikarin nîşanî keçên 14-15 salî û jinên xwe bidin.

Dewlet herroj di îşkencexaneyên xwe de bi copan tecawizî wan dike, herroj li ber çavên wan welat tê talankirin, keç û jinên ku ew namûsa wan ji xwe re dikin bênamûsî, ji birçîbûna zikê xwe bedena xwe difroşin lê deng ji wan dernakeve.

"Mêraniya wan" têrî wê yekê nake ku ew li hemberî polîsekî dewletê bi zimanê xwe yê zikmakî biaxivin, lê têrî kuştina keçeke 18 salî dike. Eger zarokekî 16 salî were perwerdekirin ku ew bikaribe xwişka xwe ya 18 salî bikuje û derkeve kolanê bibêje "min namûsa xwe pak kir, werin bibînin" wê demê pêwîste endamên vê civakê kumên xwe deynin ber xwe û biramin.

Berî her tiştî lazime têgeha namûsê were zelal kirin.

Civakeke ku heta bi navên mirovên wê ji aliyê dijmin ve hatibe tecawizkirin, navên deşt û newal, çiya û baniyên wê hatibin qedexekirin û endamên wê ev yek pejirandibin, mirov nikare li wê civakê behsa namûsê bike.

Îcar mesela civaka me û namûsê jî bûye weke mesela ker û kurtan.

Yê ku nikaribe bi kerê, dibeze kurtan.

Mêrên civaka me jî namûs teslîmî leşkerên dewletê kirine û ji bo ku wê şerma xwe veşêrin û mêraniya xwe îsbat bikin, teroreke nedîtî li ser jinên bêparastin dimeşînin.

Lê pêwîste ji bîr nekin, heta ku jin namûs be, ewê jî bênamûs bin.

Wê Frensa enstîtuyekê li Hewlêrê veke



PK- Parîs

Wezîrê Karûbarê Rewşenbîrî yê Hikûmeta Kurdistanê Samî Şoreş, piştî amadebûna di Mihrîcana Cannes de, li Frensa çend hevdîtinên girîng li gel Wezareta Karê Derve û Wezareta Rewşenbîrî pêk anîn. Şandeya Kurd, ji bo van hevdîtinan bi awayekî fermî ji aliyê Wezareta Karê Derve ve hatin vexwendin û ew ji aliyê Şêwirmendê karûbarê rewşenbîrî yê wezaretê ve hatin pêşwazî kirin. Wezîrê Karûbarê Rewşenbîrî Samî Şoreş li ser van hevdîtinan daxuyaniyek da û got ku hevdîtinên wan bi temamî li ser karên rewşenbîrî çêbûne. Ew ji aliyê Wezareta Rewşenbîrî ya Frensa ve li girîngtirîn muzeyên Frensa hatine gerandin û her wiha soz hatiye dayîn ku li Kurdistanê piştgiriya xebatên rewşenbîrî were kirin. Wezareta Rewşenbîrî ya Frensa daye zanîn ku ew dixwazin ji bo fêrkirina zimanên biyanî û pêşdebirina xebata zanyariyê li Hewlêrê enstîtuyeke rewşenbîriyê vekin. Her wiha wê Wezareta Frensa ya Çandê, di warê perwerdekirina karmendên muzeyan de jî piştgiriya Wezareta Kurdistanê bike.

Şandeya Kurdistanê, li Parîsê li gel rayedarên UNESCO jî rûniştin û doza restorekirin û parastina Keleha Hewlêrê li wan kirin. Ev daxwaz ji aliyê UNESCO ve hat pejirandin û soz hat dayîn ku di zûtirîn wext de, ew li gel Hikûmeta Kurdistanê dest bi xebata restorekirina Kelehê bikin. Wezîrê Karûbarê Rewşenbîrî Samî Şoreş û şandeya li gel wî roja 25ê Gulanê dawî li hevdîtinên xwe anîn.

„Malbatên Şehîdan" çûn navnîşaneke şaş

PK - Komek mirovên ku xwe weke malbatên şehîdan didin nasandin, li Stenbolê li Meydana taksîmê civiyan û piştre berê xwe dan Komeleya Mafên Mirovan ya li taxa Siraselviler.

Bi navê malbatên qaşo gazî û şehîdan, taceguleke reş danîn ber deriyê IHD. Piştre jî seroka Komeleya Gaziyên Şer, Şehîd, Bî û Yêtiman ya şaxê Stenbolê Gonul Alpaydin axaftinek kir û got „ev çi şêwe parêzvaniya mafên mirovan e. Ma mafên mirovî yên leşkerên ku ji bo welat şehîd ketin tune bû?".

Lê belê ev qaşo malbatên şehîdan çûbûn navnîşaneke şaş. Pêwîst bû ew li Enqerê biçûna ber deriyê Biryargeha Serokatiya Serleşkeriya Gîştî ya ku dibe sedema derketina şer û zarokên wan dişîne mirinê.

Weke ku tê zanîn Abdullah Ocalanê ku wezîfedarekî Serleşkeriya Gîştî ya Tirkiyê ye, li Girava Îmralî ya girêdayî Serleşkeriyê, bi fermana ku ji leşkeran wergirt, di sala 2004an de bi riya parêzerên xwe, talîmata destpêkirina şer da partiya xwe PKK. Piştî wergirtina talîmatê, PKK yekser dest bi şer kir.

Bi vî awahî şerê bi gemar yê ku li gora hejmarên fermî yên dewletê bûbû sedema 35 hezar mirov, careke din ket rojevê. Ji wê demê û heta niha bi sedan ciwanên Kurd û Tirk mirin.

Weke qaşo malbatên şehîdên Tirk, malbatên şehîdên Kurd jî şaşiyê dikin.

Li şûna ku ew Abdullah Ocalan protesto bikin ku zarokên wan dixapîne û dişîne şer, ew berê xwe didin navnîşanên şaş.

Ya herî rast ew e ku malbatên Kurd û Tirk bi hev re berê xwe bidin Biryargeha Serleşkeriya Gîştî û Girava Îmraliyê. Kesên ku dibin sedema derketina şer û pêwîste werin protestokirin li wir in.

Inter Milan, Kurdan ji bîr neke!

PK - Wê Inter-Milan, li gel gerîlayên Meksîkî (EZLN) yên dibin pêşengiya Marcos de bilîze.

Di çapemeniya Îtalî û Spanî de niha mijara herî balkêş maça fûtbolê ya ku wê di navbera gerîlayên EZLN û Inter de were lîstin e.

Berî heftiyekê serleşkerê EZLN yê bi navê Marcos, bi riya nameyeke taybet doza maçeke dostaniyê li serokê Inter, Massimo Moratti kir û li gora **çapemeniya Îtalî ev daxwaz ji** aliyê Inter ve bi kêfxweşî hat pejirandin. Heta niha herdû aliyan di derbarê tarîx û cihê maçê de tu daxuyanî nedane.

Tê gotin ku birêvebir û lîstikvanên Inter Milan bi gîştî alîgirên rêxistina Zapatîstin û wan heta niha bi gelek şêweyan alîkariya aborî gihandine Îndiyên Meksîkî û gerîlayên EZLN.

Inter Milan her wiha alîkariya Colombîya, Arjantîn, Brasîl, Cûba, Filistîn, Îran û **Bosna jî kiriye. Ew niha dix**wazin doktoran, fisioterapeut û nexweşxaneyeke bi infraestructur û derman bigihînin Îndiyên Meksîkî.

Gerîlayên EZLN di 1ê Çileyê sala 1994an de ji bo mafên Îndiyên Meksîkî çek hilgirtin û derketin serê çiyan. Ew bi gîştî li herêma li ser sînorê Guatemala dimînin.

Li gora agahdariyan wê maça fûtbolê jî li wê herêmê çêbibe ku bi navê Chiapas tê naskirin.

Em li hêviyê ne ku Inter Milan rojekê Kurdan jî bibîne.



Li Lubnanê Saad Harîrî mîsyonê bavê xwe hilgirt



Serokwezîrê kevn yê Lubnanê Refîk Herîrî

Hilbijartina Lubnanê û bandora wê

Mustafa Çwartayî

Qonaxa yekem a hilbijartina Lubnanê, bi beşdarbûna ji %28 ên xelkê bidawî hat. Heta niha lîsteya ku Saad Herîrî serokatiya wê dike, bi rêjeyeke baş biserket. Lubnan, herçend ji destpêka serxwebûna xwe û heta hina sîstemek demokratîk birêve biriyę jî, lê bi dirêjaya salên borî ku Sûriyê hikim lê dikir, ew sîstema demokratîk têk çûbû. Sûriyê bixwe Serokkomar, Serokwezîr û hemi berpirsên dewleta Lubnanê destnîşan dikir. Gellek ji wan dihatin kuştin bêyî ku bê zanîn bê ji aliyê kê ve hatine kuştin. Wek, Kemal Canpolat, Rînîye Muewwez, Reşît Keramî, Beşîr Cumeyîl. Lubnan, jiber dagîrkirina Sûriyê û desttêxistina Îranê serxwebûna xwe jidest dabû. Wê nikarîbû li komelgeha navdewletî rola xwe bilîze. Hetta pêwendiyên hindur û derve jî ne di destên Lubnanê debûn. Ew dagîrkirin, di navbera rêketina Lubnan û Îsraîl de kospek (derbend) bû. Çunkî Sûriye û komkara Erebî digotin " Pêwiste Sûriye û Lubnan yek helwest hebin".

Piştî kuştina Serokê berê Refîq Herîrî, rasterast alîgirên Herîrî û gelên Lubnan Sûriyê tawanbar kirin û li dijî wê liser kolanan dest bi xwepêşandanan kirin. Amerîka û Brîtanya daxwaza vekişandina leşkerên Sûriyê kirin. Piştî wê, Fransa, Almanya û Yekîtiya Ewrûpa heman helwest nîşan dan. Hilbijartina vê demê ya Lubnanê, herçawa be vegerandina jibo demokrasîyê, azadbûna ji hikmê Sûriyê û vegerandina jibo serweriya welatê Lubnanê ye. Bi rengekî ku Lubnan berjewendiyên xwe lipêş berjewendiyên Sûriyê liberçav bigre û xwedanê polîtîk û aboriya xwe be. Ev jî, rê jibo prosesa navbera deverê û Îsraîl xweştir û hêsantir dike. Guhertinên li Lubnanê bi başî diçin pêş. Herçend nedûre ku Îran carek din bi riya Hizbûllah pirsgirêkan çêbike. Lê divê em dilniya bin, piştî ruxana Baasiya Iraqê, Baasa Sûriyê jî berbi mirinê ve diçe. Îran bixwe jî dibin tehdîdê deye. Bi nehêlana desthilata Sûriyê li Lubnanê, desthilatdariya Îranê jî jibin de birî. Çunkî Sûriyê pirda (pirr) navbera Îran û Lubnanê ye.



Piştî Fransa, Hollanda jî got "na"

PK - Piştî Fransiyan gelê Hollandî jî piştgiriya xwe neda makeqanûna Ewrûpa û di referandûmê de dengê xwe ji bo "na" bi kar anî. Li gora agahdariyan li dora sedî ji 60an makeqanûna Ewrûpa red kir. Di referandûmê de ji sedî 62 prosent çû ser sindoqan û tenê ji sedî li dora 35 kesan makeqanûna Ewrûpayê pejirand.

Li gora zagonên Hollandayê encamên referandûmê hikûmetê girê nade, lê wê tesîrê li ser biryara wê bike.

Gelê Fransî jî di referandûma 29ê mehê de bi ji sedî 55 prosentan makeqanûna Ewrûpa red kiribû.



Kurtenûçe

Dewleta Tirk deriyê Egitim-Senê girt

PK - Sendîkaya Mamosteyan Egitim-Sen wê bê girtin ji ber xaleke destûra wê ku tê de daxwaza perwerdeya bi zimanê dayikê dike.

Di destûra Egitim-Senê de doza perwerdeya bi zimanên zikmakî tê kirin.

Berê, ji Egitim-Senê hat daxwazkirin ku vê xalê ji destûra xwe derxîne. Lê Egitim-Senê bi ya wan nekir. Ev daxwaz di gelek peyman û yasayên navnetewî de jî cîh digre ku dewleta Tirkiyê gelek ji van peymanan jî îmza kiriye.

Generalên Tirk qîma xwe bi bersivên Egitim-Senê ne anîn û qet guh nedan protestoyên navnetewî. Serokerkaniya leşkerî ji Wezareta Kar re raste rast nivîsek rêkir û ji wan daxwaz kir ku li dijî Egitim-Senê "tedbîrên yasayî" bigrin. Vîlayeta Enqerê jî li ber mehkemê gilî kir û xwest ku Egitim-Sen were qedexekirin.

Li gor agahdariyên ku gihane Peyama Kurd, Egitim-Sen xwe amade dike ku li dijî vê biryarê li Strasbûrgê dawê veke. Egitim-Sen endamê ei (education international - navenda wê li Brukselê) e, ku hemî sendîkayên welatên Ewrûpî endamên vê Enternasyonalê ne. Eî kampanyayeke gelek bi tesîr dimeşîne.

Bi hewldana girtina Egitim-Senê dewleta Tirk carek din durûtiya xwe eşkere kir û îspat kir ku qet ne bi nête ku bi pîvan û normên navnetewî û bi prensîbên demokratîk di nav Yekîtiya Ewrûpa de cîh bistîne. Dewleta Tirk ji îrade û daxwaza çareserkirina pirsa Kurd û Kurdistanê gelekî dûr e.

Hevbendî ligel Yekîtiya Ewrûpa hevdîtin pêkanî



PK/Bruksel - Heyeta Hevbendiya Demokratika Kurdên Bakur (HDKB) ji Yekitiya Ewrûpa, bi awayekî resmî daxwazkir ku muzakereyên 03.10.2005 li gel Tirkiyê , li ser bingehên naskirina maf û statuyek siyasî ji bo gelê kurd, dest pêbikin.

Roja 26ê meha Gulanê heyeta HDKB li Yekîtiya Ewrûpa bi awayek resmî hate pêşwazikirin. Heyet ji Dr. Musa Kaval, Abubekir Saydam, Bayram Ayaz û Rojhat Amedî pêkhatibû.

Ji Yekîtiya Ewrûpa hate xwestin ku daxwaz û hesasiyetên Kurdan li ber çavan bên girtin û muzakera endametiya Tirkiyê li ser van rastiyan dest pê bike û bidome.

Yek ji xalên acil ku Hevbendi karê xwe yê diplomasî li ser dimeşîne ewe ku hemû cureyên diskrîmînasyonê li dijî gelê Kurd bêne rakirin: çawa Katalan li îspanya, Tirk li Qibrisê, Walon li Belcika, Tirk li Bulgariya, Macar li Romanya, têne naskirin û xudan heq in, pêwiste Kurd jî hem ji aliyê Tirkiyê ve hem jî ji aliyê Yekitiya Ewrûpa ve bêne naskirin û bibin xudan statuyek resmî û destûrî. Ango meclisek û îdareyek taybetî ji bo Kurdistana Bakur bêne damezirandin û zimanê Kurdî li Kurdistanê bibe zimanê resmî. Herwiha li hemû herêmên din yên Kurd lê dijîn hemû helwestên dûbendî, biçûkxistin û bêrûmetkirinên (dikrîmînasyona) di warê çandî, siyasî û zimanî de li dijî Kurdan bên rakirin û zimanê Kurdî di hemû waran de bê bikaranîn.

Di 16ê meha Adarê de nûnerê Hevbendiyê , di vê derbarê de nameyek resmî ji bo serokê Komisyonê José Manuel Barrosa şandiye. Her wiha nameyên din ji bo komisyona befirehkirinê û ji bo serokatiya parlementa Ewrûpa û pir endam û komisyonên Parlementê jî şandiye.

Heyeta Hevbendiya Demokratîk ku roja 26ê Gulanê birek hevdîtinên resmî li Yekitiya Ewrûpa kirin bi taybetî li ser vê yekê rawestiya û xwest ku bi kêmasî ji nihîa û pê ve agahdariyên li ser gelê Kurd jî di belge û malperên Yekitiya Ewrûpa de bên bicîhkirin.

Hak-Par xwedî li zimanê Kurdî derket, lê...



Di roja 4ê Çileya 2004an de Partiya Hak-Parê di yekemîn kongreya xwe de dawetnameyên bi zimanê Kurdî ji rayedarên dewletê re şandibûn û hinek endamên Partiyê axaftinên xwe bi Kurdî pêşkêş kiribûn. Dadgeha Asliye ya Ceza ev helwesta Hak-Parê wek sûcekî dît û ji ber vê yekê li serokê Hak-Par û 12 birêvebirên partiyê doz vekir. Roja 25ê Gulanê li gel serokê Hak-Parê A. Melîk Firat, 8 endam û birêvebirên partiyê derketin pêşberî dadgehê. Di dadgehê de ku ji ber axaftina bi zimanê Kurdî vebûbû, serok û birêvebirên Hak-Parê parastina xwe dîsa bi zimanê Kurdî kirin. Di destpêka dadgehê de serokê partiyê A. Melik Firat mafê axaftinê wergirt û da zanîn ku, ew ji ber axaftina bi zimanê Kurdî derketine mehkemê, lê mehkeme wî mafî dide wan ku ew parastina xwe bi zimanê Kurdî bikin. Firat, ev yek weke paradokseke Tirkiyê bi nav kir û da zanîn ku Hîtler û Mussolini jî ziman qedexe nekirine û şermeke jê mezintir tune ye ku mirov li Tirkiyê zimanê 20 milyon mirov qedexe bike. Birêvebirên Hak-Parê yên din jî parastina xwe di wê çarçoveyê de kirin û dadgeh bi biryara ku di 19.09.2005an de careke din kom bibe, bi dawî bû.

Di derbarê sedemên dadgehê û bikaranîna zimanê Kurdî de me serî li nerînên serokê Hak-Parê A. Melîk Firat da. Serokê Hak-Parê Firat, da zanîn ku partiya wî di hemû kombûn û çalakiyên xwe de li kêleka zimanê Tirkî, zimanê Kurdî jî bikar tîne û wê herdemê jî bikar bîne. Ji bo pirsa „gelo hûn nafikirin êdî tevayê civîn, belavok û çalakiyên xwe tenê bi zimanê Kurdî bikin?" A. Melik Firat got ku, pêdiviya wan pê heye ku ew zimanê Kurdî û Tirkî li gel hev bikar bînin ji ber ku gelek Kurd nikarin bi Kurdî biaxivin.

Mirov li hemberî vê helwesta siyasetmedarên Kurd ecêbmayî dimîne. Gelo wê kengî yekî bi cesaret ji nava wan derkeve û dawiyê li bikaranîna zimanê Tirkî bîne. Ew herdemê hesabê ji sedî 20ê Kurdan dikin ku nikarin bi Kurdî biaxivin, lê hesabê ji sedî 80ê Kurdan nakin ku di jiyana xwe ya rojane de bi Kurdî diaxivin. Ev helwest dihêle ku ev pirs têkeve serê mirov, gelo bi rastî piraniya Kurdan nikarin bi Kurdî biaxivin, yan piraniya siyasetmedar û rêberên Kurdan nikarin ramanên xwe bi Kurdî bînin ziman?. Pêwîste berî herkesî siyasetmedarên Kurd dest ji asîmîlekirina Kurdan berdin û piştre doza vê yekê li dewletê bikin.

www.arsiv.com

Kurd... ew zêr e ku dibin deryayê de maye û kefzâ zemên biserde girtiye



Loqman Berzencî
Almanya

Dema ku ez hinek caran nivîsên rojhilatnasan yên di derbarê Kurdan de diber çavan re derbas dikim, ez dibînim ku beşekî jiwan heta radeyekê heqaret bi dîroka Kurdan kirine. Lê livir liber ronahiya serkeftin û qezenca mezin ya herdû hunermendên sînemagerên Kurd Behmenê Qobadî û Hiner Selim min hezkir ku ez vê şernivîsa jorîn bikim navnîşana vê kurtenivîsê jibo ku bikaribim bersiva wan rojhilatnasên ku heqaret bi Kurdan kirine bidim û ji wan re bibêjim ku divê ew dersê ji gotina vî rojhilatnasê Rûs (mixabin navê wî nayê bira min) werbigrin ku dibêje „Kurd ew zêr e ku dibin deryayê de maye û kefza zemên biserde girtiye. Kijan dema ku tu wê kefzê jiser rakî, eyarê wî yê 21, wek stêrkê dibiriqe".

Mebesta rojhilatnasê Rûs ji vê gotinê ew e ku zîrekî û mêraniya Kurdan ya di dîrokê de diyar bike. Kijan demê derfet jibo Kurdan çêbibin ew dikarin di demeke kin de mohra xwe li berhemên navnetewî bixin. Herdû film (Kusî jî dikarin bifirin û Kilometer zero) delîlek berbiçavin jibo zîrekiya Kurdan û ya van herdû ciwanan. Her çiqasî temenê hunerê sînema di nava gelê Kurdistan de hîna di pêvajoya çarlepikan debe jî, ev herdû berhemên sinemaya Kurdî li Ewrûpa û cîhanê bûn sedema erdhejekê. Delîlê vê yekê jî ew e ku ev demeke dirêje piraniya dezgehên ragihandinê behsa van herdû filmên Kurdî dikin. Hinek ji wan dezgehên ragihandinê, li kêleka behskirina van herdû berhemên Kurdî, behsa jiyana Kurdan, stemkarî û çewisandina wan jî dikin. Gotinên ku Wezîrê Rewşenbîrî yê Fransa jibo hiner Selîm li Mihrîcana Cannes liber zemên kamerayan kirin nîşana vê yekê ne. Wezîrê Frensî jibo Hiner Selîm wiha got „welatê vî derhênerî ji aliyê çar dewletan ve hatiye dabeş kirin. Kilometer sifir jî dengê azara wan e". Eger di dirêjiya pêvajoya şoreşa me de çend dostekî me liderve hebûn, bi derbederbûna milyonan ya di sala 1991ê de me çendekî din jî pêde kirin ku piştevaniya daxwazên me bikin. Bi raya min, pêşkêşkirina van herdû filman ne kêmtirî bûyerên berî xwene û me gelek dost û heval di nava raya giştî ya navnetewî de qezenc kirin. Vê carê cîhanê rûçkê rastîn yê vî zêrî dît ku ev çend salin li beşekî ji Kurdistanê hilmeke azad dikşîne. Di demeke wiha kurt de afirandina berhemên ku bigihîjin asteya afirandinên wan dewletên ku hunerê sînema ligel wan bûye pîşesazî ne tiştekî kêm e. Hêviya gelek jiwan welatan herdemê ew bûye ku rojekê xwe bigihînin Mihrîcana Cannes.

PENABER

Fadil Özçelik



Ev pirtûka Dilbixin Dara di Adara 2005an de li Îstenbûlê ji aliyê Weşanên Elma hatiye weşandin û ji 16 çîrokan pêk tê. Redaksiyona berhemên bi Kurdî jibo me Kurdan her bûye êş û barekî giran. Ev pirsa ku tevî hemû hewldanan bi awayekî bi rêk û pêk nayê çareserkirin, di vê berhemê de bi giştî em dikarin bêjin ku çareser bûye. Di vê mijarê de hêjaye ku nivîskar û redaksiyona weşanxanê bê pîrozkirin.

Wek ku ji navê pirtûkê bixwe diyar e, nivîskar xwestiye di çîrokên xwe de kul û êşa penaberên Kurdan yên li Ewrûpa bîne ser zimên. Tenê çend heb çîrok ji dervî vê mijarê ne.

Dilbixwîn bixwe jî bi salane penaber e. Her çiqas serpêhatiyên xwe yên penabertiyê ji xwe re nekiribe mijar û di çîrokan de nehûnandibe jî; em dikarin bêjin ku di her çîrokekê de nivîskar bixwe heye, yan jî bi kêmasî mêvan e. Jiber vê yekê jî bi zanebûn behsa qehremanên xwe yên xwedî jiyanek trajîk dike.Hemû çîrok neynika jiyanên trajîk in. Kurdên li Kurdistanê ku yekser nebêçar in, jiber hêvî û heyalên "xoş" lê "boş" berê xwe didin xurbetê. Li diyarên ku kesî nas nakin tenê dimînin, mecbûr dimînin bi jinên di temenê diya xwe de bijîn, li "heima-kamp" bi salan bêbersîv, tî û birçî; bêpere û bêcigare dimînin; şevên wan dibin roj û rojên wan dibin şev û ev jî di şexsiyeta wan de tehrîbatên mezin çêdike. Dilbixwîn bi awayekî serkeftî radixe ber çavên me ku mirov livan deveran çawa diguhere û dibe yekî din; piştî çend salekî mirovekî li Ewrûpa dijî êdî ne ew kesê ku çend sal berê hatibû vir. Mirov bixêr û xirabiyên xwe, wek şexsiyetekî tê Ewrûpa, li penaberiyê şexsiyeta wî wek masiyekî jidest direve. Belê şexsiyeta ku bixwe re anîbû jidest direve, lê yeka din ku karibe têxe dewsa ya revîyayî jî nîne. Êdî ew şût û tazî li ortê maye; him ji dêrê him ji mizgeftê bûye.. Ew êdî mirovekî şikestiye!



Dara Dilbixwîn

Belkî yek ji taybetiyên herî balkêş yên penaberiyê pêwendî ne. Berevajî, li Kurdistanê, livan deran ne kes dikare li kesî biner e, ne wext heye ku wek berê "xwişk" û "bira" bin. Pere jî li van deran bêtir liber çavên mirovan şêrîn dibin. Penaberekî ku nû tê, belkî berî her tiştî di mijara "biratî" û "dostaniyê"de xeyalşikestî dibe. Bira û dostê zarokatiya wî ku dikarîbûn di ber hevdu de canê xwe feda bikin, rûyên xwe diguherin. Di çîroka "Rojên Penaberiyê" de tercuman dostaniyê wiha îfade dike: "Xeman nexwe bira, Ewrûpa ye, dost dibin xwê û dihelin".

Belê her çiqas Dilbixwîn di çîrokên xwe de jiyana mirovên têkçûyî bi me dide naskirin jî me tenê bi girî nake. Bi espriyên xwe yên di wexta xwe de hatine nivîsandin xwendevanan aciz nake û wan dikenîne. Di çîrokên xwe de nivîskar trajedî û komedî bi hevre hûnandiye; wan bi hêsanî dide xwendin, mijar wek çemekî diherike û bê ku xwendevan pê bihese bi dawî tê. Ev jî taybetiyek û serkeftinek wî ye.

Di çîrokên li Kurdistanê derbas dibin ligel rindî û dilpaqijiya Kurdên gundî; dirûtî û sixtekarî, qesîsî û çavnebariya wan jî bi hostatî radixe holê. Bê ku pesn bide yan rexne bike realîta civaka Kurd dide naskirin. Di çîroka "Bombeya Şêxmûsê Mêrdînî" de Şexmûs jibo ku alîkariyekê bide dezgehek Kurdî hezar çivikan dide xwe, pesnê xwe dide û Kurdên mayî bi xayintî û bêwijdaniyê tawanbar dike. Ev jî têra wî nake û jibo alîkariya ku daye, daxwaza bombekirina Pira Istanbûlê dike ku peyvek Freud tîne bîra mirov, "Wextê tu rastiyê jimin re dibêjî, çima derewan dikî!" Rastî di detayan de veşartiye; nivîskar ev rastî jiber çavên xwe bi dûr nexistiye û îhmal nekiriye.

Eşkereye ku Dilbixwîn di zarokatiya xwe de li malê, bi dê û bavê xwe re, bi xwişk û birayê xwe re, bi dotmam û pismamên xwe re, bi heval û hogirên xwe re bi Kurdî axivtiye. Wî çîrokên xwe bi Kurdî fikiriye û nivîsandiye. Ango bi zimanekî din nefikiriye û nenivîsandiye. Ev jî di warê fêrbûn an pêşdebirina zimanê Kurdî de dibe alîkariyek jibo xwendevanan.

Rastiyek me ya tahl e, ku di jiyana xwe de em mecbûr mane an me xwe mecbûr his kirine ku bi destekî çend zebeşan bigirin. Ger îmkan û derfetên Dilbixwîn hebûya ku xwe tenê liser çîrokan kûr û hûr bike, wê çîrokên gelekî baş pêşkêşî xwendevanan bikira.

Jinekolog, mêrekolog, dînekolog Prof. Doc. Dr.

Fatê Were Civatê



Şêxbat

Fatê xanim, min bihîstiye eşîra me kongra xwe lidarxistiye. Li gor agahdariyên ku gundiyê me ji min re got, herkesî meriv û nasên xwe anîne civîna eşîrê û civîn bi sergêjiyek serketî bi dawî hatiye.Herweha ligor fesadiya gundiyê me, heçê ku ne endamê eşîrê bûn jî ji xwe re di civînê de tizbiyên xwe "şeq-şeq" kirine. Ê gundiyê me digot "kuro ma ez û siyaset, ez çûm min go belkî hema îhale-mîhalek bidestmin keve û ez ji xwe re gepik nan bixwim haa! Ma ez şivanê xwedê çi ji eşir-meşîrê fêmdikim xwedêjêrazî!?" Îcar biserde digot "di civîna eşîrê de dengê dahol û zirnê hevdû ne-digirt û hinekan delîlo dilîzt û hinekan jî xurfanî". Min bixwe tiştek jê fêmnekir, gelo te çi fêmkir Fatê xanim?

Seyid Abdulkerafi / Kurdistan

Lao Seyido, kerafiyo, ji wî şivanê gundê xwe re bêje ma gelo îhale û dolar-molar stendin yan na. Heger sten-dibin, emê jî herin civînan û destê xwe rakin bavo! Ya Seyid El Kerafî, kuro tu ji ezbeta Pêxemberî, serê xwe bi dahol û zirnê neêşîne haa! Tu jî wek wan tizbiya xwe „bişeqşiqîne", qulallaweehed bixwîne û zêde nede dû îhale-mîhalan! Lao ligor îstîxbarata dewleta min a kûr, ne xwediyên daholê daholvan bûne û ne jî xwediyên zirnê zirnevan bûne. Erê dengê daholê jidûr de xweş tê, lê yê ku govendê dihejîne zirne û zirnevan e. Xuyaye zirnevanê eşîrê zêde pif nedaye zirnê û jiber wê jî dengê zirnê bûye wek dengê pîpîkê. Gava dengê zirnê bibe pîpîk jixwe wê dahol û zirne lihey nekin bavê min! Gava dengê dahol û zirnê jî nebin yek çi dibe? Dibe Rocken Rol, dibe Pop, dibe Samba, dibe Dîsko û jehr û ziqûm! Yanî dibe tirabêlka pez û garanê haa! Te fêmkir ya Seyid El Kerafî ibin Kurdistan!?

*

Fatê xanim, ez qurban! Ez kalekî 90 salî me. Mêrkê min ranabe. Jina min pênci salî jimin biçûktir e, yanî çil salî ye û hîna doza henek û laqirdiyan dike. Ez çûm ser gellek textorên Kurmancî lê tu dermanek ji mêrkê min re nedîtin. Ez nema zanim çi bikim. Ez ditirsim jinik bi dizî qaçaxî-maçaxiyan bike allahwekîl! Ez herroj hingivê Serhedê dixwim lê dîsa mêrik ranabe. Jibo xwedê Fatê xanim, ezê çi xweliyê li serê xwe kim û dermanekî ji vî bênamûsê mêrkê xwe re peyda bikim! Eman yeman, hêviya min maye Fatê û xwedê!

Hecî Silêmanê Serxwar / Serhedê

Ya rebbî ya îlahî, ez mame ji doxîn û şerwalê xelkê re weyyy! Heçê lê ranabe xwe tavê bextê Fatê, heçê lê radibe dîsa xwe tavê bextê Fatê, lê kes mala xwe xira-nake û rojek ji rojan jibo xêrê li halê Fatê napirse! Nabêjin ma gelo Fatê tiştekî dixwaze naxwaze, dilê wê dibije tarnetîtkan yan nabije, lê radibe yan ranabe! Wey topek li mala we keve rebbîî! Ya Hecî Silêmanê Serxwar efendî! Ciranekî min hebû, ew jî wek te mêrkê wî ranedibû. Viagra ceriband ranebû, Isotên Ruhayê ceriband ranebû, hingivê Serhedê ceriband ranebû, tirî û hejîrên Omerya ceriband ranebû, penîrê bi sîrik ê Hekkariyê ceriband ranebû, dimsa Entabê ceriband dîsa ranebû. Taliya talî wî jî wek te xwe avêt bextê Fatê. Lê bi serê te, min şîretek lê kir, min kir go xiyarê wî wek minara Stenbolê rep bibe loo! Te go ez wê şîretê li te jî bikim? Na bavê min na, ew ehmeqiya berê çûû! Perê xwe bide û dermanê xwe bistîne!

fate@peyama-kurd.com

Bersivên hejmara berê

Çeperast

1. Suxre / rîsk 2. Ir / cam 3. Rar / erdemî 4. Daxewe / dam 5. Eras / xursî 6. Laq / feîn 7. Ik / remo / ga 8. Atena / dil 9. Fîstanker 10. Aneî / îns 11. Nab / keft 12. It / qîr / nan

Serejêr

1. Serdemî / fanî 2. Aar / kaînat 3. Xirxal / tseb 4. Rr / esaretî 5. Ew / qena / sî 6. Crex / manî 7. Rad / ufo / knk 8. Imedre / desen 9. Masîgir / fa 10. Krîmînal / vtn



XAÇERÊZ

Serejêr 1. Serlêder, kesê serdana ciyekî dike / bi ruh, zindî 2. Ezbeta min, êla min / meriv, ne xerîb 3. Tewaş, dohn / bi mane, xwedî naverok, astengkirin 4. Ne me, lê.../ zingar, kurmîbûn, pas / nîşana milletekî 5. Milletek / kesname, referens, nama şexsî 6. Navejî Ewrûpî ê zilaman / xebat, berxwedan, pîkolî (paşûpê) / kurtegotina lira 7. Kesê îmzê tavêje, berpirsiyar / sade, net, xweser (paşûpê) 8. Aletek muzîkê / burh, ebrû 9. Nav, ûr, herêmek bedena însên / wek, ligor / sîtil an satila ji dar (paşûpê) 10. Mêr, zilam / sîlehek,çekek 11. Selamet, bi sebir, asayîş (paşûpê) / hazire, amade ye 12. Pêxemberek / dilşa, kêfxweşb, rûgeş.

Çeperast 1. Kevnedewletek Kurdî / jar, belengaz, zirav 2. Kul û keder girt, êş û jan 3. Îrade, Kesayet / navê mêşekê / notayek 4. Namûs, agir, xîret / navekî jinan / pê paleyî tê kirin, pê genim û ceh tê çinîn 5. Qirbûn, rabûn (paşûpê) / pê sûret û filîm tên kişandin.6. Nehatin, di cîh de / generalê deryayê (paşûpê) 7. Jina gewr, jina spehî / gotina qebûlnekirinê 8. Rojek / kesê yekemîn(paşûpê) / xezîna peran, pere lê kom dibin 9. Xwarinek / lebatek mirov, pê tê dîtin 10. Bibîranî, bilind kir (paşûpê) / rûdank, maske 11. Li Swîsreyê navê çemekî / zanîn, xwendin (paşûpê) / du tîpên „ belavok"ê 12. Sertîpên „reş û spî" / azadî, bi kesî ve ne girêdayî, bi serê xwe

Remildank

Beran (21.03-20.04)
Hin pirsgirêk peydadibin lê hûnê ji wan xilasbin. Li xwe û tenduristiya xwe miqatebin.

Gamêş (21.04-20.05)
Riya evînê vekiriye. Navbera xwe û hezkiriyê/ya xwe xiranekin. Jiyan bê evîn nabe.

Cêwî (21.05-21.06)
Hûn di nava sergêji û aloziyekê de ne. Berî hûn kareki bikin, baş bifikirin û biryarê bidin.

Kevjal (22.06-22.07)
Di evîn, kar û tenduristiya we de tevlîheviyek dixuye. Lê aramî her pirsgirêkê çareser dike.

Şêr (23.07-22.08)
Haya we ji derûdora we hebe. Gelek caran hevalên herî nêzik jî dirûtiyê dikin. Haydar bin.

Simbil (23.08-22.09)
Hefteyek baş û bixêr e. Navbera we û malbata we xweştir dibe. Li aboriya xwe miqatebin.

Mêzên (23.09-22.10)
Di warê aborî de hûn xwedî siûd in. Tekiliya xwe ji derûdorê qutnekin û hay jî xwe hebin.

Dûpişk (23.10-21.11)
Ji bo we hefteyek bi zehmet e. Destê xwe li perê xwe bigrin. Hefteyek afirmendî ye.

Kevan (22.11-21.12)
Hûnê hineki din navdar bibin. Dev ji sistî û teraliyê berdin û bidin dû projeya xwe a berê.

Kovî (22.12-19.01)
Hin pirsgirêkên we hene. Heta ji we tê ji heval û hogirên xwe alikariyê bistînin, tenê neminin.

Satil (20.01-18.02)
Hinek nûçe karin moralê we xira-bikin. Di warê aboriyê de mizginiyên xêrê hene. Bi aram bin.

Masî (19.02-20.03)
Hûn di demekê kritîk dene, bi awayekî baş bifikirin û xwe ji vê rewşa aloz xilasbikin.

www.kurdi.org



Navend:
Trink-Zel (Köln)
Tel.:0221 376 24 05

Bayiyên Zelal

AKCAN GmbH (HAMBURG)
Tel.: 040 723 402 96

LIZA GmbH (BERLIN)
Tel.: 030 390 380 30

ESD Softdrink GmbH (MANNHEIM)
Tel.: 0621 318 76 70

TRINK-ZEL II (DÜSSELDORF)
Tel.: 0211 49 62 150

CAN GETRÄNKE (ESSEN)
Tel.: 0201 289 74 17-18

TRINK-SEM (DORTMUND)
Tel.: 0231 981 86 23

HARRAN GmbH (FELLBACH)
Tel.: 0711 592 08 64

CHAPLIN GETRÄNKE (BREMEN)
Tel.: 0421 691 96 78

EURO-FRESH-FOOD GbR (ERFURT)
Tel.: 0361 26 27 516

TRINK-ZELI (KÖLN)
Tel.: 0221 977 63 11

NERGIZ
Tel.: 02562 22 168



Vegera xweristê

Gulê Kaya – Bochum

Dirûşmeya demsala (mewsim) modeya li pêşiya me ev
Diyar e ku modeva
bin bandora rojavaya
hov (wehşî) peravên
Afrika û deştên Meksîka
de mane. Rengên modeya îsal ji tonên rengên erdê (xakî) heta şîniya ezmên cûr bi cûr û dewlemend in. Hikumdariya meylên xwezayî, etnîk û folklorîk di modeya îsal de dom dike. Etekên dirêj û fireh ên Cengeneyan (Romaniyan) botên cowboyî, xişrên gir (girs) ên etnîkî û kabi kên bilind û qalin terza girêdana îsal in.
Keçikên cowboy bi hîppiyên Efrîkî re digihêje hevdu
Etekên dirêj, blûzên bi milên şevşevok, kemerên bi kevirên qalind, cilên tenîk wê îsal li herderê derkevin pêşiya me.
Ligel etekên Cengeneyan etekên qermiçî jî îsal di nav cilên jêneger de ye.
Wiha diyare ku modeya xwezayî bandora xwe li ser materîalan jî kiriye. Qumaşê pembo û keten bêtir bikar tên anîn. Wek temamker ji xişrên gir (girs) û şalgirêdanê dixemilîne. Hûnandî jî îsal mode ye. Mesela fanêrên qebe û fireh hatine hûnandin, panco û sal.

www.arsiv.kurdi.org

تیپی فوتبۆڵی کوردستان بە ٣ گۆڵ لە تیپی لایزبێرگی ڤیەننای بردەوە

کامەران ئەحمەد سلێمان - ڤیەننا- نەمسا - رۆژی شەممە(٥/٢٨)، لەڤیەننای پایتەخت، یەکەم یاری خولی کاسی نەمسا لە نێوان تیپی فوتبۆڵی کوردستان و تیپی فوتبۆڵی لایزبێرگ دەستی پێکرد.

لەمینانەی سەدرانێکماندا بۆ سەیرکردنی یارێکە، بینیمان ئاستی تیپی فوتبۆڵی کوردستان لەئاستێکی زۆر باشدایە، لە یەکەم گێمی یارێکەدا تیپی کوردستان دووگۆڵی بۆخۆی تۆمار کرد، هەروەها لە گێمی دووەمی یارییەکەدا، گۆڵی سێیەمیش بۆ کوردستان تۆمارکرا. یارێکە ٣ بە ٠ سفر و بە بردنەوەی تیپی فوتبۆڵی کوردستان کۆتایی پێهات.

تیپی فوتبۆڵی کوردستان ماوەی ساڵێکە لە ڤیەننای پایتەختی نەمسا لەلایەن ژمارەیەک لاوی خوێندەرمی هەرچوار پارچەی کوردستانەوە بەسەرپەرشتی بەڕێز سەلیم ئەترۆشی دامەزراوە.

راهێنەری تیپەکە بەڕێز عەتا مەحمود گوتی: لەسەرەتای ساڵەکانی ٩٠وە تیپێکی لەو جۆرەمان دامەزراند، بەڵام ئەوکاتە بەهۆی گواستنەمەوە بۆ شارێکی تر نەمان توانی بەردەوامبین. لەدرێژەی قسەکانیدا گووتی: لەماوەی رابردووشدا تیپی فوتبۆڵی کوردستان لە خولی یانەکانی نەمسادا توانی ئاستی پلە سێیەم بەدەستبهێنێت. راهێنەری تیپەکە گوتی: زۆر دڵخۆشیم بەوەی کە ئەو ژمارە لاوە کوردە بەوشێوازە هاوکاری لەنێوانیاندا هەیە و هیوای خواست لەو خولەدا ئاستێکی زۆر باش بەدەست بهێنن.



بەڕێز سەلیم ئەتروشی-یش سەرۆکی تیپەکە گوتی: تیپی فوتبۆڵی کوردستان بەرەسمی ناوی لە یەکێتی فوتبۆڵی نەمسا تۆمارکراوە. ■■■

پێشانگای هونەرمەندی کورد دارا ئارام



رۆژی ٢٠٠٥/٥/٢٧ تا رۆژی ٢٠٠٥/٦/٩ هونەرمەند "دارا ئارام" پێشانگای تایبەتی لە گەلەری " **Praxsis** " لە شاری " **Toronto** " لە ولاتی کەنەدا، دەکاتەوە. هونەرمەند لەدایکبووی شاری سلێمانییە و، لە ساڵی ١٩٨٥دا پەیمانگای هونەرە جوانەکانی سلێمانی بەشی شێوەکاریی تەواوکردووە. هونەرمەند "دارا ئارام" خاوەنی ئەزموونێکی هونەری بەرفراوانە لە هونەری شیوەکاریدا، بە تێپەڕبوونی ئەم چەند ساڵانەی رابردووی کە لە ساڵی "١٩٨٨"ەوە لە کەنەدا نیشتەجێ بووە و کاری هونەری بەردەوامە، بەرهەمە هونەرییەکانیشی زۆرن و چ لە پێشانگای بە کۆمەڵ یان تایبەتی، لە کوردستان یان لە وڵاتانی دەرەوە، وەک سوریا و کەنەدا، ئەڵمانیا، بەریتانیا، سوید، یابان، دانیمارک، هۆڵەندا پێشکەش کراوون، هونەرمەند زۆر چالاکانە لە تاقیکردنەوەیەکی بەرفراوانی کاری هونەری شێوەکاری ئەبستراکت و جوولە و سەمای ڕەنگ کە ئازادییەکی تەواو لە کارەکانیدا هەیە، خۆشەویستی بۆ سرووشت و مرۆڤ لە کارەکانی "هونەرمەند دارا ئارام" دا دەبینرێت. بە بۆچوونی هونەرمەند لەم پێشانگایەدا، زیاتر گەڕانەوەی خەیاڵی منداڵییە، لەم قۆناغەدا ڕەنگەکان بە شیوەیەکی کۆنتراس و زەوق و دەروونی ڕەنگە کوردییەکان بەدی دەکرێن و پێوەندییان بە ژیان و ژینگەوە هەیە. ■■■

شای جوانی ساڵی ٢٠٠٥ کچێکی کەنەدییە



لە نێوان٨١ کێژۆڵەی جوانی سەرانسەری جیهاندا، خاتوو ناتالی گلیبوفا بە شای جوانی ساڵی ٢٠٠٥ هەڵبژێردرا. ئێ و ڕەسمی هەڵبژاردنی شای جوانی ساڵی ٢٠٠٥ کە لە بانکوکی بایتەختی تایلاند بەڕێوەچوو، سەرەنجام لە ڕۆژی سێ شەممەی رابردوودا "ناتالی گلیبوفا"ی تەمەن٢٣ساڵ لە میانەی ئاهەنگێک کە بۆ پتر لە ١٧٠ولات گوازرایەوە و سەرەک وەزیرانی تایلاند چاودێریکرد، دەست نیشانکرا و تاجی جوانی خرایە سەر. تایلاند کە پتر لە٦/٥ملیۆن دۆلاری بۆ ڕاپەڕاندنی ئەم بۆنەیە خەرج کرد،بە پێی بڕچوونی زۆربەی چاودێران گرتنە ئەستۆی گێڕانی ئەم بۆنە جیهانییە لەلایەن ئەو وڵاتەوە، تەنها بۆ مەبەستی ئەوە بوو کە سەر لە نوێ سەرنجی گەشتیاران رابکێشرێتەوە بۆ سەردانی تایلاند، چونکە لە دوای کارەساتی "تسونامی" تایلاند زیانێکی ئابووری گەورەی لێکەوت و گەشتیاران کەمتر سەردانی دەکەن. جێ ئاماژە پێدانە کە بەشداربووانی ئاهەنگەکە بۆ ماوەی خوولەکێک وەستان بۆ ڕێز لێنان لە گیان و یادی قوربانییەکانی کارەساتی تسونامی. ■■■

حوسێنم نەکوشتوە!

زەدشت خورمالی

زۆرن ئەو قسە و توانجانەی کە خەڵکی سلێمانی وتیان یان هەڵیان بەست کاتێک لە ناکاو"حوسەینییەی حەکیم" لە ناو جەرگەی شاری هەڵمەت و قوربانیدا قوت بووەوە. بەڵام هیچیان نەگەیشتنە ئاستی ئەم قسە خوشەی کە کوڕێکی باشی سلێمانی سەبارەت بەو "حوسەینییە" وتوویەتی. ئەو کوڕی باشە دەڵێت، ئەوە کات کاتی گەمارۆی ئابووریی و هێشتا سەرۆک"زێڕەکەمان" ماوە و، گرانی یەخەی خەڵکی کوردستانی بە گشتی و سلێمانی بەتایبەتی گرتووە. خەڵکی لەو کاتەدا"بە قسەی ئەو برادەرە" ئەگەر سەگ تڕی لێ بدایە کۆشیان دەگرتەوە نەک شتێکی باشی تێدا بوایە. هەر لەو کاتەدا، لە ناو شاری سلێمانیدا پڕ و پاگەندەیەک بڵاوبووەوە، وتیان ئاغای "حوجەتولئیسلام جەنەتییان" تەشریفی هێناوە بۆ شارە حەیاتەکە و نیازێتی خەیر و خەیراتێک بە برا" شیعە"کانی سلێمانی لە ناو حوسەینییەکەی حەکیمدا بدات! بەهەر حاڵ ژمارەیەکی زۆر لە هێزی "ئار ئار" و"سەلاجە و موجەمیدە" لە شانەکان خزیان گەیاندە "حوسەینییەی حەکیم"ی شاری سلێمانی و پێیان وابوو کە خۆ کردن بە "شیعە" بۆ چەند ساتێک کارێکی ئەوەندە خراپ نییە، ئێ خۆ نە کەسیان کوشتووە و نە مااڵی هیچ موسڵمانێکیان برێوە. هەرچۆنێک بێت ژمارەیەک لەو شیعە"تەزویرانە" خزیان گەیاندە حوسەینییەکە و لەوێ لەگەڵ حەشامەتێکی زۆری شیعەی شاری سلێمانی دانیشتن و کەوتنە بۆرە بۆڕی گریان بێ ئەوەی بزانن مەسەلە چییە، بەڵام چونکە کارەکە چەورە و شتێکی تیایە، ئەوا چ عەیبی نییە"هەوڵێری وتەنی". کات بەسەرچوو، لەپڕ سەڵاوات لە دیاری پێغەمبەر لێ درا. شوکر ئەوا "حوجەتولئیسلام جەنەتییان" تەشریفی موبارەکی هێنا، هەرچۆنێک بێت"بە قسەی ئەو برادەرە نەک من" ئەم لە "ئاغای مەتربیان" یادی بە خێر نەبێت باشترە. هیچ نەبێت ئەم فشە فشی باران هێنانمان بۆ ناکات. ئەوەتا عەباکەی بەری لاربۆتەوە لەبەر قورسایی رزقی خوا. لەم هات و هوریایەدا، رێزدار جەنەتییان کەوتە زەردەخەنە دابەشکردن و پاشان لە یەکەم شیعەی"تەزویری"پرسی؛ تۆ شیعەیت؟ تەزویرەکە خێرا وەڵامی دایەوە: بە سەری تۆ ئەرەوەڵا! داماوە تەزویرەکە دڵی خۆش بوو، چونکە وایزانی ئێتر بۆ خۆی کۆش دەگرێتەوە و خێر و خەیرات وەردەگرێت. کەچی کاکی جەنەتییان کۆڵی نەدا و پرسیارێکی تری لێکرد: باشە کێ حوسەینی کوشت؟ برای تەزویر لەگەڵ خۆیدا وتی"بەخوا کارەکە وا بەرەو قۆڕی دەڕوات" هەر بۆیە دەست بەجێ وەڵامی دایەوە: بە خوا حاجی ئاغا برات نە بەعسی بووە و نەخزمەتی سەربازی کردووە و حەز دەکەیت کراسی قورئان لەبەر دەکەم سوێندت بۆ دەخۆم کە نەک حوسەینم نەکوشتووە، بەڵکو بەسەری تۆش هەر نەمناسیوە! ■■■

بەکوردی بدوێ، بەکوردی بخوێنە،
بەکوردی بنووسە، بەکوردی بیربکەرەوە!







„Min xwe li derve bêhtir nas kir“

Peyama Kurd: ***Dema mirov paşnavê te dibîne, mirov difikire tu Soreklî ye lê wisa diyare ku tu ji Kobanê ye, tu dikarî vê yekê ji me re zelal bikî?***

Şahînê Bekirê Soreklî: Bavê min di ciwaniya xwe de ji Sîweregê derbasî binxetê bûye û li wir bi cî bûye. Bavê min bi eslê xwe Zaza ye û ji Sîweregê ye. Ez bixwe li devera Kobanê ji dayik bûme û li wir mezin bûme. Di nava Kurdên binxetê de xelk malbata me weke „malbata Soreklî“ dinase.

Gelo tu dikarî bi zaravayê Zazakî biaxivî?

Weke tê zanîn xelkê Deşta Sirûcê û Kobanî hemû Kurmanc in. Dayika min jî Kurmanc e û bavê min jî li wir dest pê kiriye bi Kurmancî axaftiye. Lê dema ku mirovên me ji Sîweregê dihatin, li mala me êdî bi zazakî dihat axaftin. Dema ez zarok bûm, min dikarîbû hinekî biaxivim, lê niha kêm gotin di bîra min de man e. Zimanê min yê zikmakî zaravayê Kurmancî ye.

Yanî te bixwe Sîwereg nediti ye.

Ez tê re derbas bû me, çûme Rûhayê, çûme Diyarbekir lê ez neçûme nava Sîweregê.

Tu di kîjan salê de û ji ber çi derketî derveyî welêt?

Di dawiya sala 1965an de, di 19 saliya xwe de ez bi armanca xwendinê bilind derketim derve. Destpêkê ez li Vîyena mam û piştre jî min demekê li zanîngeha Munchen xwend. Di dawiya sala 1968an de, bi sedema kêşeyên a-borî ez ji Almanya derketim. Min nikarîbû ez li welat jî vegerim ji ber ku wê demê navê min di rojnameyeke Sûrî de hatibû nivîsandin û rewşa siyasî hinekî dijwar bûbû. Ne ku min xebateke siyasî kiribû, lê em xwendekarên Kurd wê demê li hev kom dibûn û me behsa hinek tiştan dikir. Di dawiya sala 1968an de ez çûm li Australya bi cih bûm. Ji wê demê û vir ve ez dikarim bibêjim ku ez bi piranî li Australya bajarê Sydney rûniştime.

Dema tu çûyî Australya hejmara Kurdan li wir çiqas bû û rewşa wan çawa bû?

Dema ku ez di dawiya sala 1968an de çûme Australya, min ew welat heta wê demê di xewnan de jî nedîtibû. Min li wir kesek nas nedikir û haya min ji hebûna civateke Kurdî jî tune bû. Di nîvê duyem yên salên 70an de min hinek malbatên Kurdên Bakurê Kurdistanê dîtin. Piştre sal bi salê endamên civata Kurdî zêdetir bûn. Ez bixwe texmîn dikim ku li tevayê Australya li derdora 10 hezar Kurd hebin.

Ev demeke dirêje tu ji welat derketiye. Li cihekî weke Australyayê dûr te dest ji zimanê xwe bernedaye û tu her ew daye pêş. Ev ne zehmet e gelo?

Ev nêzîkî 40 salî ye ku ez ji welêt derketim e. Bê guman şexsiyeta min li welêt hatibû hêvankirin. Min xwe wekî Kurdekî dinasî. Lê ez dikarim bibêjim ku bi rastî min xwe li derve bêhtir nas kir. Rast e li welat me dizanibû em Kurd in û stemkarî li me dibe lê dema min li derve, li welatekî mîna Australya dît ku her komeke etnîk xwediyê mafên xwe ye, ez bêhtir bi rewşa xwe hisiyam. Dîploma min jî girêdayî edebiyatê bû. Dema min berhemên edebî yên nivîskarên Alman dixwendin, weke Kafka, Bertol Brech, Heinrich Böll, Gunter Grass û gelekên din, ez pê hesiyam bê çawa berhemên edebî dikarin bandoreke mezin di guhertina civatan de bikin. Her wiha ez pê hesiyam ku edebiyata me li gora edebiyata cîhanî li paş maye. Her wiha dûrbûna ji welat jî bandoreke mezin li mirov dike. Piştre di dawiya salên 70î, di destpêka salên 80î de gelek kovar û rojnameyên Kurdî ji Swêd û Almanya gihîştin ber destê min. Min berhemên Celadet Bedirxan yên Kamîran Bedirxan û hinek berhemên Hawar bidestxistin. Hinek berhemên Cegerxwîn ketin destê min. Min Kurdiya xwe ya nivîskî li derve li pêş xist. Xwendina min ya li zanîngehê, danûstendina min li gel xelkê Australî, xebata min ya mamostetiyê li gel Wezareta Perwerdê ya Australya jî bandor li min kirin. Piştre min gelek Kurdên Soran naskirin. Li welatekî mîna Australya min Soraniya xwe hem di aliyê axaftinê de, hem di aliyê nivîsandinê de bi pêş de bir. Li xerîbiyê jî mirov dikare mînî civateke Kurdî bibîne. Her wiha min xwe li hemberî bav û dayka xwe deyndar didît ku wan ez rêkiribûm derve ji bo ku bixwînim bi min serbilind bibin û vegerim xizmetekê ji bo wan bikim. Wekî hestekî tawanê li cem min peyda bû. Ez li welat venegeriyam. Min xwest ez vî deynî bi şêweyeke din vegerînim. Min dest bi nivîsandinê kir û berhemên min ji aliyê gelek kesan ve balkêş hatin dîtin. Ez herdemê dibêjim, heger ez ne



Rast e li welat me dizanibû em Kurd in û stemkarî li me dibe lê dema min li derve, li welatekî mîna Australya dît ku her komeke etnîk xwediyê mafên xwe ye, ez bêhtir bi rewşa xwe hisiyam.

www.kurdiyakurd.com

Kurdbûma jî, min ew stemkariya li ser wan hest bikra, minê ji ber sedemên mirovî piştgiriya wan bikra. Ez dizanim ku gelê Kurd yek ji wan gelan e ku bi şêweyeke herî dijwar neheqî lê bûye, stemkarî lê bûye, bê maf maye û bi salan dewletan bi şêweyeke ne durust ew bi cîhanê dane nasîn. Ez hewl didim bi qasî derfetên xwe tiştekî ji bo Kurdan bikim.

Tu dûrbûna xwe ji bo xwe weke bê şensiyekê dibînî an na?

Ez nizanim çawa ye, ji aliyekî ve ez xwe çakbext dibînim ku ez li welatekî weke Australya bi cîh bûm. Di şêweya jiyanê de ez gelekî ji Ewrûpa hez dikim. Eger îmkanên min hebana bi rastî Austurya yan Almanya ji bo min hêvîyeke. Ez bixwe ji ziman û çanda Almanî gelekî hez dikim. Ez niha Ingilîzî ji Almanî baştir dizanim, lê ez pir ji zimanê Almanî hez dikim. Di aliyê psîkolojîk de xwe li Australya rehettir dibînim. Li wir kesek nikare ji min re bibêje tu biyanî yî. Australya welatekî pir nû ye, tevayê dîroka Australya 200 sal in. Ev bûn 104 sal ku Federasyona Australî heye. Dema mirov li wî welatî be, zimanê xwe yê inglîzî bi pêş ve bibe û di proseya siyasî ya wî welatî de karê xwe bike, mirov xwe wekî hevwelatiyekî tevayî dihesibîne.

Min xwendina xwe li wir temam kiriye, ez li wir zewicî me, zarok li wir çêbûne û mezin bûne. Ji ber vê yekê ez xwe çakbext dihesibînim ku ev derfet bi dest min ket û min dikarîbû ez xwe bigihînim vê radeyê. Lê li aliyê din, ez hinek caran pê diêşim ku ez hevqasî dûrîdest im. Bi firokeke baş mirov di 24 seetan de xwe digihîne Ewrûpa. Wek nivîskar jî, ji bo ku mirov bikaribe rastiyê binivisînî dive mirov bi awayekî raste rast jan û êşa gelê xwe bibînî û pê bihisî. Divê mirov bi xelkê xwe re bikene û bi wan re bigîre. Di vî alî de helbet mirov hinekî diêşe. Her wiha mirov ji malbat, dost û hevalên xwe jî dûr e. Hinek hevalên min yên pir nêzîk hene, lê hevaltiya me bi riya bihîstina deng e, bi telefona ye. Mirov bi vê yekê diêşe lê ez xwe bê şens nabînim.

Me nav û dengê Şahînê Bekirê Soreklî bi piranî bi riya radio bihîst. We çawa ew radio bidest xist, tu dikarî ji me re hinekî behsa dîroka wê bikî?

Min di sala 1982an de dest bi yekem bernameya Kurdî kir. Navê dezgehê TSTR bû. Me hefteyê nîv seetek weşan dikir, 15 deqîqe bi Ingilîzî û 15 deqîqe bi Kurdî bûn. Me bi pereyan ew maf werdigirt. Di sala 1985an de li pey hewldaneke mezin, me di radyoya TEA de fersendek bidest xist. Hinek aliyên ne Australî hebûn nedixwestin em wî mafî wergirin. Destpêkê hefteyê nîvseetê mafê weşanê dane me û piştre kirin 45 deqîqe. Piştî demekê navê dezgehê hat guhertin û bû SBS (Dezgeha Taybet ya Ragihandinê). Ev dezgeheke fermî ye û ji aliyê Hikûmeta Federal ve tê xwedî kirin. Di vê dezgehê de bernameyên radyo bi 68 zimanan têne pêşkêş kirin. Bernameya Kurdî yek ji wan bernameya ye. Ev dezgeh li gora hejmara axaftvanên zimanekî bernameyan dide. Li Australya her pênc salan carekê jêpirsînek çêdibe. Di wê jêpirsînê de gelek pirs hene, du pirs ji wan wiha ne: paşerehên te yên etnîkî çi ne û tu di mala xwe de bi kîjan zimanî diaxifî? Di jêpirsîna dawî de li derdora 5 hezar kesî gotibûn ku ew di mala xwe de bi Kurdî diaxivin. Ev hejmareke kêm e, gelek egerên wê hene ku ez li vir naxwazim tevan bibêjim. Li gora wê hejmarê, di heftiyê de mafê me heye em seetekê weşanê bikin. Radyoya me li bajarê Sydney, Melbourn û derdorên wan tê guhdarîkirin. Ev demeke bernameya me bi riya internetê jî dikare were bihîstin.



Şahînê Bekirê Soreklî

Şahînê Bekirê Soreklî li gora nasnameya xwe di sala 1946an de li gundê Mezrê yê girêdayî Kobanî hatiye dinyayê. Ew di nava jiyaneke Kurdî û Kurdistanî de mezin bûye. Wî xwendina xwe ya seretayî li Kobanê û lîse jî li Helebê temam kiriye. Di sala 1965an de derketiye derveyî welat û li Vîyena (Austurya) dest bi xwendina zimanê Almanî kiriye. Wî her wiha li Zanîngeha Munichê semesterek bi serî kiriye û di sala 1968an de dest ji Almanya berdaye û li Australya bi cî bû ye. Di sala 1971ê de li gel xanimeke Australî zewicî ye. Du kurên wî bi navê Che û şan hene. Di sala 1974an de li Australya li zanîngehê dest bi xwendinê kiriye û xwendina xwe di dawiya sala 1977an de temam kiriye. Ew li gel Wezareta Perwerdeyê ta dawiya sala 2004an xebitiye. Ji destpêka salên 80î ve kurteçîrok û gotarên wî di kovar û rojnameyan de belav dibin.
Berhemên wî: Çîroka Azadbûna Mehmet Karataş, Namûsa Êmo (pirtûka kurteçîrokan), şanoya Mehkemekirina Seleheddînê Eyûbî, romana Wendabûn, Jana 7 salan (helbest) Wergerandina Pirtûka Heinrich Boll (Şerefa wendabûyî ya Katerîna Blum) Pisîk jî xewnan dibînin (kurteçîrok).

Li gora hejmara civata Kurdan ya li Australya hejmara mirovên ku xwe bi karê nivîsandinê re mijûl dikin kêm e. Sedema vê yekê çi ye?

Li Australya civata Kurdî civateke serkeftî ye. Wan ji destpêkê ve hevdû girtine. Tucaran kêşeyên mezin di nava Kurdên Australya de derneketine. Di warê xebata Kurdewariyê de Kurdên Australya ji Kurdên din yên li derve kêmtir nekirine. Lê ji ber ku dûr in, rojname û kovarên wan tune ne, mirov bi xebata wan nahise. Piştî sala 1991ê bi sedan Kurdên Soran hatin. Pêwendiyên me li gel tevan hene. Gelek kesên rewşenbîr jî hene. Mehê carekê du caran semînar û civînan li dar dixin. Hewl dan ku rojnameyeke Kurdî jî derxînin, lê mixabin derfet tune bûn. Di nava Kurmancan de Riza Çolpan heye ku xwe bi karê nivîsandinê re mijûl dike. Çend berhemên wî hene û hîna jî ew her berdewam dinivîsîne. Çend kesên din jî hene lê ji ber dûrbûnê dengê wan pir nayê bihîstin.

Tu hobiyên te yên taybetî hene?

Wextê min çênebûye ku ez xwe bi hobiyan re mijûl bikim. Ez di dawiya 2004an de ji karê xwe yê Wezareta Perwerdê derketim e. Gelek dost û hevalên min ditirsin ku ez jî weke hinekan di nava xwe de melûl bibim û biçim. Ji min re dibêjin „dest ji kar bernede tu hîna dikarî kar bikî, tê wekî din çi bikî"?. Lê ev 6 meh in ez teqawît bûme û ez hîna pê nehesiyame ku ez bêkar im. Ez rojê çar-pênc seetan li ser kompiturê derbas dikim. Dema ku ez xwe bi hobiyan re mijûl dikim, hestên tawanê li gel min çêdibin û dibêjim „min îro tiştek nekir". Li mal jî carcaran dema ez dixwazim qehweyekê vexwim, ez dibêjim „berî tu qehweyê vexwî rabe çend rêzan binivisîne ku tu misteheq bî". Ez hez dikim, di wextê vala de hinekî li gel Robîn derkevim bi otomobîlê bigerim. Ez gelekî bi kêfxweşî dimeşim. Rojê bi kêmanî ez du seetan dimeşim. Ez ji temaşekirina filmên baş û guhdarkirina muzîkê hez dikim û pirtûkan dixwînim.



Selim Çürükkaya

Herî Zuexpa nêweşo

Nizdiye dewê ma de yew dew esta, namê yê Zuexpa ya.

Banî dew qilan seri de bi. Rayir makîna çiniyeb. Elektrik, telefon hama nêşib dew.

Wext ke ez hama qicibiya, o wext qunculcî bî. Di - hîrê heb memûrî dewlet ûmenî dewan de gêrênî. Nê quncilciyan heywanî dewijan hûmaritiyen û semedî her heywana di qaxit pere girotiyen.

Dewijî qeyil nêbî peran bidî hukmat. Dewijan wext ke xeber girotiyen quncilcî hê yenî, înan heywanî xo berdiyen, nimitiyen.

Vûnî yew roj Zuexpayijan xeber girot ke quncilcî ho yeno dew. Înan ca de heywanî xo berdî nimitî.

Xal Eli vêciyeno hewlî ser. O ho ûniyeno rayir quncilcî ra. Wext ke quncilcî dew ra beno nêzdî. Herî Xal Elî berî ver de zireno.

Xal Eli ca de hewlî ser ra yeno war, sarişmê herî xo tepişeno, beno zerrê eywan.

O yew ca keno ra, herî fîneno miyan û pê yew la ya ey besteno, yew lehef qalin ûnceno herî ser.

Quncilcî dew ra gêreno, yeno keye Xal Eli. O şino yew kulsî ser de nişeno rue.

Xal Eli çay keno germin, dûno ci.

Quncilcî çayê xo fir keno. O ûniyeno ke ortê eywan de yew ho rakote.

O pers keno, vûno:

No nêweş kam o? Nêweşiye ey çineya?

Xal Eli vûno:

O babî min o, qariş pê mebiyen, o zaf nêweş o.

Quncilcî vûno:

De verd ez biewnî ci, cey adir ey est.

Quncilcî cey xo ra wirzeno we, şino lehef keno berz, ewniyeno herî ra.

O gêreno a ewnîyeno Xal Eli ra , wird piya zi zaf şarmiyenî

Kombiyayisî HAK-PAR rûmenî



PK - Kombiyayişanî Anqere, Mêrsîn û Diyarbekir a pey HAK-PAR îstanbûl de zi yew kombiyayiş viraşt. Sey ê kombiyayişanî bînan temayî kombiyayişî Îstanbul zi persa federsyon û bedilnayişî bernama û nîzamnamê partî bi

HAK-PAR hefteko viyert Îstanbol de avahîyê Weqfa Kurdî de kombiyayişî xo viraşt.

No kombiyayiş de zi cagiroteyanî serekî partî ra Qasim Ergun û Fehmî Demîr pê namê partî qisêkerd. Qisêkerdoxan ard ziwan ke bi federasyon him persa kurdî eşkena biyero çarekerdiş him zi tirkiye demokratîze bena

Misafiran ra zi zafîn qal kerd û semedî federasyona paştgirotişî xo nîşan da.

Yew hefte cuwa ver zi îdareciyanî HAK-PAR Ankara de mehkima de bi kurdî îfade dabi. Dozgeran mecbur semedî înana tercuman ardibî mehkima.

Semed ke HAK-PAR dawetnamê xo yê semdî kongreya 4î Çile 2004 bi kurdî nuştib û çend îdarekerdoxanî HAK-PAR na kongre de bi kurdî qisêkerdib. No rid ra verba HAK-PAR dewayî girotiş bî a.

Îstanbul û Meletî de şewî paştgirotişî Çewlîg viraziyay



PK/Meletî - Hefteku viyert Meletî (BINYAD) û Îstanbul (BINYAD) semedî paştgirotişî Çewlîgijana ciya - ciya di şenahî organîze kerdî.

Meletî de BINYAD yew şew viarşt. Na şew de hendê 1000 Çewlîgijî hedre bi. Hunermendanî Çewlîgijan ra Seîd Altûn û Avnî Polat îta de veciyay sehne. Hûnc Çewlîg ra komê govend zi bi govendê Çewlîg reng da şew.

Îstanbûl de zi BINYAD roja Şeme yew şewê kulturî kerd hedre. Serekî belediya Çewlîg Haci Ketenalp zi na Şew de ca girot. Haci Ketenalp semedî hizmetî ey ya yew plakat da serekî BIN YAD Îlhan Sevîn.

Hunermend Kenan Kaplanseren bi deyranî xo ê kirdkiya misafir coş kerdî. Komê folklor ê BINYAD zi govendê Çewlîg peşkeşî Çewlîgijan kerd. Penî de hunermend Murat Xildiz tirkî û kurdî deyrî pêşkeşî misafiran kerdî.



Kilmxeber

Hamburg de şewê Sarcon viraziyay



P.K – Hamburg- 29î Gûlan de bajarî almanya hamburg de „Komelê paştgirotişî Sarcon“ yew şahiyê kulturî viraşt.

Sarcon û dewanî cîrananî Sarcon re hendê 800 kes na şenayî de hedre bi. Şewê Sarcon bi qisêkerdişî serekî komel Hespî Aydin dest ci kerd. H.Aydin kirdkî, tirkî û almankî qisêkerd. Ey qisêkerdişî xo de armanc û gayê ruenayişî „Komelê paştgirotişî Sarcon“ ard ziwan û dîqatî misafiran ûnt verberdişî ziwanî ma, xerîbê de tekîliya bênatê şarî ma, ser.

Serekî komel îta de behsê projeyanî komel ke semedî verdberdişî kirdkî ya amê hedre kerdiş, kerd û may û pî qican re ardim waşt.

Ebuqat Osman Aydin zi na şenayî qisêkerd. Osman Aydin qalê Sarconijanî vêrînan kerd û înan ser çend meslê vay. Nê meselan zaf kêf misafiran ard.

Endamanî komel ra Şukru kaya zi tarîx Sarcon ser agahdarî da misafiran.

Hozan Rêzan, Rodî, Zozan û taye hozanî Sarconijan zi bi deyranî xo ê kirdî û kurmanciya reng da na şenayî. Sey her şewê kurdan na şew de zi misafiran mirdê xo govend girot.

Rayirî û Kuekî



Amed - Hunermendî kurd Mahmut Celayir Amed de bi name “ Rayirî û Kuekî” yew sergîyê resiman kerd a.

Na sergiyê resiman mahmut Celayir 25 Gûlan de çarçevê Festîvalê Huner û Kultur ê Diyarbekir de Navendê hûner ê Diyarbekîr (DSM) de bî a. Sergiyê resimanî M.Celayir hetanî 19 Hezîran akerde mûnena. Kam ke biwazo her roj eşkeno sergî zîyaret bikero.

Mahmut Celayir Çewlîg ra yo û nika almanya de ciwiyeno. Mahmut heta nika tirkiye û almanya de zaf sergiyî şexsî û ortax akerdî.

Perbîn ra Festîvalê Huner û Kultur ê Diyarbekir ke bi destî belediya yena organize kerdiş dest ci kerd. Festîval bênatê rojanî 28 gulan-4 hezîran de viraziyena.

www.alsy.org

Sereko bêtalih, mergo trajedîk, sehîdo nemir
SEÎD ELÇÎ(1)

M. Selîm Mûrad

Seîd Elçî, Çewlîg de dewê Zeyneb de 1925 de ame dinya. Seîd Elçî eslî xo kird (zaza) o, la kurmancî zî hol zanên. Yew deme Îstanbûl de Asar-ı ilmiye Kütüphanesi de xebitîya. Badî zî dest bi muhasebecîyey kerd û heta şehîd kewt na mesleg de gureya. Organîzetor, îdarekerdox û fedakar yew merdim bi.



Awankerdişî PDKT (Partîya Demokrat a Kurdîstanî Tirkîya) tarîxê ma ya nizdî de yew cayo muhîm geno. La şehîdbîyayişî her di serekanî (lîderanî) PDKT xoser o hedîseyî muhîm î. Herçî mergî Seîd Elçî zaf trajedîk yew hadîse yo.

Seîd Elçî, Çewlîg de dewê Zeyneb de 1925 de ame dinya. Seîd Elçî eslî xo kird (zaza) o, la kurmancî zî hol zanên. Yew deme Îstanbûl de Asar-ı İlmiye Kütüphanesi de xebitîya. Badî zî dest bi muhasebecîyey kerd û heta şehîd kewt na mesleg de gureya. Organîzetor, îdarekerdox û fedakar yew merdim bi. Îstanbûl de awankerdişî Bingöl Öğrenci Yurduyî de aktîf ca girewt. Îstanbûl, Anqara û bacaranî bînan de çi çalakîya (falîyeto) ke kurdan eleqeder kerdên tede cayî xo girotên.

Hedîseyî Kerkukî ser o (1959) Asim Erenî, senatorî Nixdeyî (Niğde), yew teklîf (önerge) da Meclisî Tirkan û verbî (qarşî) kurdan „mûqabeleyî bîlmîslî“ waştên. Ey vatên: ‚Iraq de kurdan turkmenî qetil kerdî, ma zî tîya (Tirkîya de) eynî tewir kurdan qetil bikeri.‘ Ney ser o wendox û roşnvîranî kurdan zaf cayan de Asim Eren û na politîkaya şovenîst protesto kerd. Seîd Elçî sey yew serekî reya verên na çalakî (eylem) de xo nîşan da. Telgrafo ke Asim Erenî re şawit bi, tede vatên: „Ewro her ca de heq û huqûqî merdiman esto, tu kes nieşkeno kurdan îmha bikero!... Ney hol dekir mezgî xoyo kufin!...“

Dewleta Tirk 17ê kanûne 1959 de roşnvîranî (aydınlar) kurdan ser o yew operasyono pîl (gird) viraşt. Îstanbûl, Anqara, Dîyarbekir, Qers, Malatî, Xarpêt, Çewlîg û bacaranî bînan ra 50 kirdî vîjnayey dey arye û eştî heps û zîndanan. Mardîn ra Emin Batu, telebeyî Fakulteyî Huqûqî ey Anqarayî, Zîndanî Harbîyeyî de merd, coka dewa bi namê „Dewayê 49an“ amey namekerdiş. Na dewa de Seîd Elçî serekan ra yew bi. Niweşo zaf giran bi, hucranî Zîndanî Harbîye de îşkence, zulm, veyşaney de 149 rojî xover da. Ey qerarî xo dabi, „Sonda Mirinê“ (Sondî Mergî) wendibi, vatên ‚ez sere dan la sirî xo nêdan‘, o tewir zî hereket kerd, rîyî xo yo pak a no îmtîhan ra vicîya. Mûsa Anter vîranayîşanî xo (Hatıralarım) de derheqî mêrxasey ey de wina nuseno: „Malamınê, Sait Elçi niweşo giran ey weremî bi. Binî berî hucreyî ey ra gonî û rêm amên. O halî xo ya zî veng dên mi, vatên: Mûsa Abê, ma ne înad e, ez namirim. (Kek Mûsa, ma nê înad o, ez nimeren) „ Dewayê 49an de ey merdimanê ke pawitişo sîyasî (sîyasî savunma) viraştibi, nînan ra yew zî Seîd Elçî bi. Seîd Elçî sey yew serekî kurdan amên mehkema kerdiş. Dadgeh, telgrafo ke ey Asim Erenî rî şawitbi eleyhî ey de sey delîl xebetnên. Dadgeh semedê 24 kesan „îdam“ waştên, namê Seîd Elçîyî mîyanî nê 24 kesan de bi.

Hema dewayê 49an dewam kerdên, ñarey 4ê hezîrane 1963 de, Seîd Elçî û parçeyanî bînan ê Kurdîstanî ra zî tede, 23 kurdî welatperwerî amey girewtiş. Bi îddîa ke „Seîd Elçî eleqatî ci Barzanî ya esto“, „serekî kurdperestan (Kürtçülerin lideri) o“ , „rêxistino nimitkî ronayo (gizli örgüt kurmak)“, „wazeno Kurdîstanêko xoser û yewbîyaye virazo „ ra ame mehkema kerdiş.

No deme, 1950-1960 de, zana, roşnvîr û miletperwerî kurdan mîyanî cigêrayîşan de bî. Hetî fikr û îdeolojî ya hêdî-hêdî ferqî kewtên nînan mîyan û pîye ra kewtîn dûrî. Rojname û kovarî neweyî vicên. Seîd Elçî, avûkat Zîya Şerefxanoglû û taye embazanî înan bi tirkî û kurdî hazirey vetişî kovarê Raya Rast kerdên. Kurdan mîyan de mucadeleyo îdeolojîk û fikrî dest pê kerdibi. Roşnvîrî kurdan bîbî di pare, guya taye „çep“ (solcu) taye „raşt“ (sağcı) bî. Înan ke xo çep dîn, Seîd Elçî û embazî dormaleyî ey bi „raştey“ (sağcılık) îtham kerdên. Înan ra tayin TİP de ca girewtibi, tayin zî komelanî demokratîkan, rojname û kovaran de kar kerdên. La heqîqat na ya ke Seîd Elçî û embazî xo xeta raşt de bî, çi ke „xetê kurd û Kurdîstanî“ de bî. Tarîx zî îsbat kerd û heq da Seîd Elçîyin ke, na xet yew xeta raşt bî.



Seîd Elçî û embazî ey rasey yew qenat ke bê yew organîzasyono sîyasî, bê yew xebata sîstematîka derg û dila kurdî û Kurdîstan xelas nibenî. Çunkî dewlet, înan rî rayîrî xebata legal û demokratîk girewtibi, o wext de no rayîr ra çareserkerdişî mesela mumkun nêbi. Înan xo mîyan de derg û dila munaqaşe kerd, program û destûrname (tüzük) sero xebitîyey, semedê sazkerdişî yew partîya sîyasîya îllegal qerarî xo da. Aşmê hezîrane 1965 de (goreyî taye çiman 11ê temuze 1965 de) Seîd Elçî û embazanî xo Dîyarbekir de PDKT (Partîya Demokrat a Kurdistanî Tirkîya) îlan kerd. Hîmdarî PDKT Seîd Elçî, Omer Tûran û hîrê embazî bînî bî. Sere de avûkat Faîq Bûcak mîyanî hîmdaranî partî de nêbi. Badî waşteyî taye merdiman ser Faîq Bûcak zî partî de sey hîmdarî cayî xo girewt û bi serekî partî. Seîd Elçî zî sey sekreterî îdareyî partî de cayî xo girewt. Namê Faîq Bûcakî ey mîyanî partî (kodname) „Zinar“, ey Seîd Elçîyî „Pêşmergê Welat“ bi. Namê hîmdaranî bînan Evîndarê Welat, Dûrnas, Jîrek, Bendê Welat bî. Program û destûrnameyê partî bi kurmanckî ameybî hezirkerdiş. Goreyî rîwayetan, awakerdişî PDKT de rolî Fehmî Bîlalî (ke Lîcê ra yo, katibî Şêx Seîdî bi) zaf estbi. La o bi xo mîyanî hîmdaranî PDKT de nîyo.

Na yew gama tarîxî bî, çunkî PDKT, nêmeyê seserrê 20in de rêxistina/partîya sîyasî ya verên a ke sazbîya. Bi na gam Kurdîstanî Vakurî de yew dema newey dest pêkerd, hereketo milî resa yew qonaxo newe, bi wayîrî yew rêxistin (partî) ke bi program û destûrname bî. Bi na gam nîsbî be zî Kurdîstan de bêvengey şikîyey. Labelê tirkan mesele ciddî girot, dewleta tirk waşt ke sere ra vernîyê PDKT bigêro, partî û awankerdoxî partî grewtî binî taqîbatî. Xora zaf derg nikerd, MİT taye mehelî meselan ra zî îstîfade kerd û bi yew komplo 4ê tebaxe 1966 de Faîq Bûcaq da şehît kerdiş.

Seîd Elçî, bê ke teredud bikiro, nobet dewir girot, sey sekreterî xebatê partî de rehberey kerd. Seîd Elçî karîzmatîk, mutewazî û zerrpak yew şexsîyet bi. Mîyanî embazanî xo de amên heskerdiş û pê bawerkerdiş. Bencîl û karîyerîst nêbi. Ey wina vatên: „Ma gereka verî verênan na dewayê bencîley xo mîyan ra wedari. Her kes vano ez ben serek. La orte de keso winayin çin o. Ez bizanî keso ke eşkeno [sekreterey] bikero esto, ez ben qul û koleyî ey.“ Binî serekey Seîd Elçî de partî xebatê xo dewam kerd, xebat yew demo kilm de Dîyarbekir ra heta Çewlîg, Mardîn ra heta Dêrsim, Îstanbûl ra heta Hekarî şax da. PDKT yew partîya welatperwer, demokrat û raverşîyayox bî. Her kesimî komelî (cematî) ra, her sinif û tebeqe ra merdimanî welatheskerdoxan û demokratan partî de cayî xo girotên. Xebat her roj bîn xurt, partî mîyanî şarî de rêç û reya eştên.

پێشمەرگە

کەمال رەئوف هەنجیرە - ئەڵمانیا

بابەتێکی لێکۆڵینەوەیە

بەشی دەهەم

کوردستانیش، هەر وەکو ئەرکە پیرۆزەکەی خۆی، کە رزگارکردنی کوردستانە بە گشتی، هاوشانی هاوپەیمانان بوونە ئەو دەستە دڵخۆشکەرەی راستەوخۆ ئامادەییان لە پەلاماردان و، رزگارکردنی ناوچەکانی کوردستاندا هەبوو. هەر ئەوانیش بوونە خاوەنی شەرەفی رزگارکردنی هەموو ئەو ناوچە کوردنشینانە. پێشمەرگە ئەگەرچی لەو پاڵەوانێتیەدا، بە بەرگی سەربازی و لەتەک رێکخستنێکی تردابوون، بەڵام هێز و توانا و خۆئامادەکردنەکە گیانی پێشمەرگایەتیە رەسەنەکە بوو. لەبەر ئەوەی کارەکەیان خەمێکی دێرین بوو، خەم خۆی ئەو دەردەش تەنها توانای ئەوان بوو. ئەو خەمەش رزگارکردنی سەرتاسەری کوردستان بوو، بەتایبەتی ئەو ناوچانەی هەمیشە لە ژێر دەسەڵات و هەڕەشەی مەرگی دوژمندابوون. هەر ئەوان بوون بە کەمترین زیان و کورت ترین کات توانیان مژدەی سەرکەوتن و ئازادی سەرتاسەری رابگەیەنن. ئەوە بۆ یەکەم جاربوو لە مێژووی شۆڕشی کوردا، سەربەرزانە هەموو شار و شارۆچکەکانی کوردستان بەو شێوەیە بەرگی ئازادی و یەکبوونیان بپۆشن. بەڵای رۆڵەکانی ئەو میللەتەوە نرخی ئەو ئازادییە گەلێک زۆرە، لەبەر ئەوەی تەمەنێکی درێژە دەستی رەش و چەپەڵی داگیرکەر دەست بەرداری یەخە و ژیانی دانیشتوانی ئەو ناوچە کوردستانیانە نەبۆتەوە. چارەنووسی ئازادی گەلی کورد تاکو ئەمڕۆش بەستراوە بە ساغکردنەوە و، یەک لایەنکردنەوەی ئەو شار و ناوچە تازە ئازادکراوانە. سیاسەتی دوژمنی رەگەزپەرست، پتر لە سی ساڵە هەوڵی کوێرکردنەوە و سڕینەوەی شوێنەوار و ئاسەواری بە کوردبوونی ئەو بەشە کوردستان دەدات، هەر ماوە و بە هێنانەوەی چەند بیانوویەک هەزارەها خانەوادەی کوردی لە سەر ماڵ و موڵکی باب و باپیری هەڵکەندووە و، بەرەو ناوچە دورە دەستەکانی تری ڕاگواستوون، ئیتر ئەگەر بەرەو کوردستان، یان بەرەو ناوەند و خواروو عێراق بەڕێکردبێت. لە جێی ئەوانیش هەزارەها خانەوادەی عەرەبی لە بەشەکانی تری عێراقەوە بە هاوکارییەکی مالی و پشتگیرییەکی تەواوەوە، هێناون و، جێگیری کردوون. ئەمە یەکێک بوو لەو هەوڵانەی لەو ناوچە کوردستانیانە، بە گۆڕینی دانیشتوانی، واتە بە عەرەب کردنیان تاکو لە جوگرافیای کوردستانی دابڕێت، بە چەندین جۆر و شێوازی نەشیاو و گێژەشێوینی لە ناوچەکەدا ناوەتەوە.

لەوانە هەوڵی رشتنی تۆوی دووبەرەکی داوە، بە تایبەت لە شارێکی دێرینی وەکو کەرکوکی فرە نەتەوەیی و، فرە بڕوای ئایینی، سروشتی ناوچەکە لە ڕووی پێکهاتە کۆمەڵایەتیەکەیەوە، لە زۆرینەی شارەکانی تری کوردستان و عێراقیش جیاوازترببوو. بۆ بەدیهێنانی مەبەستە گڵاوەکانی هەمیشە هەوڵی خوڵقاندنی دووبەرەکی و سێ بەرەکی داوە. ئاسەواری ئەو سیاسەتە چەواشەیی و فیتنەییە، تاکو ئەمڕۆش لەلایەن پیاوەکانی رژێمی لەگۆڕنراو، هەر جارە و بە جۆرێک لە جۆرەکانی ئاژاوەنانەوە سەرهەڵدەدەنەوە. بۆ پوچەڵ کردنەوە و بەگژڕکردنی ئەو بیرە شۆڤێنیانەی رژێمی سەرەونوگوم کراو و دەستە بەجێ ماوەکەی، پێویستی دەست بەکاربوون هەیە، جۆری کارەکانیش بێ لەوەی پێویستی بە یەک هەڵوێستی سیاسی کوردی هەیە، مەبەستیشە بە هەموو بەرگ و رەنگێکەوە داکۆکی لە هەقیقەتی بوونی نەتەوایەتی کوردی لە گشت ناوچەکەدا بکرێت. لەوانە: گەڕانەوەی گشت دەرکراو و دوورخراوەکان، بە هەمان شێوە گەڕانەوەی گشت ئاوردووەکان لە هەر رەگەز و ئایینێک بن. قەرەبۆکردنی هەموو زەرەرمەندێک، خستنەگەڕی سەرمایەی کوردی، بە پرۆژەی جۆر بە جۆرەوە لە ناوچەکەدا. گەڕانەوەی سنووری راستییەکانی ئەو شار و شارۆچکە و ناوچانەی، بە بڕیاری رژێمی گۆڕ بە گۆڕ، لەسەر ئەم شار گۆڕاوەتەوە سەر شارێکی تر. دۆزینەوەی کاری رۆژانە و، هەمیشەیی بۆ گشت ئەوانەی دەگەڕێنەوە سەر جێ و رێی خۆیان. کردنەوەی بانکێکی تایبەت، وەک پەنایەکی دارایی بۆ فریاکەوتنی ئەو خەڵکە بێ دەرامەتەی لە ئاکامی دەربەدەری و دەست بەسەر ماڵ و موڵکیدا گیراوە. هەروەها ئەو بانگە ببێتە پشت و پەنای هەوڵی ئاوەدان کردنەوە و سەقامگیربوونی گەڕاوەکان. نەهێشتنی ئاسەواری بەعەرەبکردن، لە هەر کوێیەکی ئەو ناوچە کوردستانیانەدا هەن. کردنەوەی قوتابخانە و بنکەی ڕۆشنبیری و رێکخراوە پیشەیی و مافە گشتییەکان بە بێ دواکەوتن. پشتگیریکردنی هەموو تاکێکی کوردی، لە هەر ناوەندێکی خزمەتگوزاریدایە و، ئامادەیی تێدایە ڕوو لە یەکێک لەو ناوچانە بکات بۆ خزمەتکردن. بەگژداچوونەوەی گشت ئەو بڕیار و یاسا ناقوڵایانەی، رژێمی گۆڕ بە گۆڕ سەبارەت بەو ناوچانە بە زۆر سەپاندوویانە. هەڵگرتنی گشت ئەو ناوە نوێیە نەشیاوانەی کە، رژێمی پێشوو لە شوێنە تایبەت و گشتییەکانی ناوە، کە نیشانەی پاڵەوانێتی خۆیی و بیری شۆڤێنیانە و سڕینەوەی ئاسەواری کوردی پێوەیە. گەڕانەوە و ناونانی هەموو ئەو جێ و رێیانە، بە ناوە ڕەسەنەکان و ناوی شیاوی نوێ. ئەمانە و زۆر هەنگاوی تری پێویست هەن، دەبنە ئەرکە مێژوویەکانی ئەم سەردەمە. گشت یەکێک لەو هەنگاوانە چاوەڕوانکردنی دەکاتە کەمتەرخەمی و، لە ڕووی گشت یاسایەکیشەوە ئەوانە مافێکی سروشتی ئەو گەلە ستەم دیدە زۆر لێکراوەیە. لێخۆشبوون ودەست هەڵگرتنیش لە هەر یەکێک لەو مافانە، تاوانێکە و دەرهەق بە مێژوو دەکرێت.

دەرێژەی هەیە

دەرێژەی سێ کاندیدی سەرۆک کۆماری....

"D" لە دەرێژەدا لە زاری تەقیپوورەوە دەڵێ: شاندی کوردی چەند جار شوێن و کاتی کۆبوونەوەکەی گۆڕی، ئەو کارەشیان هەندێک کێشەی دروووست کرد . تیمی تیرۆر داوی لە شاندی گفتوگۆ کرد تا بتوانن کاتی کۆبوونەوەکە درێژتر بکەن تا هەڵێکی باشیان وەدەست بکەوێ . ئەو هەڵە سەعات یەکی پاش نیوەڕۆ وەدەست کەوت. یەکێک لە ئەندامانی شاندی گفتوگۆ بە ناوی "موستەفەوی" دەرگای بە کراوەیی هێشتەوە و من و "عەسگەری" بێ هیچ کێشەیەک چووینە شوێنی گفتوگۆکان و بەرەو سەرکردایەتی حزبی دیموکراتی کوردستان، "قاسملو" و "قادری" و کەسی سێیەم بە ناوی "فازیل" (خەڵکی باشووری کوردستان و مامۆستای زانکۆ لە ڤییەنا بوو) و گوللەبارانمان کردن". قاسملو" تەنانەت نەیتوانی لەسەر کورسییەکەی هەستێت و دوو کەسەکەی دیکەش دەستبەجێ کوژران. بە هۆی تاریک بوونی شوێنی گفتوگۆکان، "جەعفەری شاهروودی" (ئەندامی تیمی گفتوگۆکان و لە فەرماندەکانی سوپا)ش بریندار بوو. من و "عەسگەری" خێرا ئەوێمان بەجێ هێشت و لە نەمسا چووینە دەرەوە. "جەعفەری شاهروودی"یان گواستەوە بۆ نەخۆشخانە و دوای ٢٤ سەعات و پاش هەوڵەکانی باڵیۆزخانەی کۆماری ئیسلامی ئازاد کرا و چووە باڵیۆزخانە لەوێ مایەوە و دوای ماوەیەک هاتەوە ئێران. "تەقیپوور" دەربارەی ئامادەکارییەکانی ئەو کردەوەیە گوتبووی : لە کۆبوونەوەکانی تاراندا و پێش چوونمان بۆ نەمسا، "حاجی غەفور" باسی لە چۆنیەتی کاری سێ تیمەکە دەکرد . "ئەحمەدی نەژاد" ئەو کێشانەی کە رەنگ بوو بێتە پێشەوەی دەخستە ڕوو و "حاجی غەفور"یش وەڵامێ دەدایەوە . لە کۆتاییدا "حاجی غەفور" گوتی :" هەموو شتێک جێبەجێ کراوە، لە نەمساش هیچ کێشەیەکمان بۆ نایەتە پێشەوە. دەچین و کارەکەمان ئەنجام دەدین و هیچ شتێک ڕوو نادات ". لە راستیدا لە هەندێک شوێن، دەوڵەتی نەمسا بۆ پاراستنی پەیوەندییەکانی لەگەڵ ئێران، هاوکاری گواستنەوەی شاندەکانی بۆ ئێران کرد و پۆلیسیش لێکۆڵینەوەیەکی ئەوتۆی نەکرد. جگە لەو کارە تیرۆریستییە، "ناسر تەقیپور" کاری دانانەوە بۆمب لە دوکانی "فازیلی" لە لەندەنیشی ئەنجام داوە. مەبەست لەو کارە کوشتنی "فازیلی" بوو، بەڵام لەجیاتی ئەو، کوڕەکی بەرکەوت. "حاجی غەفور" لە هێنانی تەکنۆلۆژیای ناوەکی لە وڵاتانی تازە سەربەخۆی ئاسیاوە بۆ ئێران، وەک قەزاقیستان رۆڵێکی کاریگەری هەبووە. ئەو ڕاپۆرتە وەرگێردراوەتە سەر زمانی ئەڵمانی و دراوەتە دکتۆر "پیتەر پیلسی" ئەندامی پەرلەمانی نەمسا و لە سەرکردەکانی حزبی سەوزەکان. دکتۆر "پیلس" کەسێکە کە لە کاتی تیرۆرەکانی ڤییەناوە بە بەردەوامی لێکۆڵینەوەی لەسەر کردوون. هەروەها ئەو ئەندامی ئەنجومەنی ئاسایشی پەرلەمانی نەمسایە. دکتۆر "پیلس" داوای کرد تا ئەو کاتەی هیچ هەوڵێکی ڕەسمی ئەنجام نەدراوە ئەو زانیارییانە لە زاری شایەدەکەوە ئاشکرا نەکرێت، هەم بە هۆی پاراستنی گیانی و هەمیش بۆ ئەوەی ئێران هیچ هەوڵێکی پێشگیری ئەنجام نەدات، هەر بۆیەش وێڕای گرووپێکی تەلەڤزیۆنی، ڕۆژی هەینی ٢٠ی ئەم مانگە چووە فەرەنسا و لە شوێنی دانیشتنی "بەنی سەدر"، لەگەڵ ئەو شایەدحاڵە بە ماوەی دوو سەعات قسەیان کرد. "پیلس" وەڵامەکانی لەگەڵ ئەو لێکۆڵینەوانەی لە نەمسا ئەنجام دراون، لێکدەدایەوە. لە ئەنجامدا گوتی ئەو قسانە زۆر شتی نادیاری بۆ ڕوون کردینەوە و ئێستا دەزانین پلانی ئەو تیرۆرانە چۆن داڕێژراوە و ئێران و نەمسا چیان کردووە. ئەو گرووپە تەلەڤزیۆنییە فیلمێکیان لە گفتوگۆکانی دکتۆر "پیلس" و "بەنی سەدر" دروست کرد و گفتوگۆیەکیان لەگەڵ "بەنی سەدر" ئەنجامدا کە شەوی ٢٣ی ئەم مانگە لە نەمسا بڵاو کرایەوە. هەروەها دکتۆر "پیلس" ٢٣ی ئەم مانگە کۆنگرەیەکی ڕۆژنامەنووسی سازدا و گوتی :"هەر کارێک بتوانم دەکەم تا ڕێوشوێنی یاسایی بۆ ئەنجامدەرانی ئەو کارانە بگیرێتە بەر". ئەو شایەدحاڵی تازەی بە "شایەدی D" ناو برد و لە زاری "ناسر تەقیپور"ەوە گوتی :" فەرمانی ئەو کارە لە لایەن "ڕەفسەنجانی" و "موحسینی ڕەزاییەوە" دراوە و "ئەحمەدی نەژاد"یش تیمی دووەمی تیرۆری پێکهێناوە. ئەو زانیارییانەم داوەتە یەکێتی ئەورووپا، ئەو سێ کەسە ئێستا کاندیدی سەرۆک کۆمارینە، یەکێتی ئەورووپا دەبێ بزانی لە هەڵبژاردنەکانی سەرۆک کۆماریدا، ململانی لە نێوان تەکنۆکراتە میانڕۆیەکاندا نییە، بەڵکو لە نێوان کەسانێکدایە کە لە تیرۆرە سیاسییەکاندا ڕاستەوخۆ یان ناڕاستەوخۆ دەستیان هەبووە". لە دەرێژەدا گوتی :" من قسەکانی "شایەدحاڵی D"م لەگەڵ ئەو بەڵگانەی سەبارەت بە تیرۆرەکان لە ئارشیفی پڕلیسدا دەرهێناوە، لێکدایەوە، ئەو قسانە زۆر زانیاری تازە و دروستیان تێدایە کە هەڵی پەیگەردی یاسایی سێ کاندیدی سەرۆک کۆماری و بەرپرسانی تیرۆر دەرهخسێنێ". هەروەها "تەقیپور" ئەوەی بۆ "شایەدحاڵی D" ڕوون کردۆتەوە کە دەوڵەتی نەمسا بۆ پاراستنی پەیوەندییە سیاسی- ئابووریییەکانی خۆی لەگەڵ ئێران، پێشگیری لەو کەسانە نەکردوە تا لەو وڵاتە بچنە دەرەوە. لە بەشێکی دیکەی ئەو ڕاپۆرتەدا باس لە چۆنیەتی تیرۆری دکتۆر "کەسرا وەفاداری" لە پاریس کراوە کە ئەوە دەقەکەیەتی: ڕۆژی ١٨ی ئەم مانگە "دکتۆر کەسرا وەفاداریان" بە چەقۆ لە ماڵەکەی خۆیدا کوشت، ئەو مامۆستای زانکۆ و کاندیدی سەرۆکایەتی ئەنجومەنی زەردەشتییەکانی ئێران بوو و کەسانێکی زۆریش دەنگیان دابوویە. هەروەها چەند ساڵ لەمەو بەر لە سیمینارێکدا لە لەندەن بەشداری کرد، کاتێک کە دەیەویست بچێتە ناو شوێنی سیمینارەکە، کەسێک پێی گوت کارم پێتە، بردیە لایەک و چەند کەسێکی دەورەیان دا و بە زۆر لەوێیان بردە دەرەوە و تا کۆتایی سیمینارەکە رایانگرت و هۆشداریان دایە کە ئەگەر جارێکی دیکە لە سیمیناری وادا بەشداری بکات، ئەوا ئەو کات بە هۆشدارییەکی ئاسایی رازی نابن . شایەنی باسە نێوبراو لە چالاکانی پاراستنی مافی مرۆڤ بوو. ■■■

کەلووکانی هەفتە



کاور ٣.٢١ تا ٤.٢٠

لەگەڵ خۆتدا راشکاو و ڕاستگۆ بە، بەتایبەتی لەو کارانەی کە دەخوازیت جێبەجێیان بکەیت، چاکتریش وایە ڕاوێژکاری بە هاوڕێ و ئاشناکانت بکەیت.



گا ٤.٢١ تا ٥.٢٠

لەوانەیە شێوازی کارەکەت گۆڕانکارییەکی بەسەردا بێت و ئەوەش دەبێتە هۆی ئەوەی بواری تایبەتی بۆ پشوودانت لە جاران زێتر بێت.



دوانە(جمک) ٥.٢١ تا ٦.٢١

ئەوەندە بیر لە ڕابردوو مەکەرەوە، چاکتر وایە بڕوانیتە داهاتوو، بەتایبەتی لەم ڕۆژانەدا چونکە مێشکت زۆر ماندووە.



قرژاڵ ٦.٢٢ تا ٧.٢٢

گوێ مەدەرە ئەو قسە و قسەڵۆکەی دەوروبەرت و پتر ئاگات لە تەندروستیت بێت چونکە بەرەو خراپی دەڕوات، ئەوەندە مێشکت بە شتی ئاڵۆز خەریک مەکە.



شێر ٧.٢٣ تا ٨.٢٢

بار و دۆخی خێزانیت بەرەو باشتر دەڕوات، بەڵام هەموو لایەنەکانی دیکەی ژیانت ئاسایین و هیچ گۆڕانکارییەکیان بە سەردا نایەت.



فەریک ٨.٢٣ تا ٩.٢٢

کاتێکی خۆش دەبەیتەسەر، دیارییەک یان نامەیەکت پێ دەگات کەسانێک نارەحەت دەکات، یارمەتییەکت لە کەسێکی دوورەوە پێ دەگات.



تەرازو ٩.٢٣ تا ١٠.٢٢

ئایندەت لە دەستی خۆتدایە، کارێک نەکەیت کە کارێگەرییەکی خراپ بکەیتە سەر ئاندەی خۆت، ژیرانە بیر بکەرەوە و بڕیار بدە.



دوو پشک ١٠.٢٣ تا ١١.٢١

ئەم هەفتەیە لەوانەیە هەندێ شتی نائاسایی تێدا ڕووبدات، هەروەها لەوانەیە هەندێ گۆڕانکاری ڕووبدەن لە شێوازی ژیانتدا و بە سوودی خۆت بشکێتەوە.



کەوان ١١.٢٢ تا ١٢.٢١

تۆ کەسێکی دیبلۆماسی و یەسک سووکیت، بایەخنەدانی بەرامبەرەکانتان بە ئێوە کارێکی خراپ دەکاتە سەر دەروونتان، باری خێزانیت سەقامگیرە.



گیسک ١٢.٢٢ تا ١.١٩

خۆت نەخیتە قاڵبی کەسایەتی دیکەوە، ئەوەندەش تورە و هەڵچوو نەبە لە ڕەفتار لەگەڵ دەوروبەرەکەتدا، چاوەڕوان بە هەواڵی باش بە ڕێکەوەیە.

سەتل ١.٢٠ تا ٢.١٨

خەریکی کارێک دەخەیت بە لایەکدا، ئەو کارە ماوەیەکە مێشکی سەرگەرم کردووییت، ئەنجامدانیشی لە بەرژەوەندی تۆدایە.

نەهەنگ ٢.١٩ تا ٣.٢٠

ئەم بار و دۆخەی ئێستات ڕێگە دەدات هەندێ ئاوات بهێنیتە دی، ئێستا لە ڕووی دەروونییەوە باشیت، بەڵام لە هەندێ ڕووی ترەوە جارێ ماوتە.



عەلی باپیر ئەبێت قوربان بە گوێی بکوژانی کوردا بخوێنێت یان فاتیحایەک بنێرێت بۆ گیانی پاکی شەهیدەکانمان؟

(تاریق عەزیز) کە زەمانێک بوو پێیان ئەوت (پژستەچی سەددام) چونکە تەنها قسەی سەددامی ئەگەیاند وخۆی بڕی نەبوو رای هەبێت، ئەمڕۆ فێری نامەنووسین بووە و لە چەند نامەیەکیدا لە زیندانەکەیەوە کە ئاراستەی رای گشتی جیهانی کردووە داوا لە کۆمەڵگای نێونەتەوەیی دەکات یاریدەی بدەن کۆتایی بەمەینەتیەکانی بێت، هەروەها لە نامەیەکیدا گوایا وتوویەتی: ئەو بێ تاوانە و ناعادیلانە دەستبەسەر کراوە.. ئەمە لەکاتێکدا لە ژوورەکەی ئەودیوی زیندانیەکە (تەها یاسین) خەریکی نەخشە دانان بووە بۆ وەفدی نێردراوی کۆنگرێسی ئەمەریکی بەرامبەر بە ڕاگواستنیان بۆ یەکێ لەوڵاتانی کەنداو و ڕێوشوێنی بۆیان دانراوە بۆ چۆنیەتی کشانەوەی هێزەکانی ئەمەریکا بە مەبەستی ڕزگارکردنی عێراق لە قەیرانی سیاسی و چۆن گفتوگۆی ڕاستەوخۆ لەگەڵ یاخیبووەکان بکرێت..هەر لە ژوورێکی تری زیندانیەکەدا ماوەیەک لەمەوبەر (شێخ عەلی باپیر) سەرکردەی (کۆمەڵەی ئیسلامی) مشەغوولی دوعاکردن و ئایەت خوێندنەوە بووە بەگوێچکەی پیاوانی سەدام و تاوانبارەکانی سەردەمی سەددام کە دەستیان سووڕە بە خوێنی سەرتاپای میللەتێک و دەڵێ : ئەو هەستی کردووە بە گرنگی لێبوردن لە تاوانبارە بەعسیەکان لەگەڵ ئەو هەموو تاوانە نامرۆڤانەی کردووشیانە ، چونکە بەپێی قسەکانی کە لە چاوپێکەوتنێکدا لەگەڵ ڕۆژنامەی گاردیانی بەرتانیدا وتوویەتی گوایا ئەو (تاوانبارانە لە باریگی دەروونی خراپدان و لە باری بێ هێزدان، دووریش نیە لە خوا نەپارابێتەوە لێیان ببوورێت و بە دەست و پلی سوور و خوێناویان بیانخاتە بەهەشتی بەرینەوە..

لە لایەکی دیکەشەوە (وەفیق سامەرائی) کوردکوژی دەست سوور بە خوێنی هەزاران هەزار شەهیدی کورد و هەزاران هەزاری تری عەرەبیش، لە چاوپێکەوتنێکیدا لەگەڵ کەنالی ئاسمانی (الفیحاء)دا باس لە ئەمنی قەومی و پێکهاتەی یەکگرتووی نیشتیمانی عێراق و پرینسیپەکانی ئەخلاق و ئایین دەکات و باس لە کۆمەڵە و گرووپە تیرۆریستیەکان دەکات و ڕێ وجێ دادەنێت بۆ چۆنیەتی لەناوبردنیان و دادگاییکردنیان و باس لەو تیرۆریستانە ئەکات کە منداڵ و ژن و بەتەمەن و سیڤیل ئەکوژن، و گوایا چۆن ئەبێت دادگایی بکرێن و هیچ پاردۆنێک نەیانگرێتەوە..

ئەوەی ئەم هەوڵ و باس و خواسانە بخوێنێتەوە داخوا چی بە خەیاڵیا دێت سەبارەت بە دواڕۆژی عێراق و بەتایبەت دواڕۆژی کورد لە عیراقدا ، لە کاتێکدا دادگایی کردنی سەددام و دەست و پێوەندەکانی هەروا بێ هۆ دواخراوە و بە هەڵواسراوی هێڵراوەتەوە، لە کاتێکدا ئەوەتا (عەلی باپیر) بەناوی ئایینەوە داوای لێبوردن و پۆزش ئەکات بۆ تاوانبارەکانی جەنگ و قاچاخچیەکانی خوێنی کورد و دەستسووڕەکان بە خوێنی هەرچی قوربانیانی شەهیدانی ڕێگای ڕزگاری کوردستان و هەموو شەهیدانی هەڵەبجە و بادینان و گرمیان، ئەی داخوا ڕۆژێ لەڕۆژان هیچ دووعایەک ، ئایەتەلکورسیەک یان فاتحیەکی نارددووە بۆ ڕۆحی ئەو شێهیدانە؟ زۆر باوەڕم بەو بیردۆزە هەیە کە دەڵێ دوو شتی لەیکچوو بەلای یەکدا ڕائەکێشرێن (شبیه الشیئ منجذب إلیه) ، بۆیە عەلی باپیریش دوعا بە گوێی تاوانبار و بکوژانی کوردا ئەخوێنێتەوە ، چونکە ئەوان وەک ئاوێنە وێنەی یەکن بەرامبەر بەیەک، و دوورنیە لێشمانِ ڕاستەبینەوە بپارێتەوە بەرەڵا کرێن و ڕەوانەی ژیانێکی ئاسوودە کرێن لە یەکێ لە وڵاتانی کەنداو پێش ئەوەی بە سزای عادیلانەی گەل بگەن.. هەروەک ئەو وەفیق سامەرائیەی تا دوێنی بوو کوردی ئەکوشت و گەنج و لاوی ناوەڕاست و باشووری عێراقی لەناو ئەبرد ، کەچی ئێستا باس لە ئەمنی قەومی و چۆنێتی لەناوبردنی گروپە تیرۆریستیەکان ئەکات و وانە بەپێزەکانی پێشکەش بە سەرۆک کۆمار ئەکات لە نیشتیمان پەروەردا، بێگومان ئەو کابرایە -ئەزموونێکی باشی هەیە لە قەلاچۆکردنی ئادەمیزاددا لەسەر هەموو ئاستەکان بۆیە شایستەی ئەو پۆستەیە کە ئێستا بەدەستیەوەیەتی.. ئیدی لە هەر هەمووشی سەیر و سەمەرەتر نامەکانی تاریق عەزیزن کە خۆی کردووە بەفریشتە و داوا لە کۆمەڵگای نێونەتەوەیی دەکات یاریدەی بدەن کۆتایی بە مەینەتیەکانی بێت، و لەوێشەوە تەها یاسین ڕێوشوێن بۆ وەفدی کۆنگرێسی ئەمەریکی دائەنێت چۆن دیالۆگ لەگەڵ تیرۆریستەکاندا بکەن، ئەی باشە مەینەتیەکانی گەلی کورد و هەموو گەلانی عیراق کیلۆیان بەچەندبوو کاتی ئەوانە هێز و دەسەڵاتیان بەدەستەوە بوو، ئەی ئەوکاتە بۆ ئەوەندە بەشەفافی وەکوو فریشتە بیریان لە مەینەتی گەلی کورد و گەلانی عیراق نەدەکردەوە وە لە کۆمەڵگای نێونەتەوەیی نەدەپارانەوە نەجاتیان بدات لە مەینەتیەکانی تیایدا بوون لەسایەی سەددامی زۆردارد؟؟ ■■■

کێشە و ئاستەنگەکانی خوێندکارانی کورد لە ئەورووپا

لە هەڤپەیڤینێکدا لەگەڵ مەحمد ژووری خوێندکاری بڕوانامەی دکتۆرا لە ئەڵمانیا



بە مەبەستی تیشکخستنە سەر کێشەو ئاستەنگەکانی ژیانی خوێندکارانی کورد لە ئەورپا و، گەیاندنی داوکارییەکانیان بۆ بەردەم بەرپرسانی حکومەتی هەرێمی کوردستان و، پەیامی کورد ئەم دیدارەی لەگەڵ خوێندکارێکی کورد سازکرد، کە لە قۆناغی دکتۆرا دەخوێنێت،

محەمەد ژووری خوێندکاری قۆناغی دکتۆرا لە زانکۆی شاری ئیرمنالی ئەڵمانیا لە ئەندازیاری کارەبا بەشی فێرکۆنسی شەپۆلی بڵند دەخوێنێ.

پەیامی کورد: کێشەی قوتابیانی کوردستان ئەوانەی کە لە دەرەوەن، چییە؟

وەڵام: کێشەکان زۆرن، بەڵام کێشەی هەرە گەورە ئەوەیە کە کەس نییە هاوکاری قوتابیانی کوردستان بکات، لە قۆناغەنی خوێندنی باڵا. زۆر لەو کەسانەی ماستەر تەواو دەکەن ناتوانن دکتۆرا وەرگرن، هیچ دەزگایەک نییە پشتگیر مادی و ڕێنماییان بکات بەڵام بە پێچەوانەوە لە وڵاتانی تری جیهان ئەو قوتابیانەی کە لە دەرەوە دەخوێنن، لەلایەن حکومەتەکانی خۆیانەوە هاوکاری ماددی ومەعنەوی دەکرێن.

پەیامی کورد: ئایا حکومەتی ئەڵمانی لە ڕووبەکەوە هاوکارییتان دەکات؟

وەڵام: حکومەتی ئەڵمانی بۆ ماوەیەکی دیاریکراو هاوکاری دەکات، بە مەرجێک ٥٠٪ خەرجی خوێندنەکەی بۆ حکومەتی ئەڵمانی بگێڕێتەوە، دوای تەواو بوونی یان دەبێ لەگەڵ خوێندنیش کاربکەی کە ئەوەش کار دەکاتە سەر توانای فیکری و زانستیت چونکە تۆ دەبێ هێزێ خۆت دابەشی دوو بەکەی لە نێوان کار و خوێندن. تۆ ئەگەر بڕوانامەی دکتۆرا بەماوەی سێ ساڵ وەرگری بەئاسایی واتا ئەگەر تەنها بخوێنی، بەڵام لەکاتی خوێندن و کارکرکردن پێوستیت بە پێنج یا شەش ساڵ هەیە کە ئەوەش بێگومان کاردانەوەی خراپی دەبێ لەسەر ڕەوتی بەرەو پێشبردنی زانست لە زانکۆکانی کوردستان چونکە ئەوکەسانەی کە بڕوانامەی دکتۆرا و ماستەر وەردەگرن ٩٥٪ دەیانەوێ بگەڕێنەوە بۆ کوردستان و خزمەت بکەن.

پەیامی کورد: ئایە ئاستی زانستی خوێندکارانی کوردستان چۆنە بەبەراوردکردن لەگەڵ وڵاتانی تری جیهان؟

وەڵام: کۆنی سیستەمی خوێندن لە کوردستان و گرنگی نەدان بە زمانی بیانییەکان لە وانە زانستییەکاندا، بە تایبەتیش ئینگلیزی کە زمانێکی جیهانییە، بۆ نموونە وڵاتانی ئەفریقیا و باشووری ئاسیا بەهۆی پێشکەوتوویی سیستەمی خوێندنیان و بەکار هێنانی زمانی ئینگلیزی ئاستی زانستیان بەبەراورد لەگەڵ ئێمەی خوێندکارانی کوردستان باشترە کە بۆخوێندن دێنە ئەورپا.

پەیامی کورد: چی بکرێ بۆ بەرزکردنەوەی ئاستی قوتابیانی کوردستان تا بگاتە ئاستی وڵاتە پێشکەوتوەکان؟

وەڵام: پێش هەموشت خوێندن بکرێ بە پێتی لاتینی کوردی بە هەندێک نوێکاری، هەروە ها لە هەموو قۆناغەکانی خوێندن لە سەرەتایی تا زانکۆ پێوستە تازەبکرێتەوە و زمانی ئینگلیزی زۆرتر گرنگی پێ بدرێ وەک ئەوەی کە ئێستا هەیە .

پەیامی کورد: داواکاریت بۆئەوخوێندکارانەی کە دەیانەوێت خوێندنیان لە ئەورووپا تەواو بکەن چییە؟

وەڵام: بۆئیمەی کورد، بە تایبەتی لەم قۆناغەدا پێویستمان بە هەڵگری بڕوانامەی زانستی هەیە، بۆ نموونە ئاسانە بە خوێندکارێکی کورد لە ڕۆژهەڵای ناوەڕاست بەگشتی و کوردستان بە تایبەتی بڕوانامەیەکی دکتۆرا، بەدەست بێنی لە ئەدەبدا، بەڵام لەبواری زانستی تکنۆلۆژیا بەدڵنیاییەوە ئەورووپا پێشکەوتووترە چونکە تازەترین زانستی جیهان لە زانکۆکانی ئەورووپا دەخوێندرێ بۆیە کادیر و سەرمایەی زانستی لە هەموو کات پێویستترە بۆ بنیاتنانی کۆمەڵگایەکی پێشکەوتوو و هاوچەرخ لە کوردستاندا.

پەیامی کورد: پێشنیارت چییە بۆ بەرپرسانی حکومەتی هەرێمی کوردستان؟

وەڵام: پێشنیار دەکەم کەوا دەزگایەک لە حکومەتی هەرێمی کوردستان دابمەزرێ کە تایبەت بێت بەچاودێریکردن و هاندانی خوێندکارانی کوردستان بە گوێرەی پێوست و هەوڵدان بۆ ئەو جۆرە کادیرە زانستییانەی کە قۆناغی بنیاتنانەوەی کوردستان لە دوای شەڕی ئازادی عێراقدا بۆشایی پێویست پڕبکەنەوە، هەروەها بەدواداچوونی داواکارییەکانی قوتابیانی کوردستان کە لەدەرەوەی هەرێمی کوردستان دەخوێنن و دابینکردنی خەرجییان لە ڕووی ماددی و مەعنەویشەوە تا وەکو بە زووترین کات بگەڕێنەوە بۆ کوردستان و خزمەت بکەن، سوپاسی ڕۆژنامەی پەیامی کورد دەکەم کە یەکەم دەزگای ڕاگەیاندنی کوردستانییە بەم جۆرە، گرنگی دەداتە کێشە و گرفتی خوێندکارانی کوردستان لە ئەورووپا. ■■■

هەڤپەیڤین . جوتیار دارفرۆش

دڕێژەی لێپەیمینەوەی بینەران .....

شاراوەکانی "بوودیزم". نمایشەکەشی ڕەگدانەوەیەکی ئیستاتیکی شانۆی "نو"، ڕێبازی "زن" و شێوازە ساکارە قوولەکەی پیتەر بروکیشە. "ئۆشی ئۆیدە" سەبارەت بە نەمایشەکەی دەڵێت: "خاڵی دەستپێکردن و زەمینەی پرۆژەکە، جیهانە نهێنی و شاراوەکانی زن و بوودیزمە. ئەو پرسیار و نهێنییانەی کە هەرگیز وەڵامێکی لۆژیکی و تەواوەتی بۆ نادۆزرێتەوە. هەمیشە پرسیارەکانیش هەمان پرسیارە، بەڵام پرۆسێسە هونەری، فەلسەفی و خودییەکانی نوێ و جیاوازن". هەر لەم دەروازەیەوە "زن" وەک فەلسەفە و ئایین دەبێتە زەمینەیەکی لەبار و خاڵێکی گرنگی گەڕان و دەستپێکردن. "زن"یش بڕوای بە قووتاربوونی خودە. "هەموو خودێک وەڵامی پرسیارەکانی لە ناوەوەی خۆیدا دەدۆزێتەوە". "ئۆشی ئۆیدە" لە سەرەتای نمایشەکەیدا ڕوودەکاتە بینەران و دەڵێت: "مانای ژیان چییە؟" بێگومان هیچ وەڵامێکی ڕاستەوخۆش بۆ ئەم پرسیارە گرانە نییە. بەڵام لەگەڵ ئەوەشدا زۆر بە سەلیقە بینەران دەوروژێنێ و بە دوای وەڵامێکدا دەگەڕێت. ئەم هونەرمەندە لەو پانتاییە بۆشەدا، لەگەڵ ڕیتمی مۆسیقایەکی زۆر جیاواز، جەستەیەکی پلاستیکی و هەندێ قامیش زۆر باریکدا گەمە دەکات، سەمایەکی زۆر بەرزمان، لە پانتاییەکی زۆر تەسک و دیاریکراودا پێشکەش دەکات. شانۆ لەلای پیتەر بروک خانووبەرە، ستیل، تێکست و ئەکتەریش نییە. هەروەها شانۆ ئەو گفتوگۆ چڕەش نییە کە لە نێوان خەڵکانی ڕۆشنبیردا دروست دەبێت. بەڵکو شانەکانی شانۆ، گەوهەری شانۆ و فەلسەفەی لەلای پیتەر بروک لە وشەی "گەڕانەوەکان" پڕ لە ئامادەبوونداکۆدەبێتەوە. چاوترووکانێکی زیندوو، ساتە وەختێکی پڕ لە ژیان. لەم چاوترووکاندنەشدا ڕووبەڕووبونەوە و پێکەوە گرێدانی ساتە زیندووەکانی ژیان ئامادەگییەکی ڕاستەوخۆی دەبێت. "ئۆشی ئۆیدە" زۆر بە وردبینی و بە سەلیقەیەکی گەورە لە چاوترووکاندنێکدا ئەو "چاوترووکانە" زیندووە لەگەڵ بینەران و لە گەوهەری نمایشەکەیدا دەخولقێنێ. پرسیاری گرنگ لە بینەران دەکات: مرۆڤ دوای گەیشتنە ترۆپک، چۆن دەگاتە ئاستی ترۆپکی ترۆپکەکان. بینەران بە تەواوەتی سەرقاڵی گفتوگۆ و وەڵام دانەوەی وەڵامی جۆربەجۆر دەکات. خۆشی بە زەردەخەنەیەکی پڕ لە هەست و سیمایەکی گەشی مرۆڤایەتییەوە هەوڵی دەدا باری سەرنجی هەبێت، بەڵام هیچ وەڵامێکی ئاشکرا نییە! ئەم هونەرمەندە بە سەلیقەیە گەمە دەکات: دوو پەنجە، یان بە سیمای دەموچاوی هەموو هەست و هۆشی بینەران بۆ لای خۆی ڕادەکێشێ. جیهانە تەلیسماوییەکان دەشکێنێ و بینەران پەلکێشی وەڵامدانەوە و بەشداری نمایش دەکات. دواتر بە قامیشە باریکەکانی دەستی و جەستەی نمایشێکی سەما ئامێزمان پێشکەش دەکات. "ئۆشی ئۆیدە" لە کۆتاییشدا پانتاییە بۆشەکە بەجێدێڵێ، ئامێرێکی موسیقی خڕی هەڵتۆقیووی لە کانزا دروستکراویش، تۆنێکی مۆسیقی نزیک لە ڕێوانەکانی بوودیزمەکانی لێ بەرز دەبێتەوە و وەک فرۆکەیەکی سەرلێشێواو لە ئاسماندا دەخولێتەوە. پانتاییەکی بۆش، بێدەنگییەکی گەورە، ڕووناکییەکی کز، ئاوازێکی تایبەتمەندی هێمن و خولانەوەیەکی بەردەوام. ■■■

دڕێژەی دیداری هەڵگەوت زاهیر.....

بێت. هیوادارم لە داهاتوودا گرنگی زیاتری پێ بدەن و هەوڵ بدەن کارەکان بخوێننەوە و هەڵیبسەنگێنن.

هەڵگەوت: رەنگەکان نیۆ تۆ چی دەگەیەنن و کام ڕەنگ لە تۆ نزیکە و لە کارەکانتدا زیاتر دیارە؟

وەڵام: لای من ڕەنگ هێمای گەیاندنی هەستە، جۆرێکە لە شیوازەکانی پێوەندی لەگەڵ هزر و ناخی بەرانبەر گفتوگۆ دەکات، کاریگەرییەکانیشی لە کەسێکەوە بۆ کەسێکی تر جیاوازە، من بەهۆی ڕەنگەوە دەدویم و هەستەکانم ئازاد دەکەم.

هەر ڕەنگە و تایبەتمەندی خۆی هەیە و واتای خۆی هەیە، من هەموو ڕەنگەکانم خۆش دەوێ، ڕەنگە گەرمەکان خۆشەویستی و وزەی ژیان و هیوا و بەردەوامی دەبەخشن، ڕەنگە سارەدەکان خەم و شەڕ و ناخۆشی و کارەساتە مرۆییەکان ئەدرکێنن، سارد و گەرم لە تابلۆکانمدا باوەس بە یەکتردا دەکەن و خەمەکانم دەلاوێنن و یەکتری تەواودەکەن، سەرەڕای نەهامەتییەکان، ڕەنگە ڕۆشنەکان ڕەنگە تاریکەکان لەئامێز دەگرن و ئازارەکان کەم دەکەنەوە و هیوا و بەردەوامی دەبەخشن.

هەڵگەوت: بۆ کارە هونەرییەکان، هەندەران بۆ تۆ بووە بە مۆرکاری نامێزان یان دابڕان؟

وەڵام: هەندەران بۆ من بووتە دابڕان لە ڕەنگ و سیما و دەولەمەندی سرووآشتە جوانەکەی کوردستان، هەندەران بووەتە گەشتکردنێکی ناخم بەهەموو ژیانی ڕابردووما کە تیایدا هەوڵم داوە، بیرەوەرییەکانم بەرجەستە بکەم. ئەتوانم بڵێم هەندەران وای لێکردم بارستایی ڕەسەنی هونەری کوردی بزانم. من کە لە وڵات دوور بووم هەردەم جاوم لە هونەری نامۆی دەرەوە بوو، بەلام ئێستا تێنووی ڕەنگ و ئەفسوونی هونەر و کولتووری وڵاتەکەم، حەز دەکەم نیشانیان بدەم کە ئێمە هیچ لەوان کەمتر نین، ڕاستییەکش وایە، دوژمنان هەمیشە چاوەکانمانیان لە سەر تەختەی دەم و چاومان سڕیوەتەوە، نەیانهێشتووە پەل بهاوین و ڕەگ داکوتین بۆیە هەردەم لە سیمای تەڵخی تابلۆکانمدا ئازاری میللەتەکەمان دەنخشێنن. ئێستا کاتی ئەوە هەیە، هەوڵ بدەین دڕووستی بکەینەوە و کارە زەوتکراوەکانمان بگەڕێتینەوە ئامێزی نیشتمان.

هەڵگەوت: دوا چالاکی هونەریت چییە؟

وەڵام: دوا چالاکی هونەرییم، بەشداریکردنە لە پێشانگای هاوبەش لەگەڵ هونەرمەندانی بێگانە لە شاری "شقێبش گموند" لە مانگی 7 دەکرێتەوە، هەروەها سەرقاڵی خوێندنەوەم لەسەر میژوو و هونەری بەرەی کوردی کە زۆر خەمبارم دەکات چونکە زۆربەی ئەو کارە ڕەسەنانە بەناوی وڵاتە داگیرکەرەکانەوەیە.

هەڵگەوت: دوا وتەت بۆ پەیامی کورد؟

وەڵام: زۆر سوپاستان دەکەم کە منیتان بەسەر کردەوە، هیوای بەردەوامی بۆ دەخوازم، داواکارییەکم هەیە، بە تکاوە کە ئێوەی بەڕێز بتوانن بانگەواز بکەن کەچی دی نەهێڵن کارە ڕەسەنەکانمان بفەوتێ دەبێت خۆمان فێری خۆپاراستن بکەین و لە کارە هونەرییەکانەوە دەست پێبکەین، چونکە نەتەوەی بێ هونەر و کولتوور نەتەوەیەکی بێ میژووە. لەگەڵ ڕێز و خۆشەویستیم، هەربژین ئێوە. ■■■

هەڵکەوت: دەتوانین کورتەیەک لە سەرەتای دەسپێکردنی هونەرییتان بزانین؟

وەڵام: بەهۆی پەروەردەبوونم لە ناو خێزانێکی هونەرپەروەردا، کاریگەرییەکی بەرچاویان هەبووە لەسەر ڕەوتی ژیانی هونەرییم، لە ڕەنگە ئاڵا و وڵاکانی مامۆستای کڕچ کردوو(ئازاد شەوقی) و هێڵە بەهێزەکانی مامۆستای جوانە مەرگ(شێرزاد شەوقی) و گشت ئەندامانی خێزانەکەم کە لە هەموو سەرنجێک و تێڕوانینێک پەروەردە و خولیای ئەو جیهانە هەمەڕەنگەیان کردم. لە یەکەم دەستگرتنی خامەوە، دەستم بە نیگارکێشان کرد و لە تەمەنی پێنج ساڵییەوە پلەی یەکەمم هێنا. لە پێشانگای شانکەری نیونەتەوەیی منداڵان. ئەمەش سەرەتای دەستپێکردنم بوو.

هەڵکەوت: جیاکییە هونەرییەکانت لە کوردستان و هەندەران کامانەن؟

وەڵام: ١- لە ساڵی ١٩٧٠ تا ١٩٨٤ بەشداری ساڵانەی پێشانگاکانی خوێندنگە سەرەتایی و ناوەندی و ئامادەییەکانی شاری سلێمانیم کردووە لەو پێشانگایانەدا٤جار پلەی یەکەمیم لە سەر ئاستی منداڵانی عێراق و جیهان بەدەست هێناوە. لە ساڵی ١٩٨٤ تا ١٩٨٨ خوێندکاری ئەکادیمیای هونەرە جوانەکان بووم (بەشی گرافیک). لە زانکۆی بەغدا.

٢- لە ساڵی ١٩٨٥ تا ١٩٨٨ بەشداری هەموو فیستیڤاڵ و پێشانگای ساڵانەی ئەکادیمیای هونەرە جوانەکانی بەغدام کردووە و "دوو جار خەڵاتی تایبەت کراوم". لە ساڵی ١٩٨٦ و ١٩٨٧ بەشداریم لەگەڵ مامۆستاکانم کردووە لە پێشانگای ڕۆژی هونەر لە هۆڵی مۆزەخانەی عێراقی لە بەغدا.

٣- لە ساڵی ١٩٨٦ پێشانگەی تایبەتی خۆم و مامم(سەرچڵ شەوقی) کردەوە لە هۆڵی مۆزەخانەی سلێمانی.

٤- لە ساڵی ١٩٨٨ تا ١٩٩٧ بەشداری ڕۆربەی پێشانگاکانی فیستیڤاڵی ساڵانەی پەیمانگای هونەرە جوانەکانی سلێمانیم کردووە.

٥- لە ساڵی ١٩٩١ تا ساڵی ١٩٩٧ بەشداریی ڕۆربەی پێشانگاکانی یەکێتی هونەرمەندانم لە شارەکانی (سلێمانی، هەولێر، دهۆک) کردووە.

٦- لە ساڵی ١٩٩١ تا ساڵی ١٩٩٧ بەشداری پێشانگای یادی ساڵڕۆژی "هەڵەبجە و ئەنفال و ڕاپەڕین"م کردووە لە شارەکانی سلێمانی و هەڵەبجە.

٧- لە ساڵی ١٩٩٢ بەشداریم لە پێشانگای هاوبەشی هونەرمەندانی کورد لە ئەڵمانیا کردووە، بە سەرپەرشتی ڕێکخراوی میدیکۆ ئەنتە ناسیۆنالّ.

٨- لە ساڵی ١٩٩٥ تا ١٩٩٦ بەشداریم لە پێشانگای پەیمانگای هونەرە جوانەکانی سلێمانی لە شاری هەولێر کردووە.

٩- لە ساڵی ١٩٩٦ لەگەڵ هونەرمەندی نەمر مامۆستا "سەروەت سەوز" و خوێندکارەکانی پەیمانگای هونەرە جوانەکانی سلێمانی (بەشی گرافیک) بەشداری زانکۆی میدڵئیستی بەریتانی لە شاری لەندەن کردووە.

١٠- لە ساڵی ١٩٩٨ سەرپەرشتی خولی فێرکردن و ئامادەکردنی پێشانگای منداڵانی سەرەتایی باخ شوولە کردووە لە شاری شتوتگارت.

دیداری هەڵکەوت زاهیر لەکەڵ:

هونەرمەندی شێوەکار خۆشی شەوقی



خۆشی شەوقی، بەهرەمەند و دەستڕەنگین، هونەرمەندێکی بە توانا، بەردەوام لە کار و بەخشش بە جۆرێ کە سەیری ژمارەی کارەکانی دەکەیت ، هێندە زۆرن، وا دەزانیت بیست و چوار کاتژمێر کاردەکات و لە خەونیشدا قڵچەی بەدەستەوەیە و تابلۆ دەنەخشێنێ، شانازیی بە ڕەسەنایەتی هونەری کوردییەوە دەکات و بە بەردەوامی هەوڵی پێشخستن و سەرکەوتنی دەدات.

هەڵکەوت: چی بە پێویست دەزانیت بکرێت بۆ پێشخستنی هونەری کوردی؟

وەڵام: لە ڕاستیدا دوای هاتنەدەرەوەم هەستم بەبەرزی و دەوڵەمەندی کولتوورەکەمان کرد، بەڵام لەبەر نەبوونی ئاسوودەیی و فشاری دوژمنان لە کوردستان، نەتوانراوە بەشێوەیەکی پێویست پێشکەش و نیشان بدرێت. هەموو نەتەوەیەک بەهۆی هونەر و کولتوورەکەیەوە دەناسرێت، چەند هونەر و کولتوور دەوڵەمەند بێت ئەگەر بیت و ڕێگەی ئی نەدرێت بە شێوازێکی گونجاو و سەرنجڕاکێش پێشکەش بکرێت، ئەوا نرخ و بەها و جوانی لەدەست دەدات. ئاواکاریم لە کاربەدەستانی کوردستان ئەوەیە کە پێویستە پسپۆڕان ئامادە بکرێن بەتایبەت بۆ هونەری "پیشاندان". پێویستە هۆڵی گەورە لەسەر ئاستی بنەما لە شاری "شڤێیش گموند".

٢٠- لە ٢٠٠٤/٣/١٦ پێشانگای تایبەتیم بۆ یادی کارەساتی هەڵەبجە پێشکەش کردووە لە هۆڵی "بیشۆف مۆزا هاوس" لە شاری شتوتگارت.

٢١- لە ساڵی ٢٠٠٤ پێشانگای تایبەتیم لە "فۆلکس هۆڕ شوولە"ی شاری "شڤێیش گموند" کردووە و بە باشترین کاری ٢٠٠٣ و ٢٠٠٤ هەڵسەنگێنراوە.

٢٢- لە ساڵی ٢٠٠٤-٢٠٠٥ بەشداریم لە پێشانگای هونەرمەندانی بێگانە و ئەڵمان لە هۆڵی "بیشۆف مۆزا هاوس" لە شاری فرانکفۆرت، کردووە.

٢٣- لە ساڵی ٢٠٠٤-٢٠٠٥ پێشانگای تایبەتیم لە هۆڵی ئۆپرۆپاهاوس لە ساری شتوتگارت کردووە.

هەڵکەوت: چی بە پێویست دەزانیت بکرێت بۆ پێشخستنی هونەری کوردی؟

وەڵام: لە ڕاستیدا دوای هاتنەدەرەوەم هەستم بەبەرزی و دەوڵەمەندی کولتوورەکەمان کرد، بەڵام لەبەر نەبوونی ئاسوودەیی و فشاری دوژمنان لە کوردستان، نەتوانراوە بەشێوەیەکی پێویست پێشکەش و نیشان بدرێت. هەموو نەتەوەیەک بەهۆی هونەر و کولتوورەکەیەوە دەناسرێت، چەند هونەر و کولتوور دەوڵەمەند بێت ئەگەر بیت و ڕێگەی ئی نەدرێت بە شێوازێکی گونجاو و سەرنجڕاکێش پێشکەش بکرێت، ئەوا نرخ و بەها و جوانی لەدەست دەدات. ئاواکاریم لە کاربەدەستانی کوردستان ئەوەیە کە پێویستە پسپۆڕان ئامادە بکرێن بەتایبەت بۆ هونەری "پیشاندان". پێویستە هۆڵی گەورە لەسەر ئاستی بنەما نیونەتەوەییەکان دروست بکرێت و کەسانی شارەزا لەو بوارەدا بەڕێوەی بەرن، پێویستە هەوڵی گزرپنەوەی هونەری بکرێت لەهەموو بوارەکاندا و لە سنووری کوردستان دەربچێت و بەرەو بە جیهانیکردن بڕوات. زیاتر هەوڵ بدرێت گەنجان و بەهرەمەندان گزش بکرێن و بودجەی تایبەتییان بۆ تەرخان بکرێت، کەرەستەی پێویستیان بۆ ئامادە بکرێت و ئاسانکارییان بۆ بکرێت و لە ڕێی پسپۆڕانەوە ڕێگەی ڕاستییان نیسان بدرێت. هەوڵ بدرێت بایەخێکی زیاتر بە هەڵسەنگاندن و لێکۆڵینەوە و خوێندنەوەی کارە هونەرییەکانی کۆن و تازە، بدرێت، کارەکان لە لەناوچوون بپارێزرێن. پێویستە هونەرمەندان بنێردرێن بۆ دەرەوە و خولی تایبەت ببینن لە زۆربەی بوارەکاندا بە تایبەتی خولی پاراستنی کارە ڕەسەنەکان و خولی تەکنیکی دروستکردنی کەرەستە هونەرییەکان بۆ ئەوەی لە داهاتوودا، پشت بە خۆمان ببەستین و بتوانین داهێنەری کەرەستەی خۆمانی بین. بە ڕاستی لە داهاتوودا دەبێت زۆر کار بکرێت بۆ پێشخستنی هونەر چونکە لەمەوپێش هونەرەکەسمان وەک خۆمان لە زیندانیدا بوو، بەڵام ئێستا کاتی کارکردنە بە گوڕ و بە جۆشەوە بۆ ناساندنمان بە هەموو جیهان کە ئێمەش هیچمان لە نەتەوەکانی تر کەمتر نییە، بەڵکوو هونەرێکی دەوڵەمەندیشمان هەیە.

هەڵکەوت: ئاستی ئەمڕۆی هونەری کوردی چۆن دەبینیت؟

وەڵام: ئاستی هونەری کوردی سەرەڕای ئەو هەموو نەهامەتیانەی کە بەسەر هونەرمەندی کوردیدا هاتووە، هەردەم بەرزبووە بەڵام بەهۆی باری نائارامی ناوچەکەوە، لە چوارچێوەیەکی داخراودا ماوەتەوە واتە نەبینراوە، من بەداخەوەم کە هەتا ئێستاش بەپێی پێویست نابینرێ و گرنگییەکی ئەوتۆی پێ نادرێ.

هەڵکەوت: دیدی ئێوە چییە بۆ هونەری ئەکادیمی بۆ هونەرمەند و بۆ ئەو کەسانەی کە بە ڕەوتێکی دیکە کاری هونەری دەکەن؟

وەڵام: هونەر بەهرەیە، زۆر هونەرمەند هەیە کە ئەکادیمیای نەخوێندووە بەڵام پایەی بەرزی هونەریان نیشاندراوە بە پێچەوانەشەوە هەموو ئەکادیمییەک نابێت بە هونەرمەند. ئەوەی کە ئێستا لە کوردستان دەبینرێ، سەرلێشێواوی لەخۆ گرتووە بەهۆی کەمی هەڵسەنگاندنەکان و کارکردنی بێ بنەما و کەمی چاودێران و پسپۆڕان، پێویستمان بە کاری زۆر و پاڵپشتی بەهێزی کاربەدەستانی کوردستانە.

هەڵکەوت: کۆمەڵگای کوردەواری کاری هونەری چۆن هەڵدەسەنگێنێ، بە تایبەتی لە کاتی کردنەوەی پێشانگاکاندا؟

وەڵام: کۆمەڵگای کوردی هونەردۆستە و زۆر بە جۆسەوە بەرەوپیری هونەر دەڕوات، بۆیە دەبینی بینەرێکی بەرچاو لە پێشانگاکاندا بەدی دەکرین، بەڵام هەڵسەنگاندنی زانستییانەی کەمە، لە ڕاستیدا من بۆ ماوەی 8ساڵە دوورم لە وڵات، ناتوانم بە تەواوی وەڵامی ئەم پرسیارە بدەمەوە، بەڵام بەداواچوونێکی زۆرم هەیە لە ڕێگەی کەناڵە ئاسمانییەکانەوە، هەڵسەنگاندنێکی زانستییانەی ئەوتۆم بەرچاو نەکەوتووە، کە جێی داخێکی زۆرە لەوانەشە کەموکووڕی ڕاگەیاندنەکان **بۆ لاپەڕەی ٦**

لێپێچینەوەی بینەران یاخود گەشتی خود

دانا ڕۆوف

شانۆنامەی: لێپێچینەوە Interrogations
نووسین، نواندن و ڕێژی: یۆشی ئۆیدە Yoshi Oida
شانۆی: خانوبەرەی کولتووری
Kulturhuset , Hörsalen



قوتاربوونی گیان، قوتاربوونی خود و گەڕانەوەی خودی مرۆ بۆ سەنتەری پرسیار و وەڵامە بێکۆتاییەکان. ئەم بەڵەسەلانە کۆمەڵێ پرسیاری گەوهەری و چەقی پەشێکە لە شانە گرنگەکانی ئاینە کۆنە خۆرهەلاتییەکان. بۆ نموونە ئایینی"بوودیزم"، کە یەکێکە لە دێرینترین پەیامە ڕۆحیەکانی جیهان، زۆر بە قوواڵی ئاماژەی ئەم مەسەلانە دەکات. پرسیارەکانی خودی مرۆڤیش هەمیشە سەرچاوەیەکی گرنگی بیری فەلسەفی، ئەدەبی و شانۆیی بووە و ڕۆڵێکی گرنگی گێڕاوە لە فەلسەفە و شانۆی هاوچەرخی جیهاندا. هونەرمەندی یاپانی"یۆشی ئۆیدە" بۆ چەندین جار، لە پرۆژە و بەرهەمە هونەرییەکانیدا، گەڕاوەتەوە سەر ئەم سەرچاوە ڕۆحییە و سوودی لێوەرگرتووە بۆ دەوڵەمەندکردن و ڕۆچوونە خوارەوەیەکی قوواڵی ئەزموونە هونەرییەکەی. سەرەتا هونەرییەکانی"یۆشی ئۆیدە" لە یاپانەوە و لەگەڵ "یوکیو میشیما" ١٩٢٥ - ١٩٧٠ دەست پێ دەکات و لەگەڵ"پیتەر بروک" یش دەگاتە ئاستی تڕۆپک. یوکیو میشیما ڕۆمان نووس، شاعیر، شانۆنامەنووس و ڕێژیسۆری شانۆ و سینەما بووە و کاریگەرییەکی قوواڵی لەلای یۆشی ئۆیدە بەجێهێشتووە. ئەم نووسەرە وەک پسپۆرێکی ڕاستەقینەی شانۆی"نو" کارێکی ڕاستەوخۆی کردۆتە چۆنییەتی هەڵسوکەوت، کاردانەوە و بەکارهێنانی دەنگ و سیمای دەموچاوی. شانۆنامەی لێپێچینەوەش دوا بەرهەمی ئەم هونەرمەندەیە و لە سەردانێکدا بۆ سوید و شانۆیەکی بۆش لە بەردەم بینەراندا ڕاست بۆتەوە. دیدی پیتەر بروک و پانتاییە بۆشەکان سیمایەکی گرنگ و ڕاستەوخۆی ئەم شانۆنامەیەیە. ئەم هونەرمەندە یاپانییە ئەکتەر، ڕێژیسۆر، سەمازان و کۆریۆگرافە و بۆ ماوەی زیاتر لە چل ساڵ، وەک ئەکتەر لەگەڵ"پیتەر بروک" کاریکردووە. لە زۆربەی پرۆژە و کارە گەورەکانی پیتەر بروکدا بەشداریکردووە، بۆ نموونە کۆنفرانسی باڵندەکان، مەهابا هاراتا، ئیسک، چیرۆکی ئەو پیاوەی ژنی خۆی لێ دەبێتە شەبقەیەک، کێ لەوێیە، هاملێت و چەندەها پرۆژەی تر. سەرەتای ڕەوتی هونەری"یۆشی ئۆیدە" لە داب و نەریتی شانۆی"نو"ی یاپانییەوە دەست پێ دەکات. دواتر لەگەڵ یوکیو میشیمادا ئەزموونە شانۆییەکەی لە بواری نودا زیاتر چەمکێکی فەلسەفی و ئیستاتیکی لەخۆ دەگرێت. شانۆی"نو" سەرەتای ئەو کاروانە دەبێت و ئەو ئەزموونەش دەبێتە دەروازەیەکی دەوڵەمەندی پرۆژە ئەزموونگەرییەکانی لەلایەک و ڕووبەڕووبوونەوەشی لەگەڵ شانۆی ئەوروپی لەلایەکی دیکەوە. خاڵی گۆڕانکارییەکانیشی، لە ژیانی هونەری ئەم هونەرمەندەدا، دەگەڕێتەوە بۆ حەفتاکانی هەزارەی ڕابردوو. دوای چەندین ساڵ لە کاری بەردەوام و تەقەلای قوڵبوونەوە بە پانتاییەکانی شانۆ"نو" و شانۆی مۆدێرنی یاپانیدا، لە ساڵی ١٩٧٩دا پیتەر بروک دەبینێ. ئەو یەکتر بینینە دەبێتە هۆی بە ئەنجام گەیاندنی چەندین پرۆژە و کاروانەکەش تا ئێستاش هەر بەردەوامە. لە شانۆنامەی"لێپێچینەوە"دا "یۆشی ئۆیدە" شوێن پێی پیتەر بروک هەڵدەگرێ و بەدوای گەوهەر و فەلسەفە ئیستاتیکییەکەی پانتاییە بۆشەکاندا دەگەڕێت. بۆ ئەم مەبەستەش دەگەڕێتەوە بۆ وانە و بینەماکانی ڕێبازی فەلسەفەی"زن" و جیهانە نهێنی و **بۆ لاپەڕەی ٦**

کورتەیەک لەسەر مێژووی مۆسیقای کوردی



ناسر رزازی

بەشی حەوتەم - کوتایی

لە "کتێبی ئەلتاج"دا گوتراوە: بۆ ئەو چیرۆکبێژ و ژەنیارانەی کە بەسراوەتەوە بە دەربارى ساسانییەوە، مەسەلەیە بنە و بنەچە، یان تۆزە و سۆلان، گرنگ نەبووە، مەسعوودیش لە "مروج الرهب"دا، ئاماژەی بەم مەسەلەیە کردووە، بەلّام هەر بەو قسانە و بەو دژایەتییانەی نێوان "نەکیسا" و "باربەد"دا، دەردەکەوێ کە لە دەربارى ساسانیانیی بە ریشە کورددا، لە نێوان گۆرانییبێژ و چیرۆکبێژ و مووزیککارانداو پرسگرێکی زمان، پرسگرێکێکی گرنگ بووە، چونکە زمانی کوردیی زمانی تەنیا دەربار بووە و زمانی ڕەسمی دەسەلاتەکە فارسی بووە. "نەکیسا" لە بەیتبێژییدا ئەوەندە زەبەردەس بووە کە "باربەد" حەسوودیی پێ بردووە. لەبەر ئەم هۆیەش، لەنێوان ئەو و "باربەد"دا هەمیشە دژایەتی و ململانێ هەبووە. ساسانییەکان کورد بوونە و پاتەختیان لە کرماشان بووە و لە تەوای کوردستانیش حکوومەتیان کردووە، "نەکیسا"ی گۆرانییبێژیش کورد و خەڵکی کرماشان بووە و لە مووزیکارە کوردەکانی ئەو سەردەمەیە. مەقامی خەسرەوانی، پالیزبان، چەکاوەک و جامەدڕان، کە تەنیا چەکاوەک و جامەدڕانی لە ناو مووزیکی فارسیدا ماوەتەوە و لە سەرەوە ئاماژەم پێ کرد، لە بەرهەمەکانی "نەکیسا"ن!

لێرەدا بە پێویستی دەزانم کە لە پێوەندیی لەگەڵ ئەم کورتە باسە، سەفەری "هێنری باییندێر"تان بۆ کوردستان بۆ بگێڕمەوە کە گەڕۆکێکی فەرانسەیی بووە کە سەردەمی "ناسرەدین شا"ی قاجار چۆتە کوردستان!

"هێنری باییندێر" لە کتێبی "کوردستان، بین النهرین و ایران"١ کە لەبەنەمادا بە فەرانسەیی نووسراوە و وەرگێڕدراوەتە سەر زمانی فارسیی، بەلّام من بڕوام بە فارسییەکە نەکرد و هاوڕێیەکی کوردم کە فەرانسەیی دەزانێ و ئەم بەشەی بۆ وەرگێڕامە سەر کوردیی، دەڵێ: کاتێک کە سەعات سێی دوای نیوەڕۆ بۆ ئوتێلەکەمان گەڕاینەوە، نەماندەزانی چ بکەین، تا ئەوەی یەکێک پێشنیازی کرد بمانبا بۆ لای سووسمانلییەکان٢ کە لە دەروازەی تاراندا چادریان هەڵداوە، سووسمانلییەکان کە تیرەیەکن و لە ناوچەیەکی کوردستانی هاوسێی کرماشان دەژین، ناودارترین و بەنێوبانگترین سەماکەریان تێدایە، ئێمە بە "ئەسفەهان" و "شیراز"دا کە سەماکانیان شەرافەتمەندانەترن٣، تێپەڕیووین، بێمەیل نەبووین بەرلەوەی کە ئێران بەجێ بێڵین، بۆ تەماشای ئەم جۆرە سەمایەش بڕۆین. لەماوەی چارەکە سەعاتێک ڕێگە، لە شارەوە بۆ ئەوێ، ئەو کەسە بردینییە ناو چادرێکەوە، لەوێ پیرەپیاوێک هاتە پیریمانەوە و دایتاین، چوارمشقی لەسەر قاڵی دانیشتین و چای و قاوەیان بۆ هێتاین، دوای چارەکە سەعاتێک، سێ نەفەر مووزیکار هاتن و لە بەرانبەرمانەوە دانیشتن، ئورکێستر بریتی بوون لە کلارنێتێک و دایرەیەک و زەربێک. یەکەم سەماکەر دەرکەوت، مووزیکەکە لەپێشدا هێور و ئاوازەکەش لەسەرەخۆ بوو، سەماکە بریتی بوو لە مەنەر و جمینی پەیتاپەیتای لەش و زک و مل، کە زۆر زەریف و جوان ئەنجام دەدرا. ڕەنگی لیباسی سەماکەرەکە ڕازاوە و دامەنێکی درێژی بەنین بوو کە پووزەکانی دادەپۆشی، لەبەر ئەوەی کە ژێرکراسیی لەبەردا نەبوو لەشی لەژێر دامەنەکەوە وێنەنوێن بوو. کراسێکی لەبەر بوو کە لە کەمەرییەوە بۆ سەرێ، گوڵڕەنگ و نوقرەدۆزی بوو، لە خواریشەوە هەموو لەشی لەژێرەوە دیار بوو. سینە و شانانی ڕووت بوون. چارشێوێکی بەسەرەوە بوو کە بۆ پشتەوە دالڕسکە کرابوو و جاروبار بەسەر دەموچای دادەدا. بەشوێن ئەودا سەماکەری دووەەم هاتە پێش، جلوبەرگیان تارادەیەک لەیەک دەچوو، دوایی ئاواز و کێشی مووزیکاکە کزۆ و بەتەوژمتر بوەوە، سەماکەری یەکەم لەگەڵ دووەەمیدا یەکی گرت، مەنەر و جمینەکان هەرچەند لەبنەڕەتەوە دوور بوو لە نزاکەت، بەلّام نەرم و ناسکتر دەبووەوە. زەریفی و ڕاکێشانی هونەری ڕاستەقینەی سەماکەرەکان دەبووە هۆی ئەوە کە ئینسان چاو لەو حاڵەتانەی کە شەهوەتی هەڵدخراند بپۆشێ، هەرچەند بەێ ئەو حاڵەتانە سەماکە خۆش نەدەبوو و ئینسان نەیدەتوانی بە دیتنیان هەڵ بکا. دوو سەماکەری دیکە هاتن و تێکەڵیان بوون. من بەڕاستی حەپەساببووم، چونکە لەو سەفەرە جۆربەجۆرانەیدا کە بۆ هیندووستان و چین و ئوقیانووسیەم کردوون، چوومەتە تەماشای سەمای لەم چەشنە، بەلّام ئەوانە ئەم خاسییەتانەیان نەبوو، حاڵەتێکی بێشەرمانە و تووڕەیان هەبوو، کە هەڵخڵەتێنەر و ناشیرین بوو، بەپێچەوانەوە سەمای سووسمانلییەکان لەم هونەرەدا، نەزمێکی ڕاستەقینەی هەبوو کە سەرگەرمییەکی لەبەردڵانە بۆ کچان و لاوان.دیمەنی دوایی خراپ بوو، بەشوێن سەمای ئەم ژنە گەنج و زەریفانەدا، سەمایەکی دیکە پێشکەش کرا کە یەکجار پەسەندی ڕۆژهەلاتییەکانە، بەلّام بۆ ئێمە خۆش نەبوو و لێی گێژ بووین، دەستەیەکی دیکەی سەماکەر هاتنە جێی ژنەسەماکەرەکان کە لیباسی ژنانەیان لەبەردابوو، قژی شۆڕی پەلکەکراویان کە بەسەر شانانیاندا هاتبووە خوارێ، هەروەها ئەو سەرنجەش کە لە ئاڕایشکردنی ژنانەیاندا بەکار برابوو، نەرمی ماسوولکەکانی لەشیان، لەگەڵ ژنی ڕاستەقینە، وەدڕۆی دەخستنەوە، ئەمانە سێ کەس بوون، سەماکردنیان یەکجار زیندوو بوو، بەلّام ئەوەندەی نەکێشا کە شێوەیەکی تووڕە و یاخی بەخۆیەوە گرت و پەم چەشنە خۆشی و گەشی بەشی یەکەمی سەماکەیان لەناو برد. لەبەر ئەوەش پاداشێکی گەورەمان بە هونەرپیشەکانی ئەم سووڕە بچووکە دا کە تەنیا لەبەر ئێمە، جیا لەو کۆمەڵە خەڵکەی کە لەبەر دەرکە ئاپۆرەیان بەستبوو، پێشکەشکرا، زۆریان خۆشەت کردین و بەگەرمییەوە بەڕێیان کردین، لەبەر ئەوەش کە شەو و تاریک داهاتبوو، ویستیان بە تۆپزی ئاگرەوە بکەونە پێشمان و بمانهێنێتەوە شوێنی خۆمان، بەلّام من بە چاوساغەکەمانم گوت کە پێیان بڵێ: لێمان گەڕێن با بەبێ ئەم تەشریفاتە بگەڕێینەوە!

ئەگەر سەرنجی ئەم نووسینە بدەی کە ئەم گەڕۆکە باسی دەکا، جوان دەردەکەوێ کە کورد لە کۆنەوە چی ئازادییەکی هەبووە و چۆن هەنگاوی هەڵگرتووە بۆ پرسگرێکی هونەر، بەلّام دواتر بەناوی دەسەلاتی حاکم تۆمار کراوە! خەڵکی کورد دەبێ ئەمەی بەلاوە گرنگ بێ و بیزانێ کە چونکە کورد بێ کیان بووە، لە شوێنەواری کۆنەوە بگەڕێ، هەتا دەگاتە گۆرانیی و دیاردەکانی دیکەی ئەم گەلە داماو و چەوساوەیە، بە دەستی نەتەوەی بالادەست لە عێراق و سووریا و تورکیە و بەتایبەت ئێراندا، دزراوە و بەتاڵان براوە. لەبەر ئەوەی کە کورد نەتەوەیەکی بندەست و بێخاوەن بووە، کەوتۆتە بەر شالاو و پەلاماری هەموو جۆرێکی تواندنەوە و لەناوبردن. بۆ نموونە: "عارف قەزوینی" گۆرانییبێژی فارس، لە لایەن حوکوومەتی قاجارەوە، هەڵدڕاوەتە کوردستان و بەسالان لە شاری سنە ژیاوە و لەوێ دەسبەسەر بووە! لەوێ مێژدی گۆرانیی کوردیی کۆکردۆتەوە و هێناویەتەوە بۆ تاران و خوێندوونی و هیچکاتێکیش نەیگوتووە ئەو مێژدییانە کوردین! بەهەرحاڵ دەبێ ئەوە بزانین کە زۆرشتمان لەلایەن حوکوومەتەکانی ئەو سەردەمەوە بەتاڵان براوە! ئێمە دەبێ وەریانبگرینەوە و ببینەوە بە خاوەنیان، چونکە مولکی کوردن! **کوتایی** ■■■

لەندەن ٢٠٠٠/٤/١٢

١- ئەم کتێبە لەلایەن (کرامت الله أفسر)ەوە کراوەتە فارسی، بەلّام لەبەر وشکەڕۆیی مەزهەبییەوە ئەوەندە وشکەڕۆ نییە و ئەو ئازادییەی ژنی کورد هەیەتی هی ئەوان نییانە، سەمای ئەو سووسمانلییانەی بە سەمایەکی ناشەرافەتمندانە داناوە!

٢- کابرای وەرگێڕ، ناوی ئەو تیرەیەی بە هەڵە نووسیوە: سوسمانلی! لە کاتێکدا "سۆزمانی"یان پێ دەگوترێ نەک سووسمانلی. سۆزمانییەکان لەبەر ئەوەی کە تیرەیێکی ئازا و کراوە و دەوارنشین و کۆچەریی بوونە و شەرمیان لە هیچ نەکردووە و ژیانیان لە ڕێگای سەما و هەڵپەڕکێ و گۆرانییەوە گوزەراوە، لە کوردستان بە داخەوە بەدناو بوونە، لە کاتێکدا خاوەن هونەر و ئازاش بوونە، بۆیە لە کۆندا کچێک ئەگەر ویستبێتی سەمای لەو شێوەیە بکا، یان کراوە بووبێ و حەزی لە مۆسیقا و سەما و گۆڤەند کردبێ، پێیان گوتووە: "سۆزمانی".

٣- کابرای وەرگێڕ، ناوی ئەو تیرەیەی بە هەڵە نووسیوە: سوسمانلی! لە کاتێکدا "سۆزمانی"یان پێ دەگوترێ نەک سووسمانلی. سۆزمانییەکان لەبەر ئەوەی کە تیرەیێکی ئازا و کراوە و دەوارنشین و کۆچەریی بوونە و شەرمیان لە هیچ نەکردووە و ژیانیان لە ڕێگای سەما و هەڵپەڕکێ و گۆرانییەوە گوزەراوە، لە کوردستان بە داخەوە بەدناو بوونە، لە کاتێکدا خاوەن هونەر و ئازاش بوونە، بۆیە لە کۆندا کچێک ئەگەر ویستبێتی سەمای لەو شێوەیە بکا، یان کراوە بووبێ و حەزی لە مۆسیقا و سەما و گۆڤەند کردبێ، پێیان گوتووە: "سۆزمانی".

بینەرانی فیلمی(کیسەڵەکانیش دەتوانن بفڕن): ئەم فیلمە ڕای خەڵکی لەبارەی شەڕی ئەمریکا لە دژی عێراق گۆڕی



PNA - فیلمی "کیسەڵەکانیش دەتوانن بفڕن"ی هونەرمەند بەهمەنی قوبادی لە ڕاوەرگرتنی سایتێکی بەناوبانگی جیهانیدا بە فیلمێکی نایاب وەسف کرا. سایتی **E-film-Cri** کە سایتێکی تایبەتە بە ڕەخنەگرتن لە فیلمە جیهانییەکان، ڕاپرسیەکی لە بارەی فیلمی "کیسەڵەکانیش دەتوانن بفڕن"ئەنجام داوە. بە پێی ڕاپرسییەکە ٦٩/٧٪ خوێنەرانی سایتەکە پێیان وایە فیلمی کوردیی "کیسەڵەکانیش دەتوانن بفڕن" فیلمێکی نایابە و تەنها ٣٪ پێیان وایە فیلمێکی خراپە. لەوبارەیەوە سایتەکە نووسیویەتی کە ئەم فیلمە دید و بۆچوونی بینەر لەمەڕ شەڕی عێراق دەگۆڕی بە تایبەتی ئەوانەی دژی ئەم شەڕەن. ئەم فیلمە وێنەیەکی جیاواز لەبارەی عێراق پێشان جیهان دەدات. فیلمی "کیسەڵەکانیش دەتوانن بفڕن" تا ئێستا چەندین خەڵاتی گەورەی نێودەوڵەتیی بەدەست هێناوە.

درامانووسانی جیهان

مەهدی مجید جاف

٣٤- ئارتەر میلەر

Arthur Miller



درامانووس، سیناریۆنووس و چیرۆکنووسی بەناوبانگی ئەمەریکی ئارتەر میلەر لە١٧ی ئۆکتۆبەری١٩١٥دا، لە شاری نیویۆرک لەدایکبووە. باوکی خاوەنی کارخانە و دایکی مامۆستا دەبێت. لە دارمانی بارێ ئابووری لە ئەمەریکادا باوکی تووشی هەرەس دەبێت و ژیانیان بە گیر و گرفتەوە بەرێ دەچێت، میلەر بە ناچاری دەست لە خوێندنی ناوەندی بەردەدات و بۆ دابینکردنی ژیان کاری جۆراوجۆر دەکات. لە ماوەی دوو ساڵ و نیودا، هەفتەی13دۆلار پاشەکەوت دەکات بە هیوای ئەوەی کە لە زانکۆ دریژە بە خوێندنەکەی بدات. لە نەنجامدا لە زانکۆی میشیگان لە بەشی ڕۆژنامەگەریدا وەردەگیرێت و دەست بە نووسین دەکات. لە ساڵی١٩٣٨دا، خوێندنەکەی تەواودەکات و بۆ نیویۆرک دەگەڕێتەوە و دەست بە نووسینی شانۆنامەدەکات، سەرەتا شانۆنامەی بۆ ڕادیۆ دەنووسێت. شانۆی ئەمەریکی قۆناغی تەمەنی نەوەیەک دەبێت کاتێک کە تێنسی ولیامز و ئارتەر میلەر لە ناوەڕاستی ساڵانی١٩٤٠دا، شێوەیەکی نوێ و داهێنەرانە دەهێنە مێژووی شانۆی هاوچەرخی ئەمەریکییەوە و ئەم کۆششەیان تا ساڵانی١٩٩٠، درێژە دەکێشێت. لە ساڵی١٩٤٤دا، شانۆنامەی"پیاوێکی تەواو خۆشبەخت"دەنووسێت، دوای ساڵێک چیرۆکێک بە ناوی"فۆکوس"بڵاودەکاتەوە. لە ساڵی١٩٤٧دا، شانۆنامەی بەناوبانگی"هەمویان کۆرمن"ی نووسی. لەساڵی١٩٤٩دا، شانۆنامەی"مردنی فرۆشیارەکە"دەنووسێت، بەقسەی میلەر خۆی، ماوەی ١٠ساڵ پیری بە نووسینی ئەم شانۆنامەیە سەرقاڵ دەبێت. پاش بڵاوکردنەوەی میلەر ناوبانگ دەردەکات و خەڵاتی نەبەی پۆلیتزەری پێدەبەخشرێت. لە ساڵی١٩٥٠دا، شانۆنامەی"دوژمنی گەل"ی هێنرێک ئیبسن بۆ یەکێک لە شانۆکانی "برادوای" ئامادە دەکات. لە ساڵی١٩٥٣دا، شانۆنامەی"گالگەوەکانی شاری سالیم" دەنووسێت و لە ساڵی١٩٥٥دا، شانۆنامەی "نیگایەک لە پردەوە" بڵاودەکاتەوە. لە ماوەی قەیرانی سیاسی کە بە سەردەمی"مەککارتی" لە ئەمەریکادا ناسراوە، لە ژێر ناوی کۆمیتەی دژی ئەمەریکایی و پێشگیری لە دەسەلاتی کۆمۆنیستی، میلەر هەر وەک چەندانی تر لە هونەرمەندان و نووسەران تاوانبارەدەکرێت. لە ساڵی١٩٥٦دا، میلەر ئەو تاوانە ڕەت دەکاتەوە. لە هەمان ساڵدا لە هاوسەرێ یەکەمی جیادەبێتەوە و "مارلین مۆنرۆ"ی هونەر پێشەی بەناوبانگی سینەمایی دەخوازێت و پاش چوار ساڵ لە یەکتر جیادەبنەوە. لە شانۆنامەی"لە پاش تێکچوون"دا میلەر لەو مەسەلەیە دەدوێت. لە ساڵی١٩٦٠دا، سیناریۆی سینەمایی"ناجۆرەکان" و لە ساڵی١٩٦٤دا، شانۆنامەی"ڕووداری دەرێشی" و لە ساڵی١٩٦٥دا، کۆمەڵەکورتە چیرۆکێک بە ناوی"چیتر پێویستم بە تۆ نییە" دەنووسێت. لە ساڵی١٩٦٨دا، شانۆنامەی "نرخ"دەنووسێت و لە هەمان ساڵدا لە شاری لەندەن لەسەر شانۆ پێشکەشی دەکرێت. لە ساڵی١٩٧٦دا، فیلمنامەی"ئورکێستڕای ژنانی تاشڕیش" بڵاودەکاتەوە. لە ساڵی١٩٨٧دا، ژیانناەمەی خۆی لە دووتوێی کتێبێکدا بڵاودەکاتەوە. میلەر ئەمڕۆ لەگەڵ هاوسەرەی سێیەمی کە ڕێتەگرێکی هەڵاتووی سەردەمی شەڕی ڤیەتنامییە، دەباتەسەر. ■■■

www.kurdistan.org

رۆشنبیر و بەرەی کوردستانی

کوردستانی رۆژهەلات ـ ئارتیکا کورد

پێشکەشە بە : رۆشنبیری نەتەوەیی کورد ـ شەهید سەعید یەزدانپەنا کە پێکهاتنی بەرەی کوردستانی یەکێ لەخەونە گەورەکانی بوو.

پێم وایە، کەم نەتەوە لە جیهاندا هەبێ، ژیانیان، خەباتیان و.. هتد لە نەتەوەی کورد بچێ. ئێمە بەرلەوەی لە ئاستی فەرهەنگی و کولتووریيەوە لە (ئازادی ونرخەکەی) بگەین، بە ناوی خەبات بۆ ئازادی هاتینە مەیدانێکەوە کە زانیارییەکی ئەوتۆمان لە هەوراز و نشێوی مەیدانەکە نەبوو چەکمان هەڵگرت و لە پێناوی (خودموختاری) خاوێنترین نەسلمان قوربانی کرد و دەسکەوتێکی ئەوتۆ کە لەگەڵ هەزینە ئینسانی، ئابووریەکاندا بەرانبەری بکات. نەسیبمان نەبوو، بەربەستی ئۆردوگای سۆسیالیزم بووین، بێ ئەوەی لە بارودۆخی نیشتمان، وڵات و ناوچەکە ئاگادار بین، لە لایەکەوە جەوهەرێکی چەپ رەوانەمان پەسند کرد و لەلایەکی دیکەشەوە هەوڵی فریودانی نەتەوەکەمان دا، کە گوایە دەمانەوەێ بە شێوەی ئازادی زامەکانی بتارێنین، دەرفەتە میژوویيەکانمان سوتاند، بە راستی کەس وەکو ئێمە لە دەرفەت سووتاندا هونەری نیە. بە ناوی نەتەوە خوازییەوە بەرەو خەبات بووینەوە، بێ ئەوەی سیستەمە کۆیلەساز و جاش پەروەردەکان تاووتوێ بکەین خەباتێکی پڕ قوربانی و... هتد. کوێرە ڕێگا پێو بووین و شایەتی فیدا بوونی باشترین ڕۆلەکانی وەتەنمان. بەسانایی بە پیری پلانی تیرۆریستانەوە ڕۆیشتن، بەسانایی ناڤدارەکانمان بە خاکی غوربەت ئەسپارد و لەهەمان حاڵیشدا بەسانایی (نەیار) مان لەباوەشی خۆماندا بەخێو کرد. وەرە چاو لە کاروانی گەڕاوەکانی سەنگەر و هەڵاتوان بەرە و ئەورووپا و ئەمریکا بکە، بە ڕاستی ئەو کارەساتانە ڕیوایەت لە چ ژانێکی میژوویی دەکەن؟

هێشتا مەترێک زەوینی خۆمان لە ژێر دەستدا نەبوو، براکوژیمان تۆمار کرد. هێشتا پارەی رادیۆ و چاپەمەنیە تەکنۆلۆژیا رزیوەکانمان لە گیرفانی خۆمانەوە دەرنەهات ، بەملیۆنان تۆمەت و تاوانمان ئاراستەی یەکترکرد، هەر چین و تۆێژەکانی کۆمەڵگا، پشتیوانی ڕاستەقینەمان بوون،ئەوانیشمان لەخۆمان دوور خستەوە، ئەگەر سەردەمێک بەندیخانەکانی ڕژێم هەشتا لەسەدی زیندانی سیاسی بوون ئێستا ئەوەشمان گۆڕی و نەوەد لە سەدی بووە بە تلیاکی و دزو چەتە. ئەگەر جاران لە سەدا یەکی لاوان تلیاکی و... بوون ئێستا ڕێژەکە یەکجار زۆربووە، هێشتا لە گوێچکەی گادا خەوتووین ئێستاش سەرلێشێواوتر لەجاران مەودای دیالۆگ. پراکتیکمان هەزاران کێلۆمەترە.. سەیر لەوەدایە هەر هەموومان

باس لە یەکێتی و تەبایی دەکەین کەچی هەنگاوێک، کە ڕۆژێک تەمەنی بێ هەڵناگرین. سەری ئێوە سەلامەت. ئەگەر ڕووداوی ڕفاندن و گرتنی (عبدولاتوجالان) و بارودۆخی ١٤ ساڵەی ئەخیری کوردستانی باشور نەبایە، دڵنیا بن ئەمڕۆ کوردستان بوو بوو بە عەجەمستان ئێستاکە... جێبەجێکردنی:

١ـ پرۆژەی ڕۆژهەلاتی ناوێنی گەورە لە لایەن ئەمریکاوە لە ئارادایە.

٢ـ ئیسلامی سیاسی تڕۆ بووە.

٣ـ دیکتاتۆرییەت هەرەسی هێناوە.

٤ـ کێشەی کورد لەباشور خەریکە بەرە و چارەسەریکی یەک جارەکی دەڕوات.

٥ـ بەجیهانیبوون بەخێراییەکی پتە و خەریکە پەل و پۆ دەهاوێژێ وسەقامگیر دەبێت.

٦ـ هێماکان بەزەقی ئاماژە بە شانۆی شەڕی نێوان ئەمریکا. ئینگلیز لەگەڵ ئێران دەدەن کە لە ڕەونەق و شکۆ کەوتۆتەوە.

٧ـ ناسیۆنالیزم بوو بە (گفتمان) ی زاڵی نێو کۆمەڵگا.

٨ـ مافی مرۆڤ بووە بە قسە و باسی سەرەکی ڕۆژانە لە جیهاندا..هتد،،

دەخوازێ ڕۆشنبیرانی ڕاستەقینە، چ ڕۆشنبیرانی ناوخۆ، چ پێشمەرگەی ڕۆشنبیر، یان ڕۆشنبیرانی تاراوگە بە هەموو شێوەیەک بیر لە خولقاندنی زەروورەتێک بە ناوی (بەرەی کوردستانی) بکەنەوە چونکە ئەم پلاتفۆرمە لە کاتێکی ئاوا هەستیاردا، دەیان دەسکەوتی نەتەوەیی لێ دەکەوێتەوە، ڕۆشنبیران دەبێ لەگەڵ لایەنەکان بەتایبەت.

١ـ حزبی دیموکراتی کوردستان ـ ئێران

٢ـ یەکێتی شۆڕشگێرانی کوردستان

٣ـ کۆمەڵەی زەحمەتکێشانی کوردستانی ـ ئێران

٤ـ پەژاک

کە ئامانجی سەرەکی هەرچوار لایەنیان سۆسیالیزمە و هەڵگری ڕۆحێکی نەتەوەیین وتوێژ بکەن و تەنانەت پێشنیاری پێکهاتنی پارتێکی نوێ لەڤێرناوی"پارتی سۆسیال دیموکراتی کوردستانی ڕۆژهەلات" ئاراستەی نوێنەرانی هەرچوار لایەنەکە بکەن. هەڵبەت هەواڵەکانی ئەم دواییە موژدەیەکی خۆشی پێیە، چونکە هەرچوار لایەن هۆگریان بە پێکهاتنی بەرەی کوردستانی دەربڕیووە و ئیراد لەسەر بنەماکانی بەرە نییە، ئێنجا ئەگەر ئەو چوار پارتە بە (توافق) گەیشتن، لایەنەکانی دیکە. بێجگە لە ئیسلامیەکانیش ناچار دەبن، بێنە ڕیزی بەرەی کوردستانی یان پارتی نوی. بێگومان ئەگەر ڕۆشنبیران لە ئاوەها پرۆژە یەکدا سەربکەون، سەربەرزی وشانازییەکی میژوویيان بۆ خۆیان وەدەست هێناوە بۆ هەتاهەتایە لە دڵی نەسڵەکانی گەلدا زیندوو و سەربەرز دەمێنەوە.

دەسکەوتەکانی پێکهاتنی بەرەی کوردستانی:

١ـ کۆکردنەوە، کۆبوونەوەی هێزە سیاسی، سەربازی، مادی تەبلیغییەکان لە یک ناوەندا.

٢ـ ئاشتی نەتەوەیی،

٣ـ بەرزبوونەوەی پلەی سیاسی، دیپلۆماسی لە دەرەوەی وڵات،

٤ـ دڵخۆشبوونی جەماوەری گەلەکەمان لەناوەوە و دەرەوەی وڵات،

چ شوورەییەک لەوە گەورەترە کە ئەمڕۆ بزووتنەوەی نەتەوەیی کوردستانی ڕۆژهەڵات خاوەن سەتەلایتێک نییە.

بەهیوام هەنگاوی ڕۆشنبیران زەمینە بۆ دیالۆگی ڕاستەقینەی پارت و لایەنەکان بە تایبەت چوار لایەنی ناوبراو خۆشبکەن و گەل بە موژدەی پێکهاتنی "بەرەی کوردستانی" یان پارتی نێوبراو، خەم و ئازارە قورسەکانی بڕەوێتەوە.

بێ شک گەر ئەو بەهارە ڕسکا، یەکگرتنی چەک و قەڵەم، کوردستان لە ژێر پێی داگیرکەراندا دەکات بە ئاگرستان و تۆێژەکانی خەڵک لەباتی پارانەوە و چاوەڕوانی بێهوودەی ئەمریکا. ئینگلیز بە هانای ڕۆڵە وشیار و یەکگرتوونیەوە دێن و لە چ پشتیوانیەک دریغ ناکەن. ئەگەریش پرۆژەکە سەرنەکەوت، ڕۆشنبیران بە گوێدان بە حەقیقەت خوازی وەک خەسڵەتێکی سەرەکی ڕۆشنبیری، کۆسپ و تەگەرەکان بە خەڵک ڕابگەیەنن.

Atika_kurdi@yahoo.com

بۆ ئاگاداری خوێنەران و داوای هاوکاری لە نووسەران

ئاگاداری خوێنەرانی بەڕێزی "پەیامی کورد"دەکەین، لەمەودوا بەردەوام، بابەتێک یان زیاتر بە زاراوەی کرمانجی باشوور(سۆرانی) بە پیتی لاتینی دەنووسین، چاوەڕوانی یارمەتی و هاوکاریی ڕۆشنبیران و نووسەرانین، لەم بوارەدا، بۆ زیاتر خزمەتکردنی زمانی شیرینی کوردی، هاوکاریمان بکەن. بە هیوای ئەوەی ڕۆژێک بێت هەموومان یەک جۆرە ڕێنووس و ئەلفابێ بەکاربێنین.

A,a	Ard	ئارد
E,e	Emrro	ئەمڕۆ
B,b	Baran	باران
C,c	Cemal	جەمال
Ç,ç	Çra	چرا
HH,hh	hez	حەز
X,x	Xuda	خودا
D,d	Dar	دار
R,r	Bira	برا
RR,rr	Kirrîn	کڕین
Z,z	Zozan	زۆزان
J,j	Jin	ژن
S,s	Sara	سارا
Ş,ş	Şêr	شێر
'	e'tir	عەتر
GH,gh	Gherîb	غەریب
F,f	Ferhad	فەرهاد
V,v	Viyan	ڤیان
Q,q	Qazanc	قازانج
K,k	Kar	کار
G,g	Gull	گوڵ
L,l	Law	لاو
LL,ll	Xallek	خەڵک
M,m	Mirov	مرۆڤ
N,n	Newroz	نەورۆز
U,u	Buk	بوک
Û,û	Dûr	دوور
O,o	Xor	خۆر
W,w	Wazî	وازی
H,h	Herêm	هەرێم
Î,î	Dîm	دیم
Ê,ê	Ême	ئێمە
Y,y	Mirawy	مراوی
I,i	بزرۆکە بۆ نموونە: من Min	

ئا	ئ	ب	چ	چ	ح	خ	د	ب	ر	ز	ژ	س	ش	ع	غ	ف	ڤ	ق	ک	گ	ل	ڵ	م	ن	و	وو	ۆ	و	ه	ی	ئێ،ێ	ی

Bo çî soranî bi tîpî Latînî ?



Rojhat Amedî

Serdemêke ew giftugoye le nêwan roşinbîranî Kurd destîpêkirduwe. Bellam êsta ew giftugoye ne tenha le astî roşinbîrî Kurd, bellku le hemu dezga û le naw komelgey Kurdda minaqeşe dekrêt, Hoyekey aşkeraye; Le layek astî neteweyî Kurd berfirawantir debêt, le layekî tir Kurd berew dewletbun nêzîktir dibêtewe. Ziman yek le grîngtirîn prensîpî Dewletbunî neteweyeke. Bellam êste, bimanewê yan nemanewê Kurd ziyatir le yek alfabey heye. Aramî û Latînî.

Hîç neteweyek, ke bîr le damezrandinî dewllet bikatewe, 2 yan 3 Alfabey niye ! Kurd ta êsta hîç hewlê nedawe, ke yek Alfabey dirust bikat. Ewîş ziyatîr erkî ser şanî zimanzan û roşinbîranî Kurde ta siyasetmedaranî Kurd. Ḥaşurî le ser tîpî Aramî, Bakurîj le ser tîpî Latînî israr diken.(pêdadegrin) Hîç layek amade niye, ke waz le "tîpekanî xoy" bêhnê. Le binerretda herdu tîpekeş, tîpî Kurdî nîn. Mebestim eweye; ne tîpî latînî, ne tîpî aramî, hiç kamyan hunerî Kurd nîn, ke înadî le ser bikeyn. Bellam rastiyek heye ke Laṭînî asantirîn rêgaye bo danînî pileyek bo dirustbunî zimanî yekgirtuy Kurdî.

Fêrbunî tîpî aramî bo Kurdekanî bakur zor sext û zehmettire le fêrbûnî tîpî latînî bo kurdekanî başur û rojhelat. Em realîte her le êstawa diyare. Kurdî başur û rojhelat le Kurdî bakur zutir fêrî tîpî latînî debin. Baştirîn nimune le dezgayî Rojnamey Peyamî Kurd da debînîn. Rojnamewan û karmendî Kurd le parçekanî Kurdistan lew dezgaye da kar deken. Ke Amancyan xizmetkirdine be dirustbunî zimanî yekgirtu. Le katêkda, ke hiç hêzêk amade nebu yan neytwanîwa rojnameyek damezrênê, ême weku karmendî Peyamî Kurd 2 rojname billaw dekeynewe. Amanci binerretî ême ewebu, ke rojnamewan û roşinbîrî Kurd le çwarçewey dezgayî Peyamî Kurdda legelyek biguncênîn. Ta êsta yek karmendî bakur fêrî tîpî aramî nebuwa, belam teqrîben hemu karmendanî başur û rojhelat fêrî latînî bun. Le heman kat da Kurdî bakurîş fêrî soranî bun. Bêguman hêşta negehiştuwne ew radeyey ke latinîş weku aramî be asanî binusîn û bixwênînewa, bellam be rayî min debê her le êstewa despêbikeyn bo nusînî soranî be tîpî latîn. Katê ême wekû kurdî bakur, pêş 20 yan 30 salan dest man pêkird ke kurdî bixwênîn û binusîn, zor zehmetman kêşa. Jimarey kesayetiy Kurdî bakur le nusînî Kurdî zor zor kem bun. Bellam êsta bi Hezaran Kurd bi kurdî denusin.

Ew şite bo Kurdekanî başur û rojhelatîş her waye, eger ême êsta destpêbikeyn le mawey çend salêkda ew girifte çareser debê. Ew kata ême, weku bakurî, başurî û rojhelatî baştir le yek têdegeyn, ême detwaṇîn billêyn, ke Kurdîş wekû netewakanî tir yek alfabey heye û le hemuy grîngtir, ême le yektir têdegeyn, ême detwanîn edebiyatî hemu parçekan bixwênînewa.

Teknîkî ew serdeme rêgaman pê deda, ke le maweyekî kûrtda hemu edebiyatî konî Kurdî, ke be tîpî aramî nusrawin, wergerenîn ser tîpî latinî. Tenya ew kata ême detwanîn xizmet be zimanî yekgirtuy Kurdî bikeyn. Le bîrman neçê, emrro le başurî welatî ême, giriftî siyasî le naw komelgey Kurdîda rêga le pêşkewtin degrê. Ême nabê le kêşe û girift bitirseyn. Debê be kiraweyî giftugoy le ser bikeyn. lêreda ciyawazî zarawekanî Kurdî dewrî serekî heye. Bedaxewe, ciyawazî zarawekan bunete hoyî nasyonalizmî herêmî le naw Kurdda, be taybet le nêwan siyasetmedar û roşinbîranî Kurd. Min le layî xomewe destpêdekem, fermun êweş hawkarî biken! ■■■

ئاگادارییەک لە ماڵپەری خاک نێت

بە ئاگادارێی هەمووان دەگەیەنین کە سایتەکەمان، لینکی تایبەت بە "پرسی بەرەی کوردستانی لە ڕۆژهەلاتی کوردستان" دەکاتەوە.

بۆ ئەوەی بتوانین هەڵوێست و بۆچوون و تێکۆشانی هەر لایەن و کەسێک بە پێی ڕێکەوتی خۆی دابنێین، باوا لە هەموو حیزب و ڕێکخراوەکان و نووسەران و ڕۆشنبیران دەکەین بابەتەکانی خۆیانمان لە ماوەی حەوتوویەکدا بنێرن.

هیوا بەڕێوەبەری ماڵپەری خاک نێت

www.khaknet.com

www.kurdistanpeyam.com

بۆ یەکەمجار لە ئێران خوێندکارانی زانکۆی تاران داوای فیدرالییەت بۆ ئێران دەکەن



PNA- خوێندکارانی زانکۆی تاران بۆ یەکەمجار لە مێژووی خەباتیان لە پێناو ریفۆرم و ئازادیدا، دروشمی(ئازادی سەربەخۆیی، کۆماری فیدرالی)یان بەرز کردەوە. دوای هەڵمەتی رەت کردنەوەی ژمارەیەکی زۆر لە پاڵێوراوانی هەڵبژاردنەکانی سەرۆکایەتیی ئێران، خوێندکارانی زانکۆی تاران چەند رۆژێکی بەردەوامە بە نیشانەی ناڕەزایەتی لە هەڵوێستی کۆنەپارێزانی ئێران، دەستیان داوەتە خۆپێشاندان. کۆنەپارێزان بۆ کەمکردنەوەی ئاستی ناڕەزایەتیی تووێژەکانی نێو کۆمەڵگای ئێرانی لە بارەی هەڵبژاردنەکانەوە دوو رۆژ بەر لە ئێستا دوو کاندیدای دیکەی تەئیید کرد کە یەکیان موستەفا موعین بوو، بەڵام ئەمە نەک ناڕەزایەتیی خوێندکارانی کەم نەکردەوە بگرە تورەتریش کردن، کاتێک خوێندکاران بە دروشمی:" نە ئەکبەر و نە موعین، شۆڕەشی رەنگین" پێشوازییان لە برپارەکرد. بۆ دووش هەوی بەردەوام نزیکەی ٧٠٠ خوێندکاری زانکۆ لە حەرەمی زانکۆی تاران، بە دروشمی جۆراوجۆر هەڵبژاردنەکانی سەرۆکایەتییان تەحریم کردن و داوایان لە خەڵک کرد کە بە هیچ شێوەیەک بەشداری لە هەڵبژاردنەکاندا نەکەن. خوێندکاران دەیانگوت:" نە شامان دەوێ نە ڕێبەر، نە خاتەمی و نە ئەکبەر(مەبەست هاشمی رەفسنجانییە)." بەڵام گرنگترین ڕووداو لەم خۆپێشاندانانە ئەوەیە کە بۆ یەکەمجارە خوێندکارانی زانکۆی تاران داوای فیدرالی بوونی ئێران دەکەن و ئەم داوایە تا ئێستا لە لایەن بزووتنەوەی خوێندکاریی ئێرانەوە نەخراوەتەڕوو.

لە هەڵبژاردنەکانی لوبنان کوردێک خۆی کاندید کردووە



PNA - یەحیا فەتاح کە لەسەر لیستی سوننە لە شاری بەیروت خۆی کاندید کردووە، لەلێدوانێکیدا بۆ ئاژانسی فرانس پرێس ڕایگەیاند : لە پێناو سەلماندنی بوونی کورد لە لوبنان خۆی کاندید کردووە تا لە پەرلەمانی لوبناندا نوێنەریان هەبێت . یەحیا فەتاح لەو بارەوە گوتی :" هەموو ڕێکخراوە کوردییەکانی لوبنان لە کاندید کرد بوونمدا پشتگیریم دەکەن، ئێمە لە پێناو دەستەبەر کردنی مافی پێشێل کراوی کورد لە لوبناندا تێدەکۆشین، لە ڕاستیدا کاتێک لیستی حەریری هیچ کوردێکیان دانەنا، من خۆم کاندید کرد ." هەروەها لە شاری ترابلۆس عەبدولمەجید ئەلرافیعی، کۆنە ئەندامی سەرکردایەتی نەتەوەیی حزبی بەعسی عێراقی بۆ پۆستی سوننە خۆی کاندید کردووە . شایانی باسە لە شاری بەیروتدا ١٨ هەزار دەنگدەری کورد هەن و بڕیار وایە قۆناغی یەکەمی هەڵبژاردنەکانی یاسا دانان هەموو ڕۆژانی یەکشەممە تا ٢٢ی مانگی حوزەیران لە لوبنان دەست پێ بکات.

سەرەڕای ناڕەزایەتیی تورکەکان، ئەورپا لەسەردانەکانی خۆی بۆ باکووری کوردستان بەردەوامە

PNA- بڕیارەشاندێکی پەرلەمانتارانی یەکێتی ئەورووپا لە دۆستەکانی دۆزی کورد لە مانگی حوزەیران بەمەبەستی هەڵسەنگاندنی باری کورد سەردانی باکووری کوردستان بکەن. بە پێی هەواڵی ڕۆژنامەی **Ozgur Gundem** ئەم سەردانە بەشی زۆری شارەکانی باکووری کوردستان دەگرێتەوە و لە ڕۆژانی ١٣ تا ١٤ی مانگی حوزەیران دەبێت. حکومەتی تورکیا لە سەردانی شاندە ئەورووپاییەکان بۆ ناوچەکانی باکووری کوردستان کە دەکاتە باشووری ڕۆژهەڵاتی تورکیا نیگەرانە و، ئەوەش لەکاتێکدایە کە ئەورووپاییەکان پێیانوایە دیاربەکر دەروازەی چوونەژووروەوەی تورکیایە بۆ نێو یەکێتی ئەورووپا و داوا لە تورکیا دەکەن کە ئاوڕێکی جیدی لە ڕەوشی ئابووری و کۆمەڵایەتی و ئەمنیی ئەو ناوچانە بداتەوە کە حکومەت پشتی تێکردوون.

Impressum

خاوەنی ڕۆژنامە

Peyama Kurd Verlag
Peyama Kurd
Thomas-Mann-Str. 22
53111 Bonn / Germany

Fon: +49 (0228) 18 00 654
+49 (0228) 18 00 655
Fax: +49 (0228) 18 00 656
www.peyama-kurd.com
info@peyama-kurd.com

ژمارە تەلەفۆنی ئابونە

+49 (0228) 41 02 801

دەستەی نووسەران

کرمانجی ژوری:
دانا عەلی، فێرەس فایەق، زەمکان عەزیز، نزار جاف، جوتیار داڤروش، مەنسور سیدانی

مستەفا چوارتایی

کرمانجی ژوری:
فادل ئەزمێنلیک، سیروان حاجی بەرکۆ، سلێمان شالیخانی، ز. بیرکەمال

کرمانجی (زازاکی) :
سەیدخان کورێ

بەیامی کورد بە مالی خۆی دەزانی کە ئەو بابەتانەی پێی دەگات کورت بکاتەوە و لە بارێ ڕێزمان ڕاستیان کاتەوە و بابەتی بڵاوکراوە لە شوێنێر چاپ نەکات.
بەیامی کورد ئازادە ئەو بابەتانەی کە پلار و هێرشی نابەجێی تێدایە بڵاو نەکاتەوە.

سوریا، دەستی لە تیرۆری عیراقدا هەیە و دەبێت نرخەکەی بە گرانی، بدات

ڕۆژنامەی "شیکاگۆ ستار" نووسیویە: بەم دواییانە هێزەکانی ئەمریکا، توانیویانە، بە شیوەیەکی ورد، زانیاری تەواو سەبارەت بە تۆڕی یاخیبووەکان و سەرکردایەتیی و سانەکانیان و شوێنی نیشتەجێ بوونیان، هەروەها ئەوانەی یارمەتی دارایی و لۆجیستییان دەدەن، بەدەست بخەن، ڕۆژنامەکە دەڵێت؛ زۆر زانیاری تریش هەیە کە نەمانتوانی لێیان وەرگرین، دەرێژەی پی دەدا و دەڵێت: بە هۆی تەکنۆلۆژیای سیخوڕی و ئامێری چاودێری و مانگە دەستکردەکانەوە، دەسە کەوتووە، لە هەفتەکانی داهاتوودا، هەموو هێزە تیرۆریستییەکان لەناو دەبرێن، وەزارەتی بەرگری ئەمریکا دەڵێت: لەمێژە بەڵگەی تەواومان لەبەر دەستدایە، کە سوریا دەستی لە تیرۆری ناو عێراقدا هەیە و، بە دڵنیاییەوە دەبێت نرخەکەی بە گرانی بدات.

لە سالۆڕۆژی ڕاگەیاندنی شەڕی سەربازیدا کۆنگرەی گەل داوای ئاگربەستی لە تورکیا کرد



PNA - لەسالۆڕۆژی هەڵگیرساندنەوەی شەڕی چەکداری لە لایەن کۆنگرەی گەل لە یەکی حوزەیرانی پارسال، سەرۆکی کۆنسەی سەرکردایەتیی کۆنگرەی گەل(PKK) داوای لە حکومەتی تورکیا کرد کە شەڕ لە دژی ئەوان ڕابگرێت و ئەگەر تورکیا ئەم کارە بکات ئەوا ئەوان ئامادەن بۆ هەمیشە چەکەکانی خۆیان بێدەنگ بکەن. ڕۆژی چوارشەمە ٢٠٠٥/٦/١ لە گوندی لێوژەی بناری قەندیل، موراد قەرەیلان سەرۆکی کۆنسەی بەڕێوەبردنی کۆنگرەی گەل(PKK) لەگەڵ ژمارەیەکی دیکە لە ئەندامانی سەرکردایەتیی ئەو پارتە، سەبارەت بە دوا پێشهاتەکانی ڕەوشی باکووری کوردستان ، بارودۆخی خۆیان ، ستراتیژیی داهاتوویان دوای سالێک لە شەڕی سەربازی و دوا ئاکامەکانی کۆنگرەی خۆیان کە لەم مانگەدا بەڕێوەچووبوو، کۆنفرانسێکی ڕۆژنامەوانی ئەنجام دا. لە کۆنفرانسەکەدا سەرەتا خاتوو ڕۆناهی سەرهات جێگری سەرۆکی کۆنسە ڕایگەیاند کە لە کۆنگرەی خۆیاندا بڕیاری کۆنفیدرالیی دیموکراتیی کوردستانیان داوە و دەیانەوێ بۆ دوو ساڵی داهاتووی خەباتی خۆیان لەسەر ئەم بنەمایە کار بکەن. دواتر موراد قەرەیلان سەبارەت بە مەسەلەی کۆنفیدرالیی دیموکراتیی کوردستان لێدوانی پتری دان و ڕوونی کردەوە کە ئامانجی ئەوان لە کۆنفیدرالیی دیموکراتی کوردستان لەسەر سێ بنەمایە کە یەکیان کۆنفیدراڵییە وەکو سیستەمی بەڕێوەبردنی نێوخۆیی لەکوردستان، دووەمیان کۆنفیدرالییە لەسەر بنەمای هەر چوار پارچەی کوردستان و سێیەمیشیان کۆنفیدرالییە لەسەر ئاستی میللەتی کورد لەگەڵ گەلانی دیکەی ناوچەکە. ئەو لەبارەی بارودۆخی ئێستای خۆیان و ستراتیژیان بەرامبەر حکومەتی تورکیا باسی لەوە کرد کە ئەوان لەم ڕۆژەدا دوای سالێک لە شەڕی چەکداری دوا لە تورکیا دەکەن کە ئۆپەراسیۆنەکانی خۆی لەدژی ئەوان بوەستێنێ وبەم شێوەیە ئەوانیش چەکەکانی خۆیان بێدەنگ دەکەن. قەرەیلان گوتی:" سیاسەتی ئێمە بەرگری لەخۆکردنە و ئەوەش بۆ ئێمە ڕەوایە، ئێمە دوا لە دەوڵەتی تورکیا، ئێران و سوریا دەکەین کێشەی کورد لە ڕێگای دیالۆگ چارەسەر بکەن. ئێمە تورەیی خۆمان لەبەرامبەر ئەو ئۆپەراسیۆنە هاوبەشانە دەردەبڕین کە سوپای ئێران و تورکیا بۆ لێدانی **PKK** دەستیان پێکردووە. ئێمە وەکو کۆنگرەی گەل لێرەوە دوا لە تورکیا دەکەین ئۆپەراسیۆنە سەربازییەکانی خۆی بوەستێنێ، مەرجی ئێمە ئەوە نییە کە تورکیا بێت بە شێوەی ڕاستەوخۆ لەگەڵ ئێمەدا بکەوێتە گفتوگۆ، ئێمە ئەوەشمان قەبوڵە کە دەوڵەتی تورک لەگەڵ پارت و گرووپە سیاسیە یاساییەکانی کورد، کەسایەتییە هەڵبژێردراوەکانی شارە کوردییەکانی باکوری کوردستان گفتوگۆ بکات و ئەو کێشەیە کۆتایی پێبێنێت." ئەو سەبارەت بە ڕەوشی ئۆجەلان و دوا بڕیاری دادگای مافی مرۆڤ لەوبارەیەوە گوتی:" ئێمە پێشوازی لەو بڕیارە دەکەین و بەهەنگاوێکی باش و دەرفەتێکی زێڕینی دەزانین بۆ چارەسەر.ئێمە پێمان وانییە تورکیا لەژێر گوشاری ئەورووپا ڕازی بێت بەوەی کە ئۆجەلان ئازاد بکات، بەڵام ئێمە بۆ ئەوە تێدەکۆشین و پێمانوایە بە تێکۆشانی خۆمان ئەو ئامانجە دەستەبەر دەکەین." قەرەیلان لەدرێژەی لێدوانەکانیدا بانگەوازی ئاراستەی پارتی دیموکراتی کوردستان و یەکیەتی نیشتمانی کوردستان و تێکڕای هێزە سیاسی و نەتەوەییەکانی کوردستان کرد کە بۆ دیاریکردن و یەکخستنی ستراتیژیی میللەتی کورد، کۆنفرانسێکی نەتەوەیی ساز بکرێت. ئەو هەروەها تەنکیدی لەوە کردەوە کە پشتگیریی تەواو لە عێراقی فیدرالی دیموکرات دەکەن و فیدرالیەتی کوردستان، دامودەزگاکانی هەرێمی کوردستان وەک سەرۆکایەتیی هەرێم، پەرلەمانی کوردستان و حکومەتی هەرێم بەرز دەنرخێنن. سەبارەت بە پەیوەندییشیان لەگەڵ ئەمریکا قەرەیلان گوتی:" سیاسەتی ئێمە گۆڕاوە و ئێمە شتەکان بەچاوی ڕەش و سپی نابینین.دەرگای گفتوگۆمان لەگەڵ هەموو لایەک کردۆتەوە." یلان سەبارەت بە لێدوانەکانی ئەم دواییەی ئیبراهیم جەعفەری و ئەگەری ئەوەی کە سوپای تورکیا پەلاماری کوردستان بدات، گوتی:" من ئەوە بەدوور دەزانم کە سوپای تورکیا بیەوێ بێتە ئێرە، چونکە ئەوە گرێدراوی ڕەوشێکی نێونەتەوەییە. بەڵام بە نسبەت قسەکانی جەعفەری ، بوونی ئێمە لە عێراق مایەی ناسەقامگیری نییە و بگرە مایەی سەقامگیرییە. ئێمە تیرۆریست نین و تەنها بەرگری لەخۆمان دەکەین.بااڵی سەربازیی ئێمە لە تورکیا شەڕ دەکات، شەڕی ئەوانیش ئەوەنییە کە بێن لە سەر سنورەکانەوە پەلاماری سوپای تورکیا بدەن، بگرە لەناوجەرگەی کوردستان و لەدەرسیم بەرگری لەخۆیان دەکەن. بوونی ئێمە لە عێراق بوونێکی سیاسیە نەک سەربازی."

درێژەی سێ کاندیدی سەرۆک کۆماری..

هەر ڕووداوێک بۆ ئەو ڕووبدات، ئەو مەسەلەیە بڵاو بکەمەوە و هۆکاری ئەو کردەوەیەی وەها بۆ من ڕوون کردەوە :" ڕەنگە من بە دەستی هێزەکانی سوپای قودس – ئەو بۆخۆی یەکێک لە ئەفسەرە پلە بەرزەکانی ئەو سوپایە بوو- بە هۆی ئەو ناکۆکییەی کە لەگەڵ فەرماندەی سوپا هەمە، بە مەبەستی پاراستنی نهێنییە ئەمنیەکانی نیزام، لەناو بچم ". قسەکەی ئەو ڕاست دەرچوو، چونکە پاش ماوەیەک لە کاتی مەلە کردنی لە ڕووباری "کارون"دا کوژرا. ئەندامی دیکەی تیمەکە (عەسکەری)یش ساڵی ٢٠٠٤ لە کاتی چوونی بۆ شوێنی کارەکەی گوللەی بەر کەوت و کوژرا و گوتیان پاسەوانەکە هەڵەی کردووە و لێی داوە. تا ئێستا نەمتوانیوە ئەو زانیاریانە بڵاو بکەمەوە، جەڵام ئێستا ئەوان بەو شێوەیە و لە زاری "تەقیپور"ەوە بڵاو دەکەمەوە :

*"ساڵی ١٩٨٩، لە لایەن "هاشمی ڕەفسەنجانی" سەرۆک کۆماری ئەو کاتەوە، ڕاسپاردەیەک خرایە سەر ئەستۆی سوپای قودسەوە، چونکە کردەوەکانی دەرەوەی سنوور لەسەر شانی سوپای قودس بوون . فەرمانی کوشتنەکان لە لایەن ڕابەرەوە دەدرایە سەرۆک کۆمار، تەنانەت پێش ئەوەی "ڕەفسەنجانی" ببێتە سەرۆک کۆمار، بە هۆی ئەوەی جێگری سەرۆکی گشتی هێزە چەکدارەکان بوو، ڕاسپاردەکان لە لایەن ئەوەوە دەردەکران . هەر ڕاسپاردنێک لە لایەن فەرماندەی گشتی سوپای پاسدارانەوە دەگەیشتە فەرماندەی سوپای قودس". ئەو ڕاسپاردەیە لە ناوبردنی سەرکردایەتی حزبی دیموکراتی کوردستان بوو، بە هۆی ئەوەی بۆ ڕابەرایەتی ئێران مەترسیان هەبوو.

• "داڕێژەری ئەو کردەوەیە، یەکێک لە ئەندامە بەرزەکانی سوپای قودس بە ناوی "حاجی غەفور" بوو. ئەو ئێستا بەرپرسی حەراسەت (دەزگای هەواڵگری کە سەربە وەزارەتی ئیتیلاعاتە و لە هەموو دامودەزگاکاندا بەشێک بەو ناوە هەیە)ە . بە پێی پلانەکانەوە، ئەو کردەوەیە دەبوایە لە دوو قۆناغدا بە ئەنجام بگات و بە ئەنجامیش گەیشت. لە قۆناغی یەکەمدا پێشنیازی گفتوگۆ و گەیشتن بە ئەنجامێک لەسەر مەسەلەی کورد، لەگەڵ دکتۆر "عەبدولەحمان قاسملو" سەرۆکی حزبی دیموکرات دەکرا، لەو قۆناغەدا دەبوایە ڕێککەوتنێک بکرێت. لە قۆناغی دووەمدا، چەند مانگ دواتر دەبوایە گفتوگۆکانی کۆتایی ئەنجام بدرێن و ڕێککەوتنەکە ئیمزا کرابا. تیرۆری سەرکردایەتی حزبی دیموکراتی کوردستان دەبوایە لەو قۆناغەدا بە ئەنجام بگات. بۆچی پلانەکە لە دوو قۆناغدا بوو؟ چونکە دەبوایە دەوڵەت وەک ئاشتیخواز و داواکاری چارەسەر کردنی کێشەکان نیشان بدرێت و ئەو کەسانەی دژایەتی چارەسەری کێشەی کوردستان بوون، وەک تاوانبار دەناسانە".

"D" لە درێژەدا دەڵێ : بۆ ئەو کارە سێ تیم پێکهێنرا:

١- تیمی گفتوگۆکان کە "حاجی غەفور" بە ناوی نهێنی "ئەمیر مەنسور بوزورگیان"، ئەندام و بەرپرسی پەیوەندی لەگەڵ دوو تیمەکەی دیکە بوو.

٢- دوو تیمی تیرۆر، یەکێکیان پێکهاتبوو لە "ناسر تەقیپور" و ئەوی دیکەش بەرپرسەکەی "حەمید ئەحمەدی نەژاد" بوو. پەیوەندی تیمی یەکەم بە باڵیۆزخانەی ئێران لە نەمسادا لە ڕێگەی "ئەحمەدی نەژاد"ەوە بوو و ئەو چەکەکانی لە باڵیۆزخانەوە وەرگرت دایە دوو ئەندامەکەی دیکەی تیمی تیرۆر. هەر وەک پلانەکە، گفتوگۆی یەکەم لە ڕۆژەکانی ٢٨ و٣٠ کانونی یەکەمی ساڵی ١٩٨٨ لە "ڤییەنا"ی پایتەختی نەمسا ئەنجام دران، ٧ی مانگی تەموزی ساڵی ١٩٨٩ دیسان لە "ڤییەنا" ئەنجام دران. "ناسر تەقیپور" و "عەسگەری" هەفتەیەک پێش ڕێکەوتی گفتوگۆکان، لە ڕێگەی ئیماراتی عارەبییەوە بە پاسپۆرتی ئەورووپی، چوونە نەمسا. باڵیۆزخانەی ئێرانیش لە ڕێگەی "ئەحمەدی نەژاد"ەوە چەک و پێداویستییەکانی دیکەی بەوان گەیاند. "حاجی غەفوریش" زانیاری دەربارەی شوێن و کاتی کۆبوونەوەکە دایە ئەوان. **بۆ لاپەڕەی ٧**

پەیامی کورد

ژمارە ٣٩ (ساڵی یەکەم) — رۆژنامەیەکی هەفتانەی گشتییە — ٢٠٠٥/٦/٣

تیپی فوتبۆڵی کوردستان بە ٣ گۆڵ لە تیپی لایزبێرگی ڤیەننای بردەوە

لاپەڕەی 13



لە بە خاک سپاردنی "شێخ خەزنەوی"دا، شەپۆلی ناڕەزایی خۆرئاوای کوردستان، سوریا دەلەرزێنێ



مستەفا چوارتایی - لە یادی ڕاپەڕینە شکۆدارەکەی ئازاری ٢٠٠٤ی خۆرئاوای کوردستان، ئەمسالیش بۆ چەندین جار، چەوساوەکانی خۆرئاوا، ڕژانە سەر جادە و خواستە ڕەواکانی خۆیان بەگوێی کەڕی سەرانی ڕژێمی سوریادا دا. ناو بەناو کۆڕ و چالاکی و خۆنیشاندان بەردەوام بوو، تا ڕۆژی ٢٠٠٥/٥/١٠ کە بۆ شەوەکەی "شێخ مەعشوق خەزنەوی"یان ڕفاند و لە٢٠٠٥/٦/١دا، ڕژێم تەرمەکەی تەسلیم بە کەس وکاری کردەوە. هەر هەمان ڕۆژ بە بەشداری هەزاران لە جەماوەری کوردی خۆرئاوا، بە خاک سپێردرا. بۆ نەتەوەی کورد، تیرۆرکردنی خەزنەوی لەوە زیاتر نییە کە نەوەیەکی دیکەی دەچێتە ریزی پڕ شکۆی سەروەران و زیاتر بۆ خەباتکردن دژی چەوسێنەران و داگیرکاران، هانی دەدا، بەڵام بەڵای خودی ڕژێمەوە، بە لێکدانەوەی خۆیان سیمبۆلێکی نەتەوەیی و نیشتمانی کوردستانیان لەناو برد و وەڕەی خەڵکی پێ نەوی دەکەن، ئەگەر بشتوانن، هەموو جۆرە بزووتنەوەیەکیان کپ دەکەنەوە و سەرکوتیان دەکەن. ئەگەر تیرۆرکردنی حەریری بوو بە هۆکارێک کە سوریا لە لوبنان وەدەرنرێ و بەس، ئەوا تیرۆرکردنی خەزنەوی، گڕ و جۆشێکی زیاتر بە خەڵکی خۆرئاوای کوردستان دەدا، ئەمڕۆ لە پێش چاوی کۆمەڵگای نێودەوڵەتی و هەموو ئازادیخوازانی دنیادا، هەردوو ڕژێمی سوری و سودانی؛ بێزراوترین ڕژێمن و چ خەڵکی خودی ئەم دوو وڵاتە، چ کۆمەڵگای نێودەوڵەتی بە پەڕۆشەوە چاوەڕوانی ڕووخان و لەناوچوونیان دەکەن. ڕژێمی سوریا لە سەدەی ڕابردوودا، چەند توانیبێتی و بۆی لوابێت، سوودی لە بوونی دوو بلۆکی خۆرهەلات و خۆرئاوا، وەرگرتووە. ئەمڕۆ لە سەردەمی یەک جەمسەریدا و، لە بێ هێزی دەوڵەتانی عەرەبدا، پەلەقاژەی مەرگ و خۆهێشتنەوەیەتی، دەشزانێ دوای نەمانی ڕژێمی بەعسی عێراق، بوونی ئەو لە ناوچەکەدا، کۆسپێک دەبێت لەڕێی ئاشتی و ئارامی ناوچەکە، ڕۆڵی تێکدەرانەشی بۆ نەچەسپاندنی پرۆژەی خۆرهەلاتی ناوەڕاست بەردەوام دەبێت. پێتووس، ئەگەر بێت لەسەر بەدکاریی ئەم ڕژێمە بەرانبەر بەکورد بنووسێت، ڕادەوەستێت. نزیکی ٤٠ ساڵە لە ماندەلکردنی کورددا بەردەوامە، ڕەگەزنامەی سوری لە زۆربەی کوردی خۆرئاوا سەندووەتەوە، بە جۆرێک مرۆڤی کورد، لەدایک دەبێت،هاوسەر دەگرێت، دەمرێت، ناسنامەیەکی نییە و ناوی بە ڕەسمی تۆمار ناکرێت. تەواوی زەوی و زار و گوندە بە پیتە کوردییەکانیشی داگیر کردووە و، لە پرۆژەی "پشتێنی سەوز"دا تەعریبی کردوون. هەوڵی زۆری داوە، لاوە کوردەکان ناچار بکات، ڕووە و هەندەران کۆچ بکەن و لە وڵاتێ بچنە دەر. بە سوود وەرگرتن لە پێوەندی خۆی بە ئۆپۆزسیۆنی کوردی باشوور و عێراقەوە و، کردنەوەی ڕێگا بۆ ئەوان، توانیبووی بە تەواوی هەموو دەنگێکی ناڕەزایەتیان کپ بکات، لەگەڵ ئەمانەشدا، هەرچی بیگوتبا "حیزب"م بەناوی کورد، حیزبێکی بۆ دەکردەوە و دەبووە زوڕناژەنێکی درۆزنی کوردایەتی، "مەبەستم ئەوانەیە کە لە سایەی ڕژێمدا و بۆ بەرژەوەندی خودی ڕژێم کاریان دەکرد." بە هەموو کەموکوڕی و بێ چارەییەکیانەوە، کوردی خۆرئاوای کوردستان لە سوریا بەهێزتر دەبینم، پێشبینی دەکرێت قوربانی زۆر زیاتریش بدەن، بەڵام زۆر ناکێشێ دەگەنە ئازادییەک کە باب و باپیرانیان، بەو خەونەوە مالئاوایان لە ژیان کرد. ڕژێمە فاشییە عەرەبییەکان، کوردبەختانە، هەموویان لە ناوەوە گەندەڵ بوون و تەنها بە قەوارە ماوون، تۆفانی گۆڕان ڕووی تێ کردوون، بیانەوێت، نەیانەوێت، یان دەبێت لەگەڵ سەردەمی نوێ و دیموکراتی و جیهانگیرییدا خۆ بگونجێنن، یان بەڕەو ڕووخان و لەناوچوون و زبڵدانی مێژوو، مل دەشکێنن.■■■

دەستپێکی بڵاوکردنەوەی وتار بە لاتینی لە پەیامی کورد

Rojhat Amedî

Bo çî soranî bi tîpî Latînî ?

- Hîç neteweyek, ke bîr le damezrandinî dewllet bikatewe, 2 yan 3 Alfabey niye !
- Latînî asantirîn rêgaye bo danînî pileyek bo dirustbunî zimanî yekgirtuy Kurdî.

Laparey 3

شاعیر و ڕۆژنامەنووسی کورد"ڤینۆس فایەق" خەڵاتی ڤیستڤاڵی"العنقاء"ی زێڕین وەردەگرێت



لە هەواڵێکی دڵخۆشکەردا، خاتوو ڤینۆس فایەق شاعیر و ڕۆژنامەنووس و ئەندامی دەستەی نووسەرانی هەفتەنامەی پەیامی کورد، خەڵاتی ڤیستڤاڵی"العنقاء"ی زێڕینی نێونەتەوەیی پێ بەخشرا. جێی ئاماژە پێدانە کە ڤیستڤاڵی"العنقاء" ماڵی چیرۆکی عێراقی بەڕێوەی دەبات و بەمەبەستی هاندانی کەسانی داهێنەر و بەرجەستەکردنی ڕۆڵەکانیان لە وڵاتەکانیاندا، خەڵاتی ساڵی ٢٠٠٥ بە ڤینۆس خانی شاعیر و ڕۆژنامەنووس کورد، بەخشی. ئەم ڤیستڤاڵە بۆ یەکەم جار، کارەکانی لە قاهیرە دەست پێ کرد و، پاشان چالاکییەکانی بۆ عەمان، ئیستەنبول، تاران و دیمەشق گواستەوە و ژمارەیەکی ڕچاوکراو لە نووسەر و ئەدیب و هونەرمەند ئەو خەڵاتەیان وەرگرتووە، لەوانە: مۆسیقاژەنی بەناوبانگ نەسیر شەممە، ڕۆمانووسی ناودار یەشار کەمال، ڕۆمانووس مەحمود دەولەت ئابادی، شاعیری عێراقی ناودار و بەرجەستە موزەفەر ئەلنەواب، شاعیر عیسا ئەلیاسری، ڕۆماننوس عەلی بەدر، هونەرمەندی سوری بەناوبانگ ئەیمەن زەیدان، نووسەر و هونەرمەندی خواێخۆشبوو سەعدوڵا وەنووس و ڕۆمانووس فوئاد ئەلتەکرلی. شایەنی باسە کە ئەم ڤیستڤاڵە تا ساڵی ٢٠٠٧ دەخایەنێت.

سێ کاندیدی سەرۆک کۆماری ئێران دەستیان لە تیرۆری قاسملودا هەبووە



حەمید ئەحمەدی نەژاد

ئەو ڕاپۆرتەوە، فەرمانی ئەو کارە لە لایەن "خامنەیی" و بە ڕێگەی "هاشمی ڕەفسەنجانی"یەوە دراوەتە "موحسین ڕەزایی" و ئەویش داویەتی بە فەرماندەی سوپای قودس و تیمەکانی گفتوگۆ لەگەڵ قاسملو. ئەو کەسەی بەرپرسی ئەو تیرۆرەیە ناوی "ناسر تەقیپورە"، ئەو کەسێکە کە لەگەڵ "عەسگەری"، ڕاسپێردراوی کوشتنی "قاسملو" و



هاشمی ڕەفسەنجانی

"فازیل ڕەسول" و "عەبدوللا قادری" بوون . "تەقیپور" پێش ئەوەی بکوژرێ، زانیبووی کە دەیانەوێ لەناوی بەرن هەر بۆیەش مەسەلەکەی بۆ هاوڕێیەکی خۆی باس دەکا و پێی دەڵێ ئەگەر بە ساغی گەڕامەوە، ئەوا ئەوانە لە بیر بەرنەوە و ئەگەریش کۆژرام بڵاوی بکەنەوە. لە کۆتایی زستانی ئەمساڵدا هاوڕێیەکەی کە لە ئێران ڕایکردبوو، چووە لای "بەنی



"موحسین ڕەزایی"

سەدر" و تەواوی مەسەلەکەی بۆ گێڕایەوە. پێش ئەوەی کە باس لە هەوڵەکانی "بەنی سەدر" سەبارەت بەو مەسەلەیە بکرێت، هەندێک سەبارەت بە چۆنیەتی ئەو کردەوەیە لە زمانی (D)یەوە دەکرێ، کۆتایی ساڵی ٢٠٠٢، یەکێک لە ئەفسەرەکانی سوپای پاسداران، بە ناوی "ناسر تەقیپور"، هەندێک زانیاری دایە من و داوای لێکردم ئەگەر بۆ لاپەڕەی ٢

PNA- سایتی گویا نیوز لە ڕاپۆرتێکدا قسەکانی کەسێکی بە ناوێ "D" بڵاو کردەوە کە هاوڕێیەکی بە ناوی "ناسر تەقیپور" (ئەنجامدەری تیرۆری دکتۆر عەبدولڕەحمانی قاسملو)، پێش ئەوەی بکوژرێ باسی لە چۆنیەتی ئەو کردەوەیە کردووە، ئەوەی خوارەوە دەقی ڕاپۆرتەکەیە:"بەنی سەدر" سەرۆک کۆماری پێشووی ئێران لەگەڵ شایەد حاڵێکی تازەی کوشتارەکەی "قییەنا" بە ناوی "D" کە بووە هۆی کۆژرانی "دکتۆر عەبدولڕەحمان قاسملو" سەرۆکی پێشووی حزبی دیموکراتی کوردستان و "عەبدوللا قادری" و "فازیل ڕەسول"، گفتوگۆیەکی سازداوە کە لەو گفتوگۆیەدا ڕۆڵی سێ کەس لە کاندیدەکانی هەڵبژاردنی سەرۆک کۆماری ئێران ئاشکرا بووە . لەو ڕاپۆرتەدا ڕۆڵی "ڕەفسەنجانی"، "حەمید ئەحمەدی نەژاد" و "موحسین ڕەزایی" لە تیرۆری "دکتۆر قاسملو"، "قادری" و "فازیل ڕەسول" و هەروەها "دکتۆر کەسرا وەفاداری" کە لە ١٨ی ئەم مانگەدا کوژرا، لە زمانی کەسێکەوە کە تیرۆرەکانی ئەنجام داوە، ئاشکرا دەکرێت. بە گوێرەی